Arşîva Bîra Kurdan: Ji Jan Piruz gotara "Bîranîna xemgîn a Mehabadê " ('97) û ji Alain Gresh "Tirk, li Kurdistanê di herîyê de asê man" ('97) ▶ R. 12

LE MONDE diplomatique kurdî

Gulan 2012 - Hejmar 30 · www.lemonde-kurdi.com · info@lemonde-kurdi.com · 24 Rûpel

**Dominique Pinsolle**
Parîs, Pekîn, Moskova û Washington qedreke mezin didin tebeqeyên navîn ku ji milkdarên biçûk ên xwedî asoyên tengok îro veguherîne ciwanên xwedî dîploma û heyranên înternetê… ▶ R. 6

**Laurence Allard**
Dema ku Meier û Kobia bi riya telefonên destan sîstemeke hawarên ku cihê wan dikarin bên aşkere kirin çêkirin, bi saya vê amûrê li Haîtîyê bi sedan mirov hatin xilas kirin... ▶ R. 14

**Yves Gonzalez-Quijano**
Gelo kanala El Cezîreya ku stêrka wê her diberiqî, ji ber ku dev ji prensîbên xwe yên profesyonel berdide û di bin tehdîdên diravî de ye êdî îtîbara xwe hêdî hêdî wenda dike? ▶ R. 16

**Shen Dingli**
Pêşketina lezgîn a Çînê hêzên heyî dihejîne û têkilîyên wê yên bi Amerîkayê re tevlîhev dike. Gavên ku Washington li hember vê yekê diavêje ji alîyê Pekînê ve çawa pêşwazî dibin? ▶ R. 17

**Perwer Yaş**
Mêjû; 15ê gulanê 1932, roja yekşemê... Cih; paytextê Sûriyê Şam, Taxa Kurdan. Celadet Elî Bedirxanê 39 salî hem di jîyana xwe de, hem jî di dîroka kurdan de rûpeleke nû vekir: Hawar… ▶ R. 23

# Di kêşeya kurdî de stratejîya nû

Vahap Coşkun

Piştî hilbijartinên giştî yên 12ê hezîrana 2011ê, di warê çareserîya pirsgirêka kurdî de li Tirkîyeyê hewayekî hêvîdar serdest bû. Xelk bi hejmareke bilind di hilbijartinan de beşdar bûbû. 95 dersedê vîna gel di parlamentoyê de hat temsîl kirin. BDP jî, ku bi namzedên serbixwe ketibû hilbijartinan, 36 wekîl derxistibûn û ew gihaştibû wê hêzê ku bikaribe di parlamentoyê de grûpa xwe ava bike.

Ji alîyê din de jî hevdîtinên di navbera PKK û hikûmetê de jî berdewam dikirin. Raya giştî ya Tirkîyeyê nerazîbûnek nîşanî van hevdîtinan neda, berevajî wê bawerîyeke serdest peyda bû û dihate digot da ku pirsgirêkê çareser bike hikûmet dikare bi herkesî re rûne. Raya giştî ya kurdî jî ji van hevdîtînan razî bû; ji bilî PKK/BDPyê hemû koman ji mêj ve piştgirî didan muzakereyan da ku PKK were bê çek kirin. **Öcalan** jî digot ku ji bo kurdan yek ji mezintirîn peymanên aştîyê dike were mohr kirin û lê zêde dikir ku ***"êdî hewcedarî bi şerê gelêrî yê şoreşger nema"***.

Lê belê di meha tîrmehê de ev atmosfera erênî belav bû, nema. Digel ku li Farqînê di encama lêkdanekê de gelek leşker hatin kuştin û di heman rojê de *Kongreya Civaka Demokratîk* "xweserîya demokratîk" ragihand, maseya hevdîtinan hilweşîya. Ji ber hilweşîna masê PKKê hikûmet, hikûmetê jî PKK berpirsîyar girt. PKKê îdîa dikir ku Öcalan plana aştîyê ya hikûmetê qebûl nekiriye û hikûmetê serî li taktîkên aliqandinê dide. Çavkanîyên nêzî hikûmetê jî dîyar dikir ku PKK li herêmê desthilatdarîyeke mutlaq dixwaze û xwe li alternatîfên din girtiye.

## Dawîlêhatina hevdîtinan û hişkbûna siyasetê

Piştî ku dawî li hevdîtinan hat, her du alîyan siyaseteke hişk dan ber xwe. PKKê berê xwe da **şerê gelêrî yê şoreşê**, ku baskê baz ê tê de piştgirî didayê. Lê belê, ev tercîheke xelet bû û ji nirxandineke rêkûpêk a veguherîna civakî ya gelê kurd dûr bû. Ji ber ku piranîyeke berbiçav a kurdan êdî şer nedixwest; lewma siyasetên PKKê, ku şidet pêşnîyar dikir, têk çûn. Jixwe paşê jî hin rêveberên PKKê li xwe mukir hatin û wan ev xeletî bi van gotinan dîyar kir: ***"Me şerê gelêrî yê şoreşger ragihand, lê belê baskê wê yê gelêrî qels ma."***

Hikûmetê jî dest bi sepandina siyaseteke du alî kir. Ji alîyekî ve da ku PKKê di warê leşkerî de têk bibe, lez da operasyonên xwe. Wezîrê Navxweyî **Şahin**, eynî bi zimanê hevkarên xwe yên ji salên 1990ê peyivî û got: ***"Heta ku li ser çîyayan tu terorîst nemînin, operasyon dê berdewam bikin."*** Wî digot ***"Me ji millet ferman wergirtiye"*** û lê zêde dikir: ***"Em dê koka vê rêxistina xebîs biqelihînin. Tu kes bila ranebe û nexwaze ku ev kes siyasetê bikin."*** An ku mebest ew bû ku PKK bi operasyonên leşkerî were tune kirin.

Ji alîyê din de jî hikûmetê dixwest ku bi operasyonên KCKê qada siyasetê bixwe bin fişarê û BDPê têk bibe. Her bi vê mebestê hema bêje hemû rêxistinên bajaran ên BDPê hatin destgîr kirin û bi awayekî fiîlî BDP hat wê merheleyê ku êdî nedikarî bixebite.

Ev siyaseta ku bala xwe dida ji holê rakirina PKKê ya ji çîyan û li deştan jî dengê sîvîlan bibire, ji alîyê hin stratejîstan ve, ku aqil didan hikûmetê bi awayekî har dihat piştgirî kirin. Li gor wan, heger ji vê siyasetê tawîz neyê dayîn, wê demê heta biharê PKK dê biqedîyaya.

Lê belê, tiştê ku dihat çaverê kirin pêk nehat. Ev siyaseta hikûmetê -eynî wekî siyaseta şerê gelêrî yê şoreşger ê PKKê têk çû.

▶ R. 3

Almanya: 4,50 €
Awûstûrya, Belçîka, Fransa, Holanda: 5,00 €
Brîtanya: 4 £, Danîmarka: 40 DKK, Norweç: 40 NOK, Swêd: 50 SEK, Swîsre: 6,50 CHF, Tirkiye: 7 TL

# Hin nirxandin û pêşnîyarên ji bo destûra nû

Prof. Dr. Ahmet Özer

**Pêşekî**

Sedema yek ji wan meseleyan ku bi damezirandina komarê re bûne arîşeyên kronîk, ew e ku ji împaratorîyeke pirzimanî, pirçandî, pirolî û piretnîsîteyî hewl hat dayîn ku dewleteke monîst (yekparêz) a neteweyî were damezirandin. Vê teşe û ferasetê di demên paşê de jî xwe rast nekir û wekî nexweşîyeke kronîk heta îro hat. Rêveberên Komara Tirkîyeyê bi wê mîratê re, ku wan bi tevayî ji ***Îttîhad û Tereqqî***yê stendibûn, hewl dan hemû cudatîyan ji holê rakin û wan bikin yek û bi vî awayî netewe-dewletekê ava bikin. Bi vê armancê jî, wan xwest ku kurdan bikin tirk, elewîyan bikin sunnî û sunnîyan jî bi dara sekularîzmê terbîye bikin. Ji bo bicihanîna vê yekê pêşîyê navgînên îdeolojîya 'nîzama muesses' hatin bi kar anîn. Dema ku lê hay bûn ku ev navgîn bêkêr dimînin, vê carê jî rê û rêbazên leşkerî hatin bi kar anîn. Pergala dewletê weha hatibû rê û pêk kirin ku bikaribe vê mebestê bi cih bîne û gelek sazgeh jî di nav dewletê de hatin damezirandin.

**Destûra bingehîn**, ku divê bibûya serhevdeya nirxên bilind û çîmentoya welatekî, xwedî wê mantelîteyê bû ku maf û azadîyan îhya bike, lê belê wan bixe jêr zept û reptê. Ev feraset bi **destûra derbeya leşkerî ya 12ê îlonê** gihîşt lûtkeya xwe ya herî bilind a qanûnî. Herçend di vê destûrê de 17 caran di 85 madeyan de 113 guhertin hatin pêk anîn jî, di esasê de ruh û felsefeya wê nehat guhertin. Niha peywira ku li pêşîya Meclisê ye, ku piştî hilbijartinên 22ê tîrmehê bi temsîlîyeteke mezin pêk hat, (an ku AKP, CHP, MHP û BDP) rakirina vê destûra *darbeya leşkerî* û nivîsandina destûreke nû, ku dikare bersiva pêvdivîyên Tirkîyeyê bide û pirsgirêkên wê çareser bike. Nabe ku partîyên siyasî ji sozên xwe yên guhertina destûrê paş de gav biavêjin, yan jî bi giştî talox bikin, ji ber vê yekê madeya sereke ya rojeva sala pêşîya me dê destûra nû be.

▶ R. 4



İsmail Çoban: **Meş**, boyaxa rûnî li ser tuwalê, 130 x 100 cm (Detay)

## Agahdarî !

### *Xwendevanên hêja,*

*Le Monde diplomatique kurdî*, di çirîya paşîya 2009ê de tevlî karwanê weşanên kurdî bû. Rojnameya me heta niha li Almanyayê dihat çap kirin; bi giranî li bayîyên navendî yên welatên ewropî dihat belav kirin û bi rêya postayê jî digihişt destê aboneyan. Ew hewl û xebata me, ya ku em bikaribin rojnameyê li Kurdistanê çap bikin û belav bikin, daku hêsantir bikeve destê xwendevanan, ji ber astengên fiîlî heta niha pêk nehat. Him ji ber bilindbûna mesrefên çap û belavkirinê li Ewropayê û him jî ji ber çaresernebûna gihandina rojnameyê bo destê xwendevanan, em ê ji meha hezîrana 2012ê û pê ve êdî tenê bi rêya Înternetê wek rojnameyeke elektronîk Le Monde diplomatique kurdî biweşînin.

Yek ji sedemên girîng yên derxistina vê rojnameyê ew bû ku, her çiqas hejmara weşanên bi zimanê kurdî zêde jî bin, bi ya me, bi pirsgirêkên kalîte û standardê ve rû bi rû bûn. Herweha, dîsa li gor me, ji bo civaka Kurdistanê, dîroka wê, ziman û çanda wê, di warê fikir û siyasetê de pêwîstî bi analîzên zanistî-akademîk ên berfireh hebûn. Dagirtina vê valahîyê jî bi saya dezgehên serbixwe ên çapemenî û weşanê gengaz bû.

Bi derxistina *Le Monde diplomatique kurdî*, me xwest, em ji bo cîhana kurdan ya ramanî ji hêla xwe ve pencereyekê vekin. Bi vê armancê me da ber xwe ku, em bi berzkirina asta kalîteya zimanê *Le Monde diplomatique kurdî* pirsgirêkên Kurdistan û cîhanê bi agahîyên pirhêl bigihînin xwendevanan. Bilindkirina ast û standarda zimanê kurdî, nexasim di warê siyaset û zanistê de armanceke me ya sereke bû.

Di nav wan du sal û nîvên weşana xwe ya matbû de, me gelek pesn û pîrozbahî ji we xwendevanên hêja wergirtin û vê yekê jî em dilşad kirin. Em jî ji dil spasîya hemû xwendevan, abone û piştgirên manewî dikin.

Abone û xwendevanên *Le Monde diplomatique kurdî*, dê ji hejmara hezîranê ve êdî bikaribin bi rêya elektronîk, ango bi weşana dijîtal di her 15ê mehê de rojnameya xwe bixwînin.

Ji 15ê meha hezîranê ve aboneyên *Le Monde diplomatique kurdî* dê bikaribin ji malpera **www.diplo-kurdi.com** rojnama xwe bixwînin.

Wek peyvên dawîn, daxwaza me ji akademîsyen, nivîskar, rewşenbîr, hunermend û wêjevanên kurd ew e ku bi hevkarî û piştgirîya xwe hejmara xwendevan û aboneyan zêdetir bikin û li rojnameya xwe xwedî derkevin.

Li gel xoşewîstî û silavan

Lijneya birêveber a
*Le Monde diplomatique kurdî*

www.arsivakurdi.org

*EDITO*

# Rewşeke nû

SERGE HALIMI

Guherîn niha ye… serokê dewletê yê ku serketina wî ya hilbijartinan ew gij kir, daxwaza xwe li ser birêveberê Bankeya Navendî ferz dike, ku kontroleke guherînan pêk tîne û dide zanîn ku ew ê sektoreke dîyarker a aborîyê ya ku berîya bi sêzdeh salan bi erzanî hatibû taybetî kirin, bike malê dewletê. Du endamên hukûmetê bi biryara hukûmetê li serê şirketa mezin a bûyî ya dewletê hatin wezîfedar kirin. Dema ev hat kirin jî demikdest patronên kevin derxistin. Komîsyona Ewropayê, herweha *The Wall street Journal*ê û *Financial Times*ê bi dengekî bilind hêrsa xwe û nerazîbûna xwe dan der. Heta kovara heftane *The Economist*ê pêşnîyaz kir ku welatên korsan ji G20ê werin derxistin û welatîyên wan (yên ku hilbijartineke xirab kirin) êdî bê vîze nikaribin ji bo ger û geştê biçin derveyî welêt.

Dewleta em behsa wê dikin ne li ser erdên Parzemîna Pîr [Ewropa] e. Em behsa Arjantînê dikin. Dema ku piranîya hebûnên şirketa pirneteweyî ya spanî ***Repsol*** a ku heta hingê hisedara piranîya şirketa petrolê ya arjantînî YPFê bû, 16ê nîsana bihurî dewletî kir, Serokdewleta Arjantînî **Cristina Kirchner** helwêsta xwe weha rave kir "*li ser erdên Amerîkaya Latîn û ez ê bibêjim li seranserê dinyayê em yekane welat in ku çavkanîyên xwe yên xwezayî kontrol nake*". Qaîdeya milkiyeta dewletê ji ya ku **Kirchner** lê difikire kêmtir gerdûnî ye -***Total, BP, Exxon*** û hwd. şirketên taybet in–, lê belê ji bo jinûve jihevkirina dewlemendîya kolektîf şerên din bi bîr dixin: Sewletîkirina ***British Petreoleum***ê ji alîyê **Mohemed Mosadeq** li Îranê sala 1951ê, li Misirê ya *Kanala Suezê* ji alîyê **Cemal Abdil Nasir** ya 1956ê, ya hiseyên cezaîrî yên şirketên ***Elf*** û ***Total***ê ji alîyê **Hûarî Bûmedîyen** sala 1971ê, ji sala 2003yê û pêve bi zorê xistina bin kontrola dewletê ya şirketa ***Ioukos***ê ji alîyê **Vladîmîr Pûtîn** ve li Rûsyayê. Em di heman serdemê de li Venezûelayê ji alîyê **Hugo Chàvez** ve desteserkirina PDVSAyê jî ji bîr nekin.


Hukûmeta Buenos Airesê xwedîyên berê yên YPFyê gunehbar dike ku % 90ê kara bi dest xistî li hisedarên xwe leva dike. Ji ber nebûna pererazandinê ji sala 2004ê ve hilberîna neteweyî ya petrolê % 20 kêm bû, û îtxalkirina enerjîyê bîst caran zêde bû. Ji ber ku Arjantîn ji ezmûneke biêş û azar fêr bûbû, ji bo lihevderxistina hesabên xwe naxwaze êdî girêdayî deynêdên bîyanî (û qet naxwaze girêdayî Fona Pereyan a Navneteweyî) be, ev rewş hê bêhtir acizker e.

Wêrekîya hukûmeta arjantînî ya ku gelê wê, bi xweşî pêşwazîya wê dike, bi daxwazên tezmînkirinê yên dêwane, gefxwarinên boykota bazirganîyê û pêşdîtinên herî tarî lê dibe bar û berdêleke giran. Lê belê nîşanên xirab tên bîra Buenos Airesê. Sala 2001ê dema ku Arjantîna ji taqetketî dev jê berda ku deynê xwe bide û paşê nirxê pereyê xwe daxist, hingê pêş hatibû dîtin ku krîzeke hevsengîya dana deynan û petaxeke (golgenî/avzêm) aborî li pêşîya wê ye û ev yek jê re hatibû gotin. (1) Ji hingê ve hesabên wê yên derve êdî li xwe zêde dikin, hilberîna wê % 90 zêde bû, bêkarî û xizanî kêm bû. (2) Şûna ku piştgirîya hisedarên pirneteweyî yên spanî bike, Ewropa wê bi ser keve heke îlhamê ji vîyanparêzîya siyasî ya arjantînî bigire.


1 **Maurice Lemoine**, "Face aux créanciers, effronterie argentine et frilosité grecque / *Li hemberî deyndêran, derfehatîbûna arjantînî û dijminahîya yewnanî*", *Le Monde diplomatique*, nîsana 2012ê

2 **Mark Weisbrot**, "Argentina's critics are wrong again about renationalizing oil / *Rexnegirên li Arjantînê der barê jinûve dewletîkirina petrolê de dîsa şaş in*", *The Guardian*, Londres, 18ê nîsana 2012ê

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê



# JI ÇAPEMENÎYÊ



## Krîza aborî ya li Ewropayê

Di 24ê nîsanê de rojnameya brîtanî ***Financial Times*** nûçeyek li ser krîza aborî ya Ewropayê weşand. Rojname hişyarî dide ku tedbîrên tasarufê ku ji derketina ji krîzê tên sependin, herweha bandoreke neyînî jî li ser siyaseta ewropî dike. Gotar bi bîr dixe ku jî ber kêmbûna arza sanayîyê, Almanyayê darbeyek xwariye û ji ber li hevderneketina budçeyê jî li Holandayê hikûmet ketiye. Li Fransayê jî Sarkozy di hilbijartinan de ketiye tengasîyê.

Rojnameya ***Guardian*** jî li ser heman mijarê kûr dibe û balê dikişîne ser encamên siyasî yên hewldanên serokwezîra Almanyayê **Angela Merkel**, ku dixwaze tedbîrên tasarufê bike sazgehî û van tedbîran bike parçeyekî mewzûata Yekîtîya Ewropî û Konseya Ewropî. Sernivîs weha berdewam dike:

*"Hin endamên sereke berê siyaseta xwe dane alîyên din. Peyamên alîgirên tundrew, yan jî navend, rast û çep gelek aşkere ne: Stratejîya tasarûfê, ku serkêşîya wê Almanya dike, desthilatdarîya neteweyî ya welatan qels dike, paşeroja ciwanan wêran dike û ji rasta navendî heta çepan hemû alî bawer dikin ku ev yek rê li ber bilindbûna rasta neo-faşîst vedike".*

***Guardian*** wekî din dest nîşan dike ku divê encamên tûra a hilbijartinên Fransayê ji alîyê herkesî ve, ku projeya Ewropayê cidî digirin, baş werin nirxandin, ji ber ku israrkirina di bernameyên aborî de, ku rê li pirsgirêkên civakî û siyasî vedikin, dikare ewlebûna li piştgirîyê, ku di bingeha Yekîtîya Ewropî de cih digire, tarûmar bike.

Li hember vê rewşê jî *Guardian* şîret dike ku stratejîya vejandina aborîyê, ku Almanya ji ber endîşeya bilindbûna enflasyonê dijberîya wê dike, divê were rojeva Ewropayê.

## Çekkirîna Yûnanistanê û krîza aborî

Di 20ê nîsanê de rojnameya Guardian cih da nûçeyekê ku rista çekkirîna Yûnanistanê ya di krîza aborî ya vî welatî de rave dike. Nûçe dîyar dike ku çekkirîn xwedî roleke girîng e:

*""Beramber pakêta rizgarkirinê ya 130 mîlyar euroyî ya Yekîtîya Ewropî û IMFyê, Yûnanistanê qebûl kir ku lêçûnên xwe yên parastinê 400 mîlyon euro daxîne. Li hember van kêmkirinan jî budçeya leşkerî ya Yûnanistanê 4 dersedê hasilaya millî ya welêt pêk tîne, ku ev yek du beramberî rêjeya naverastî ya Ewropayê ye ... Yûnanistanê gefa ji Tirkîyeyê wekî hincet nîşan da û ji dawîya salên 1990ê û vir ve ji Almanya, Fransa û Dewletên Yekgirtî yên Amerîkayê bi sedan tankên Leopard, topên Howitzer, firokeyên F16 û Mirage kirîn. Bisporekî ewlekarîyê yê yûnanî yê li Brukselê, dîyar kir ku 'piştî dagîrkirina Qibrisê ya sala 1974ê me bi bihayê 216 mîlyar euroyan çek kirîn. Ez bawer im ku ji ber fonên nepenî, lêçûn hîn zêdetir in''.*

*"Serokwezîra Almanyayê **Angela Merkel** ji sendîkavanekî yûnanî re gotibû 'me jixwe nexwestibû ku hûn ewqas pere bidin çekan.' Almanya15 dersedê îxracata xwe ya çekan bi Yûnanistanê re dike. Mezintirîn bazara Almanyayê ya li Ewropayê Yûnanistan e. Tê îdîa kirin, dema ku bo Yûnanistanê kredî hatiye dayîn, şert hatiye danîn ku çekên xwe ji Almanya û Fransayê bikire".*

## 'Bihara Ewropî'

Di 1ê gulanê de rojnameya *Guardian* gotareke profesorekî huqûqê yê yûnanî **Kostas Duzinas,** ku li zanîngeha Londrayê dixebite, weşand. Prof. Duzinas di gotara xwe de hilbijartinên Fransa û Yûnanistanê dinirxîne û şirove dike ku ev hilbijartin dikarin bibin *"destpêka bihara ewropî"*.

*"Heger li Fransayê namzedê sosyalîst Hollande bi ser keve, ev yek dê siyaseta tedbîrên tasarûfê bixe xeterê, lê belê hilbijartinên Yûnanistanê dikarin dîyarkertir bin. Bingehên civak û siyaseta yûnanî êdî dişimitin. Xwepêşandarên par ku bi hezaran kes daketin meydanan, tevgereke bêserok û ne xwedî îdeolojîyekê bûn".*

"Sendîkayan û mîlîtanan digel girseyan, ku di emrê xwe de cara pêşî dadiketin kolanan, tevgerîyan. Niha ew xwedî wî şansî ne ku bi rêya temsîlîyeta li parlamentoyê ferasetên xwe yên demokrasîya rasterast û piştgirîya sosyal hêzdartir bikin. Roja yekşemê dibe ku bi tenê elîteke siyasî hilneweşe, lê belê herweha dikare nexşeyeke nû ya çep jî teşe bigire, ku bikeve şûna Pasokê".

*"Piştî şerê navxweyî, Yûnanistanê çepgir şandin mişextîyê û partîyên wan kir mehkûmên muxalefetê. Lê belê dawî li vê serdemê tê. Blokeke hêzdar, ku berevanîya mafê jîyanê, demokrasî û serxwebûnê dike, wan kesan tîne cem hev ku ji mêj ve di komên dijber de cih digirtin. Hesta li hember tedbîrên tasarûfê vediguhere projeya azîneyeke radîkal û modeleke nû ya demokratîk û pê re jî derfeteke dîrokî peyda dibe ".*

*"Heger di 6ê mehê de li Fransayê serokkomarekî sosyalîst û li Yûnanistanê jî çepekî hêzdar derkeve, di navbera Parîs û Atînayê de dê bêhna biharê belav bibe. Vê yekşemê gelên fransiz û yûnan wê ne bi tenê ji bo welatên xwe, lê belê ji bo dahatîya Ewropayê jî deng bidin".*

Gotareke din a Guardianê, ku ji alîyê **Ian Traynor** ve hatiye nivîsandin, dîyar dike ku encamên hilbijartinên van herdu welatan dê teşeyeke nû bide rojeva siyasî ya Brukselê jî. Nivîskarê rojnameya brîtanî **Benedict Brogan** jî dinivîse ku *"Heger Sarkozy têk biçe, ev erdhej dê qesra serokwezîrtîya Brîtanyayê jî bihejîne".* Gotarnivîs dibêje heger alîgirê wî yê li Parîsê têk biçe, ev yek dê darbeyekê li bernameya tedbîrên tasarûfê ya serokwezîrê Îngîltereyê **David Cameron** jî bixe, ya ku wî ji ber lihevderneketine mezin a budçeyê dide meşandin. Lewma divê Cameron jî ji vê hilbijartinê, sebaret bi paşeroja xwe ya siyasî jî hin dersan derxe.

## Ji paceya Osmanî Sûrîye

Di 12ê nîsanê de rojnameya gotara **Timothy Garton Ash**ê nivîskarê Guardian ji paceya osmanî ve rewşa Sûrîyeyê nirxand. Nivîskar bal dikişîne têkilîyên dîrokî û aborî yên Tirkîye û Sûrîyeyê û dîyar dike ku endamên berê yên hêzên taybet ên tirk li cem Artêşa Sûrîyeya Azad li hember hêzên rejîma **Esad** şer dikin.

*"Hewcedarîya mudaxeleyeke însanî ya li dij Sûrîyeyê aşkere ye. Lê belê ji ber ku Rojava xemsarîyê dike, Tirkîye û hêzên din ên herêmê dê çarenûsa gelê Sûrîyeyê dîyar bikin".* Nivîs weha berdewam dike: *"Di dahatîyeke nêz de Tirkîye dê ji Brîtanyayê, Îran dê ji Almanyayê, Erebistana Suûdî dê ji Fransayê, Rûsya jî dê ji Amerîkayê giringtir be. Her yek ji van hêzan li Sûrîyeyê li dû berjewendîyên xwe ne... Ev berjewendî, ne bi tenê aborî û leşkerî ne, herweha çandî û îdeolojîk in jî. Lewma li vê derê navbera Îrana piştî inqilaba şiî û Erebistana Suûdîya li hember-şoreşa sunnî û navbera Rûsyaya piştî emperyalîzmê û Tirkîyeyeke osmanîya nû têkoşînek bi rê ve diçe ku Çîneke hêzdar jî ku dûr e, divê lê were zêde kirin. Ji ber ku Çîn dikare wezna li cem Neteweyên Yekgirtî dîyar bike".*

*"Paşayek, ku di 1912ê de di xew re çûye, îro hişyar bibe, piştî çend hefteyên hevahengîyê, dikare xwe wekî berê hîs bike. Wî dê bigotaya 'Ax! Piranîya hêzên mezin ên berê niha piçûk bûne, heman listîka kevin, herçend hinekî nûjen bûye, hîna jî tê lîstin."*

*"Heger Yekîtîya Ewropî soza ku berî 50 salan dabû bi cih bianîya û Tirkîye hembêz bikiraya, mêzîna hêzên dora Sûrîyeyê dikarî bi awayekî din bûya. Lê belê ev yek nehat kirin. Ewropa, wekî di gelek mijaran de jî weha ye, di meseleya Sûrîyeyê de jî wekî Ewropa nikare dengê xwe bide guhdarî kirin. Ji ber vê yekê çarenûsa berxwedêrên wêrek û sîvîlên mazlûm ên Sûrîyeyê bi reqabeta herêmî ya modeya kevin a hêzên desthilatdar re girêdayî ye..."*

**Le Monde diplomatique kurdî**
Ji aliyê Independent Kurdish Media Group GmbH ve tê weşandin

**INDEPENDENT KURDISH MEDIA GROUP GMBH**
Carnotstr. 4
10587 Berlin / Almanya

**Lijneya Weşanê**
Murad Satik
Riza Dînç

**Le Monde diplomatique kurdî**

**Redaksiyona Zimanî**
Mahmûd Lewendî
Remzî Kerîm

**Koordînasyon**
Yado Ciwan

**Alîkarên vê hejmarê**
Semra Polat
Ergün Yetkiner
Celîl Kaya
Nedîm Baran

**Revîzyona Wergeran**
Feryal Guladawîya
Luqman Guldivê

**Berpirsê Hunerî**
Hasan Huseyîn Devecî

**Designer**
Fabio Biasio

**Web Developer**
Erhan Yekta

Tel: 00 49 (0)30 330 990 420
Fax: 00 49 (0)30 330 990 429
info@lemonde-kurdi.com
www.lemonde-kurdi.com

**ABONETÎ**
Independent Kurdish Media Group GmbH

Berliner Volksbank
Konto: 2284 123 010
BLZ: 100 900 10
IBAN: DE78 1009 0000 2284 1230 00
BIC/SWIFT: BEVODEBB

**Abonetîya dîjîtal ya salane: 30 €**

**Le Monde diplomatique**

**Damezrîner**
Hubert Beuve-Méry

**Birêveberê giştî**
Serge Halimi

**Sernivîskar**
Maurice Lemoine

**Cîgirên Sernivîskarî**
Martine Bulardi
Philippe Rivière
Anne-Cécile Robert

**Redaksiyon**
Alain Gresh
Mona Chollet
Pierre Rimbert
Dominique Vidal

**Birêveberê hunerî**
Alice Barzilay

**Dokumantasyon**
Olivier Pironet

**Sekreter**
Sophie Durand
Monique Salomé

Tel: 00 33 (0) 153 94 96 01
Fax: 00 33 (0) 153 94 96 26

1-3, rue Stephen-Pichon, F-75013, Paris, France

# Di kêşeya kurdî de stratejîya nû (Dewama rûpela 1)

Ji ber ku vê siyasetê hawîrdoreke taybet a siyasî ya li dijî azadîyan ava dikir. Di vê hawîrdorê de, qedexeperwer û dijberên mafan derketin pêş. Bi her operasyonê re, ku dihat li dar xistin, hêzên ewlekarîyê sortir dibûn û li hember gel helwesteke hişktir nîşan dida. Rêgirtina li hember maf û azadîyan kêm dibû, hesasîyeta parastina kesên bêguneh ji holê radibû.

Dîyar bû ku ev siyaset nikare were meşandin û ew dê li derekê li dîwêr bixe. Jixwe, tabloya ku piştî komkujîya li ***Qilaban***ê û qedexekirina pîrozbahîyên ***Newroz***ê derket holê, belgeya îflaskirina vê siyasetê bû. Li seranserî Tirkîyeyê dengên dijberî hikûmetê berz bûn û şideta rexneyan jî zêdetir dibû. Li herêmê jî, her roj ku diçû êdî zehmetir dibû ku hikûmet were parastin. Wê siyasetê, ku hikûmetê digot dê alîkarîya wê bike ku pêş keve, pêşîya hikûmetê dixitimand.

## Stratejîya nû

Her li ser vê xalê, di çapemenîya tirkî de hin nûçe derketin ku hikûmet xwe amade dike da ku di meseleya kurdî de planeke nû bide ber xwe. Rayedarek, ku li ser navê hikûmetê digel nûnerên Enqereyê yên çar rojnameyan (Taraf, Milliyet, Habertürk, Yeni Şafak) hevdîtin pêk anî, li raya giştî aşkere kir ku hikûmet ji bo çareserîya meseleya kurdî stratejîyek nû disepîne.

Dema weşandina nûçeyê girîng bû. Ji ber ku helwêsta tund a hikûmetê, ku him di warê siyseta kurdî û him jî di dema Newrozê de nîşan dabû, tûşî rexneyan dibû. Du mebestên parvekirina stratejîyê ya digel raya giştî hebûn: Ya yekem, sedemên mafdar (?) ên destûrnedayîna pîrozbahîyên Newrozê dê ji gel re bihatana vegotin û dê hewl bihataya dayîn ku ev siyaset meşrû bibe. Ya duyem jî, bi dengekî ji asta jêrtir nîyeta ***"muzakereya digel siyas*****etê"** bihataya dîyar kirin û bersiva wan rexneyên vê dawîyê, ku gelek kes pê re hevbîr e û dibêje ***"hikûmetê xwe radestî perspektîfa ewlekarîyê kir"***, bihata dan.

## Bingehên stratejîyê

Bi qasî ku em ji wan zanyarîyan ku rojnameger radigihînin, agahdar dibin rayedarên hikûmetê pêşîyê tespîtên xwe yên sebaret bi wê merheleyê, ku di meseleya kurdî de hatîye gihiştin, par ve kirine û li dû wê xetên sereke yên vê stratejîya nû, ku li ser esasên van tesbîtan hatîye ava kirin, vegotîye. Sê tesbîtên hikûmetê hene:

A yekem, ên ku ev stratejî amade kiriye di wê bawerîyê de ne ku tiştên ku di warê pirsa kurdî de divîyabû bihatana kirin, di rêjeyeke bilind de hatine bi cih anîn. Ew dîyar dikin ku divê kurd qîma xwe bi wan tiştên ku hikûmetê kirine, bînin. Ew dibêjin anîna daxwazên wêdetir a rojevê ne xwedî mebesteke azadîxwaz e, lê berevajî wê dê rê li parçebûn û jihevketinê veke.

A duyem, li gor xwedîyên stratejîyê ji bo çareserkirina meseleya kurdî hevdîtinên digel PKKê rîskeke gelek mezin e. Ev yek di raya giştî ya tirkî de dibe sedeme înfîalê û li ***"meseleya kurdî"***, ***"meseleya tirkî"*** jî zêde dike. Meseleya tirkî jî, ji meseleya kurdî zêdetir xwedî potansîyeleke hilberîna encamên xerapkertir û girantir e.

A sêyem, baskê hikûmetê, weha ferz dike ku ew kurdên ku piştgirîya wan nakin ji ber tirsa PKKê, destekê didin wê. Wekî ku **Alper Görmüş** dest nîşan dike, hikûmet li ser esasê vê ferzkirinê vî hesabî dike: ***"Heger hêza PKKê heta wê asta nizim were daxistin, ku êdî nikaribe kurdan bitirsîne, kurd dê ji vê yekê kêfxweş bin û dê piştgirîyê bidin planên çareserîyê yên hikûmetê."***

## Xeletîya tesbîtan

Di wê bawerîyê de me ku ev her sê tesbît jî xelet in. Jixwe, him di warê taybetî ya meseleya kurdî de û him jî bi gelemperî li Tirkîyeyê ji bo demokratîkbûnê hîna rêyeke dirêj maye. Perwerdehîya bi zimanê dayîkê, temsîlîyeta siyasî, azadîya partîyên siyasî, xwe-birêvebirin, hevwelatibûn, azadîya xwe derbirînê û hwd. di gelek mijaran de gelek astengîyên qanûnî û destûrî hene. Îro tu kurdek nikare perwerdehîya bi zimanê dayîkê bide zarokê xwe. Du kesên ku di heman dozê de tên darizandin, yê ereb dikare parastina xwe bi zimanê xwe yê dayîkê bike, lê yê kurd dema doza parastina bi zimanê dayîkê dike, dadgehên tirk rê nadin. Girtîgeh bi wan kesan, ku doza daxwazên siyasî yên kurdan dikin, tije dibin. Dema ku rewş weha be û rabin ji kurdan re bibêjin ku *"Me her tişt kiriye, hûn êdî doza çi li me dikin? Êdî çaverêyî tiştên din nebin"* eyb dikin.

Argumana ku dibêje "pirsgrêka tirk dê derkeve" gelek balkêş e. Wan bi gotinên ***"Bi vekirina filan tiştî niha jî pirsgirêka tirkî dernexin serê me"*** hikûmet dianîn ser rê. Lê belê tiştên ku di pêvajoya paşê de hat jîyîn, piştrast kir ku li cem xelkê ev arguman ne muteber e. Wekî mînak AKPyê yek ji mezintirên mîtên siyaseta tirk, ku digot "nabe ku digel terorîstan were rûniştin", hilweşand. Wê digel **Öcalan** û Qendîlê hevdîtin pêk anîn. Xelk jî li hember wan nerazîbûnek nîşan neda. Berevajî wê helwêstek weha nîşan da ku dikare weha were şirove kirin: ***"Tu hema pirsgirêkê çareser bike, bi kê re rûdinî rûne"***. AKPyê her demek ku lez da demokratîkbûnê, wê demê bi awayekî mafdar ji xelkê piştgirîyeke mezin wergirt. Xelk li hember tu pêngavekê ku azadî û demokrasî hêzdartir dikirin û di çareserîya pirsgirêkan de tevkarî dikir, nebû asteng, lê piştgirî da wan. Lê belê herçend rastîyeke weha heye jî hikûmet xwe dispêre vê argumanê, ku berê li dij wê dihat bi kar anîn û li ser wê argumanê siyasetê dike. Ev yek jî rewşeke xemgîn e.

## PKK û Kurd

Ew helwêstên ku têkilîya navbera PKK û kurdan li ser "tirsê" re fêm dikin rastîyê nîşan nadin. Ewên ku li ser navê dewletê siyasetê pêk tînin, divê -berîya hertiştî- bibînin ku kurd dîlên PKKê nînin. Kurd, hevdilên PKKê jî tê de, ne komek in ku her siyaseteke PKKê bê pirs û nirxandin rasterast qebûl dikin. Dema ku PKK xeletîyekê bike -wekî mînak li dij vîna gel siyasetên xwîndar ên wekî "şerê gelêrî yê şoreşger", ku di vê serdema me de ne xwedî tu cihan e, bimeşîne- xelk nerazîbûnê li hember PKKê nîşan dide, piştgirîya ku didiyê paş de dikişîne. An ku girseyeke kurdî, ku ji ber tirs û xof aqil berdabe û hişê PKKê di bêrîka xwe de digerîne, nîne.

Dibe ku kêfa deshilatdar û alîgiran neçe û dibe nexwazin qebûl bikin, lê belê yên ku piştgirîya PKKê dikin ne ji ber ku jê ditirsin piştgirî didinê. Ew ji ber ku difikirin ku heger PKKê nebûya dewleta tirk dê –wekî kurd- mafê jîyanê nedaya kurdan, li cem PKKê radiwestin. Ev yek jî meşrûbûneke hêzdar a sosyolojîk dide PKKê.

Ev meşrûbûna sosyolojîk encax dikare bi siyaseteke dualî were kêm kirin. Ji alîyekî ve divê bernameyeke demokratîbûnê, ku mafên kurdan -bê şik û guman, bê qeyd û şert- dide wan ji alîyê din de jî bernameyeke bêçekkirinê, ku bihêle PKKyî vegerin jîyana normal, werin meşandin. Heger di şûna wê de hûn projeyekê deynin, ku mebesta wê kuştina PKKyîyan be, ji encamê de hûn bêhtir avê dikişînin wî aşî, ku PKKê hêzdartir dike.

## Kevirên bingehîn ên stratejîyê

Fikret Bila deh bendên ku ji vê stratejîya nuh tên pêşbînî kirin, weha rêz dike (Milliyet, 22.03.2012):

*1-Di warê çareserîya pirsa kurdî de ji bilî kanala siyasî ehemîyet û bawerî bi tu kanalên din nayê dan, tu kanalên din nayên bi kar anîn*

*2- Ne li Îmralîyê Öcalan, ne jî li Qendîlê, yan jî li Ewropayê PKK wekî muxatab were girtin, ew dê li derve werin hiştin.*

*3- Hevwelatîyên kurd, ku li Rojhilatê Başûr û li herêmên din dijîn, dê ji fişara PKK û KCKê werin rizgar kirin.*

*4- Bi vê mebestê rasterast xelk wekî muxatab were girtin û dê bi rêya siyaseta sîvîl li çareserîyê were gerîn.*

*5- Wekî cihê çareserîyê tu zemînekî din ê derveyî parlamentoyê nayê qebûl kirin; ew partî werin muxatab girtin ku hevsarên wan ne di destê Imralî û Qendîlê de ne, bi awayekî demokratîk hatine hilbijartin û ketine Meclîsê û dikarin însîyatîfa siyasî bi kar bînin.*

*6-PKK, her ku çalakîyên xwe yên çekdar berdewam bike, têkoşîn jî dê berdewam bike.*

*7- Heger careke din bi PKKê re hevdîtinek pêk were, ev yek dê bi tenê sebaret bi bêçekkirina wê be.*

*8- Dema ku PKK çekên xwe radestî Tirkîyeyê bike, paşê were biryardayîn ka digel wan kesan yên ku ne xwedî pirsgirêkên qanûnî ne, pêvajoyeke çawa were şopandin.*

*9- Di destûra nû de nasname, yan jî xweserîya kurdan dê nebe. Destûra nû li ser esasên mafên mirovan û yeksanîya hevwelatîyan a li ber qanûnê were çêkirin.*

*10- Birêveberîyên herêmî dê werin hêzdartir kirin, prensîpên huqûqa navneteweyî dê werin esas girtin.*

## Tiştekî "nû" nîne

Di wê bawerîyê de me ev stratejîya ku ji ber çend sedeman li ser zemîneke xelet hatî ava kirin, nikare bigihe encamên rast:

**I –** Di vê stratejîyê de rêgezek ku wekî "nû" were bi nav kirin nayê dîtin. "Îmrali, Qendîl, PKKya li Ewropayê wekî muxatab nayên girtin. Kurd dê ji fişara PKK û KCKyê werin rizgar kirin. Her ku çalakîyên çekdar berdewam bin, têkoşîna li dij PKKê jî berdewam bike." û hwd. dîyar dikin ku meseleya kurdî di bingeha xwe de wekî pirsgirêkeke asayîşê tê dîtin. Siyasetên ku li ser van gotinan werin ava kirin, jixwe di halê hazir de tên sepandin û ji çareserîyê tu hêvîyan nadin.

**II –** Ev gotina "Li dij rêxistina terorîst têkoşîn, di gel baskên wê jî muzakere" ya ku pir tê dubare kirin û hêvî li ser tên girêdan, ne tiştekî nuh e. Herçend serok wezîr vê hevokê ji dema ku BDP 2007ê de ket Meclisê û vir ve bi lêv dike jî, jê encameke erênî dernaxe. Du sedemên vê yekê hene: Ya yekê serokwezîr digel BDPê bi pozbilindî dipeyive; li gor wî BDP di warê çareserkirina pirsê de ne ew muxatab e ya ku pê re wek alîyekî wekhev danûstandin bên kirin. Pêşîyê bi gotina "dûvelankên rêxistina terorê" BDPê biçûk dixe, rûmeta wê dişkêne, paşê jî bi wan re peyivînê wekî wekî lutfekê pêşkêş dike. Ev zimanekî pir tamsar e û ji ber vî zimanî jî rê li ber dîyalogeke berhemdar venabe.

## Pêş-şerteke nemumkin û nehewce

A duyem, serokwezîr hertim li bendê ye ku BDP hin pêş-şertan bi cih bîne. Ji vê partîyê dixwaze ku di navbera xwe û PKKê de mesafeyekê deyne û ji PKKê azadtir vîneke siyasî nîşan bide û gava ev şert pêk werin, muzakere dikare were kirin. Lê belê ev şert, him nemumkin û him jî ne hewce ye. Nemumkin e ji ber ku BDP digel PKKê girseyeke civakî par ve dike, doza heman îdealên siyasî dike. Lewma ne mumkin e ku BDP li dij PKKê helwêsteke nîşan bide, yan jî berê xwe jê biguherîne. Ne hewce ye, ji ber ku BDP encax bi saya têkilîya xwe ya digel PKKê dikare di meseleya kurdî de tevkarîyekê bike. Mirov nikare hêvîya bandoreke ji BDPyekê, ku têkilîya xwe ya bi PKKê re birîye, bike. Helwêsta rast ew e ku wê jêhatîbûn were nîşan dan ku ev têkilîya BDPê ya digel PKKê di rêya çareserîyê de were bi kar anîn. Lê belê hikûmet di şûna wê yekê de hertim pêş-şertek, ku ne mumkin e û ne hewce ye, datîne pêş; ev şert jî ji destpêkê ve muxataba muzakereyê ji holê radike. An ku hikûmet ji alîyekî ve dibêje *"****em li derveyî parlamentoyê li tu çareserîyan nagerin****"* ji alîyê din de jî tenha rêya siyasî, ku di parlamentoyê de ye, bêkêr dihêle.

## Muxataba bêçekkirinê

**III –** Hevdîtîna digel BDPyê bi tena serê xwe ji bo çareserîya pirsgirêkê têrê nake. Ji ber ku yek ji xalên ku meseleya kurdî xetimandiye, bêçekkirin e. Weha dîyar e ku bêyî ku PKK were bêçek kirin derfetek nîne ku ev kêşe bi awayekî demokratîk û aştîyane were çareser kirin. Lewma, stratejîyek, ku li çareserkirina pirsgirêkê digere, dibe xwedî alîyekî bêçekkirinê jî be. Heger tê xwestin ku rêxistin were bêçek kirin, wê demê divê pêvajo û mercên bêçekkirinê digel wê rêxistinê an ku bi PKKê re werin nîqaş kirin û hevdîtinên bi vê mebestê werin li dar xistin. Bi lidervehiştina PKKê çareserîyek nikare pêk were.

Hevserokê giştî yê BDPê **Selahattîn Demîrtaş** ev yek bi awayekî aşkere dîyar kir. (Taraf, 09.04.2012, Hevpeyvîna Neşe Düzel) Demîrtaş dîyar kir ku ew ji bo gotûbêjkirina maf û azadîyên gelê kurd amade ne ku di her platformê de digel hikûmetê muzakere bikin, lê belê divê hikûmet meseleya bêçekkirinê digel PKKê nîqaş bike:

*"Hikûmet nikare mijarên çek û agirtbestê rasterast bi me re gotûbêjê bike. Serokwezîr bi xwe jî dizane ku di vî warî tu destûrmendîyeke me nîne. Li ser meseleya çekan em nikarin rasterast biryarekê bidin. Ew meqam dezgeh û sazîyên bi me re girêdayî nînin. Heger alîkar qebûl bikin, em dikarin di warê çekan de bi tenê qasidîyê bikin. Lê belê Serokwezîr dîsa jî dixwaze mijarên çekan bi me re gotûbêj bike. Paşê jî radibe dibêje: 'Heger hûn di vê mijarê de xwedî destûrmendîya biryarstendinê nînin, ez dê bi we re li ser çi bipeyivim".*

Di stratejîya hikûmetê de tu hêmaneke nû tuneye û helwêsta berê ya li ser esasa ewlekarîyê di ambalajeke nû de wekî "nû" datîne pêşîya me. Di meseleya kurdî de ferasета ewlekarîyê tu çareserîyan nayne. Ji ber ku ev helwêst pevçûn û mirinan zêde dike, neteweperestîyê sor dike û me ji çareserîyê dûr dixîne. Tecrûbeya dora sih salan, delîlekî aşkere ye ku perspektîfa ewlekarîperest bi tenê rê li travma û êşê vedike. Hikûmeta ku hemû bala xwe dide 2014ê, wê wêrekîyê nikare nîşan bide ku siyaseteke nû biafirîne, ku di meseleya kurdî de demokratîkbûnê ji xwe re esas digire û hêvîya xwe bi siyasetên berê girê dide. Lê belê dê ev siyaset, qada demokratîk tengtir bike; pirsgirêkê kûrtir bike û dê dijwartir bike ku em bigihîjin çareserîyê.

## Şiverêka mirinê û rêya jîyanê

Lê belê em çawa dikarin xwe ji vê çembera stewr rizgar bikin? Gotinên **Mithat Sancar** (Taraf, 28.03.2012) van rêyan nîşan dide:

*"Piştî wê tecrûbeya salan, ne hewce ye ku mirov bibe kahîn da ku bikaribe bibîne ku stratejîyên ewlekarîyê rê li wêranî û janan vedikin. Di ronahîya van tecrûbeyan de divê herkes vê pirsê ji xwe bike:* ***Heger em heta 2014ê weha berdewam bikin, li meydana tu tunel munel namînin; heger bimîne jî dê di dawîya wê de ronahîyek hebe; hebe jî gelo wekî civak taqeta me dimîne ku me bigihîne ronahîyê?***

*Îhtîmaleke gelek mezin e ku ev "şiverêka" me daye ser, wê me kaş bike wê xala bêyom. Lê belê guhertina vê birêveçûnê û ketina rêyeke din ne ewqas dijwar e. Û heta hin xal, ku di "stratejîya nû" ya hikûmetê de cih digirin, bi rastî û "ji dil" werin sepandin, mimkun e ku em di demeke kurt de jî vê* ***"şiverêka mirinê derkevin û bikevin rêya jîyanê."***

*Di "stratejîya nû" de giranîyeke taybet li ser gotina****"rêya siyaseta sîvîl û parlamentoyê"*** *tê bar kirin û tê dîyar kirin ku BDP dê wekî muxatab were dîtin. Da ku ev yek hêjayî bawerkirinê be û bikêrhatî be, serê pêşî divê* ***"qada siyaseta sîvîl"*** *were hêzdar kirin. Rêya vê yekê jî, ji rakirina qedexeyan, ku siyasetê dorpêç dikin, ji rawestandina zextan û berfirehkirina azadîyan derbas dibe. Pêngava herî şênber, ku dikare di vî warî de were avêtin, serbest berdana wekîl, şaredar û siyasetmedarên din e, ku di çarçoveya operasyonên KCKê de hatine destgîr kirin.*

*Heger tê xwestin ku "rêya siyaseta sîvîl û parlamentoyê" bi kêr were, wê demê divê dev ji wê şêwazê, ku BDPê tewanbar nîşan dide û piçûk dixe, were berdan û helwêstek were pejirandin, ku siyasetmedarên kurd wekî partnerên yeksan dibîne.*

*Da ku ev hawîrdor were afirandin, ew yek xwedî girîngîyeke heyatî ye ku PKK agirbestekê rabigihîne û operasyonên leşkerî jî werin rawestandin. Di warê muzakere û dîyalog, danîna çekan û çareserîyê de lîstina rola "ku tê xwestin" a ji alîyê BDPê encax ev hemû pêk werin, dikare di zemîneke rasteqîn de were nîqaş kirin."*

Wergera ji tirkî: Celîl Kaya

# Hin nirxandin û pêşnîyarên ji bo destûra nû (Dewama rûpela 1)

## Du mijarên sereke

Li vê derê bi kurtasî du mijarên sereke derdikevin pêş:

1) Destûra bingehîn dê bi çi rêbazekê were çêkirin?
2) Naveroka wê divê çawa be?

Bersivên ku ji van her du pirsan re werin dayîn, dê dîyar bikin ka destûra nû dê bikaribe bersiva pêdivîyên Tirkîyeyê bide yan na. Ji ber ku ji bo civakekê tiştê herî bi qîmet a cîhanê ne pere-zêr yan elmas e, lê belê destûreke pêdivîyên heyî ye, an ku ji bo Tirkîyeyê jî destûreke nû ye. Dema ku destûra nû tê çêkirin divê binê van serenavan vala neyên hiştin:

1) Rêbaza çêkirinê
2) Prensîp û sazgehên bingehîn
3) Nasname
4) Azadîya ol û wijdanê
5) Jihevcudakirina hêzan
6) Rêveberîyên navendî û herêmî

## 1. Di warê felsefe û prensîpên bingehîn de destûr

**1.1. Felsefeya esasî û pêdivîyên nû**
Tirkîye di warê ol, ziman, menşeya etnîk, mezhep, cudatîyên çînî ve xwedî gelek pircuretîyan e. Diviya bû ku ji bo bihevrebûna vê civaka pirreng bi rêk û pêk bihata bi rê ve birin, destûr, bi muzakerekirinek di pêvajoyeke domokrasîye de bersiva daxwazên aborî, çandî û siyasî yên van koman bidana. Lê belê heta niha hertim berevajîya vê yekê hatiye kirin. Heger dev ji tirsan were berdan, serî li spartina bi zorê neyê dayîn û muzakere bêyî xetên sor werin kirin, wê demê dikare destûreke nû were çêkirin, ku dikare bersiva pêdivîyên Tirkîyeyê bide.

Da ku pexşana destûrekê wekî 'nû' were bi nav kirin, divê ew du taybetmendîyan di nav xwe de bihewîne. Yek, divê felsefeya destûra nû ji felsefeya destûra berê cudatir be. Destûr xwedî gelek peywiran in û him ji bo dewletê, him jî ji bo civakê pergalekê tînin, destûrmendîyê didin dewletê, qada maf û azadîyên takekes û koman dîyar dikin, îdeal û mebestan datînin pêşîya civakê û rejîmê meşrû dikin. Destûrek dema ku van peywirên xwe tîne cih, gelek girîng e ka destûr xwedî felsefeyeke çawa, kîjan nirx û prensîpan e. Destûra 82ê: Dewletê pîroz dike, selameta dewletê wekî nirxa pêşîn a siyasî datîne ber xwe û tê dîtin ku li ser bingeh û felsefeyeke dij-azadî hatiye çêkirin. Lewma destûra nû divê takekesan wekî armanc deyne ber xwe, maf û azadîyên takekes û koman wekî nirxa bingehîn bipejirîne, pirrengîya civakê nas bike, tu îdeolojîyan bi ser civakê de ferz neke û felsefeyeke azadîxwaz bike serdest û divê hemû madeyên wê li gor vê felsefeyê werin nivîsandin. Ya duyem, divê destûra nû ji arîşeyên qedîm û strukturî yên Tirkîyeyê re çareserîyên demokratîk hilberîne.

Di vê çarçoveyê de qadên pirsgirêkan, ku divê destûra nû çareser bike, ev in: Rejîma wesayetê, struktura arîşeyî ya têkilîya ol û dewletê û meseleya kurdî.

Berîya hertiştî divê destûra nû **rejîma wesayetê tasfîye bike** û bihêle li Tirkîyeyê 'demokrasîyeke rasteqîn' peyda bibe. Destûra nû herweha divê wê derfetê bide ku hikûmet û parlamento bi awayekî bandorker çavderîya artêş û hêzên ewlekarîyê bikin; îmtiyazên leşkeran rabike û dawî li pergala duserî ya huqûqê bîne. Divê dawî li wesayeta hikûmeta navendî ya li ser rêveberîyên herêmî were. Ji ber ku di roja me ya îro de ferasetên burokratîk êdî îflas kirine. Di şûna wan de divê feraseta rêveberîya di cih de û ***ademi temerkuz*** (nebûna strukturekê navendî) were pejirandin.

Divê **têkilîyên ol-dewlet-takekes** di eksena azadîyê de ji nû ve were ava kirin. Destûra nû divê li hember hemû bawerîyan dewletê bixe rewşeke nêtar û divê pergaleke huqûqî û civakî ya adilane bîne ku tê de hemû kes -bawermend û nebawermend- wekî takekesên yeksan bijîn. Azadîya xwe derbirînê ya endamên komeke olî, azadîya wan a xwe bi rêxistin kirinê, mafên wan ên perwerdehîya olî û mafê wan ê xebatê bixin jêr garantîyê û bi vî awayî li hember qedexeyên li dij kesên bawermend û kom û cema'atên olî garantîyek were anîn. Wekî mînak, divê di nasnameyan de olê kesan neyê nivîsandin.

Di warê **meseleya kurdî** de jî, ev mesele îro bi sê alîyên girîng li pêşîya me ye.

**1)** Da ku aştîya civakî pêk were divê çek werin danîn. (PKK divê ji çekan were pak kirin û bibe rêxistineke siyasî.

**2)** Bingeha psîkolojîk, ku pêş-şerta avêtina gavên berbiçav e, divê were ava kirin. (ez wan wekî nîyet, empatî, zimanê aştîyê û xwe rizgar kirina ji paranoyaya parçebûnê binxêz dikim.

**3)** Avêtina gavên berbiçav. Di nav van gavan de perwedehîya bi zimanê dayîkê, xwe-birêvebirin, an jî rêveberîya herêmî ya xweser a hêzdarkirî û îhyakirina mafên çandî hene. Da ku Tirkîye di nav aştîyê de rêya xwe berdewam bike, divê ev xal di destûra nû de bi awayekî werin çareser kirin, yan jî derfeta çareserîyê werin danîn, bi garantîyên qanûnî ve werin girê dan. Ji ber ku daxwazên kurdên li Tirkîyeyê di dora van sê xalan de kom dibin.

Di warê **mafên çandî** de, kurd dixwazin zimanê xwe yê zikmakî di hemû merheleyên perwerdehîyê de bi kar bînin û bi meqamên fermî re bi zimanê xwe têkilîyê deynin. Ew herweha dixwazin ku destûra nû ji hemû çandan re vekirî be û têgiha hevwelatîyê li ser nasnameyeke etnîkî neyê spartin. Di warê **temsîlîyetê** de jî ew naxwazin ku benda ji sedî deh pêşî li wan bigire û vîna siyasî bi awayekî adilane bikeve parlamentoyê. Di xala **Xwe-birêvebirinê** de kurd dixwazin di rêveberîyê de bi awayekî çalaktir cih bigirin û strukturekê weha ya îdarî-siyasî daxwaz dikin ku di girtina biryarên li ser xwe de ew jî bibin xwedî mafê gotinê. (Di vî warî de hin alî doza federasyonê, hin alî xweserîya demokratîk bixwazin jî di esasê de ew hemû daxwaz dikin ku Tirkîye bi awayekî ***ademî merkezîyet*** ji nû ve were ava kirin û destûrmendîyên birêveberîyên herêmî werin berfirehtir kirin, ku sazîyên xweser ên îdarî û siyasî jî tê de ne.

## 2. Destûra nû û birêveberîyên herêmî

Li Tirkîyeyê îdare cangiran, bi hişkî navendperest û xwedî burokrasîyeke giran e û divê were nûjen kirin û îdare were çalaktir kirin. Ev yek ji alîyê herkesî ve tê zanîn û hema hema ji alîyê hemû partîyên siyasî ve jî tê ziman. Herweha tê zanîn ku ev arîşe dikare bi hêzdarkirina birêveberîyên herêmî ya bi feraseteke demokratîk a nûjen were çareser kirin. Ji bo wê jî divê hin destûrmendî, ku li navendê kom bûne, digel çavkanî û berpirsîyarîyan derbasî birêveberîyên herêmî werin kirin. Ev pêkanîn di talîyê de dê birêveberîyên herêmî yên demokratîk û xweser bîne holê. Ev hewcedarî tê pejirandin, lê di dema sepandinê de bi hincetên cur bi cur dev jê tê berdan. Di bingeha van hincetan de jî ev fikar heye: *"Heger destûrbendî derbasî rêveberîyên herêmî bibin gelo struktura unîter a dewletê xera nabe?"* Rastîya ku paşxaneya vê fikarê pêk tîne jî ew herêm in ku piranî kurd lê dijîn. Lê belê rastîyeke din jî berevajî bi pêş dikeve. Heger ev mesele neyê çareser kirin, wê demê meseleya kurdî, wekî ku niha jî tê dîtin, dê mezintir û girantir be.

An ku çerxeke stewr heye. Difikirin ku heger destûrmendî derbasî herêmîyan bibe kurd ê hêzdar bin û veqetin, dewleta unîter dê zirarê bibîne. Lê ji ber ku ev destûrmendî nayên dayîn, pirsgirêka kurd mezintir dibe û her ku diçe rîskên ku gef li struktura unîter a dewletê dixin bi xwe bilindtir dike. Berxwedana li dij van daxwazan jî di serdema me de nikare vê meseleyê veşêre û berevajîya wê, meseleyê hartir dike û radeya daxwazan bilindtir dike. Her ji ber vê yekê, heger navendperestî were rakirin û birêveberîyên herêmî ji nû ve werin saz kirin, ev yek dê ne bi tenê pirsgirêkên şaredarî û herêmî çareser bike, lê herweha dê di çareserîya pirsgirêka kurdî de jî tevkarîyê bike. Lewma ji bilî mijarên wekî ewlekarî, karûbarên derveyî welêt, edalet û projeyên mega, ku hemû welêt têkildar dikin, divê hemû destûrmendî, digel çavkanîyan, derbasî birêveberîyên herêmî werin kirin.



İSMAİL ÇOBAN: **Dîmenên mirovan I**, boyaxa rûnî li ser tuwalê, 120 x 100 cm

## 3. Hin pêşnîyarên berbiçav

Jixwe encannameya konferansa bi navê "**Çima Destûreke Nû**" ku li Dîyarbekirê bi beşdarbûna 69 sazî û dezgehan bi rê ve çû, ku di wan de ***Mazlum-Der, İHD, Tuhad-Der, Dives, Baroya Amedê*** û ***SES*** jî hebû, bi baldarî were nirxandin. Di encamnameyê de hin daxwaz derketin pêş.

**3.1. Di destûra nû de divê mirov û heysîyeta mirov esas werin girtin.** Divê ji bo hemû komên bi dezavantaj piştgirîya pozîtîf were dayîn û ev yek bikeve jêr garantîyê. (Divê ne mirovên dewletê, lê dewleta mirovan esas were stendin.)

**3.2. Divê Dewlet bêalî û bêîdeolojî be.** Taybetmendîya dewletê ne ew be ku cudatîyan biguherîne, lê di şûna wê de li hember hemû îdeolojî, bawerî û nirxan bê alî be. (Divê mantelîteyek weha hebe ku struktura pirrengî û pirçandî nas bike û derfetê bide ku pêş bikevin.)

**3.3 Divê di destûrê de tu hikûm wekî pîroz neyê bi nav kirin û divê hikûm nebin ku nikarin werin guhertin, yan jî nabe ku guhertina wan werin pêşnîyar kirin.** (Madeyên destûrê ku niha nabin ku werin guhertin, divê bikaribin werin guhertin. Ji ber ku israrkirina di neguhertinê de ji destpêkê de zirarê dide îdeala destûreke nû.)

**3.4. Divê di destûrê de tarîfeke weha ya hevwelatîbûnê hebe ku tu nijadê binxêz neke, cudagerîyê nexe navbera tirkan û kurdan û nasnameyên din ên etnîkî.** (Wekî mînak madeya 66ê ya destûra niha dibêje *"Her kesê ku bi hevwelatîyê girêdayî dewleta tirk e, wekî tirk tê bi nav kirin.* Madeyên wekî vê jî divê tê de nebin û destûr divê etnîk-kor be.)

**3.5. Divê bê binxêz kirin ku her kesek bêyî şert û mercan xwedî mafê perwerdehîyê be.** Hikûmên cudagerîyê pêş dixin, divê werin rakirin û ji bo wan hemû nasnameyên etnîkî, ku doza perwerdehîya bi zimanê dayîkê dikin, ji alîyê dewletê ve perwerdehîya bêmûçe were dayîn. (Mafê perwerdehîya bi zimanê dayîkê ne bi tenê mafekî huqûqî lê belê mafekî însanî ye û divê hemû astengên li pêşîya wê werin rakirin.)

**3.6. Divê ji bo herkesî azadîya ol û wijdanê were dayîn.** Divê azadîya mirovan a bawer kirin, yan jî bawer nekirinê were parastin û jîyana li gor ol û bawerîyekê ku ji alîyê komekê ve hatiye pejirandin, divê bixin jêr garantîyê. (Di warê bawerîyan de divê destûr bêalî be û çandekê li ser mirovan ferz neke. Divê Serokatîya Dîyanetê yan were rakirin, yan jî ji nû ve were saz kirin.

**3.7. Divê dawî li wesayeta leşker, burokrasî û dadwerîyê ya li ser hilbijartîyan were** û divê desthilatdarîya gel were pêk anîn. MGK divê were rakirin, destûrmendîya hilbijartîyan a di hilbijartina leşkeran, ku bi Wezareta Berevanîyê ve girêdayî ne û li hember wê jî berpirsîyar in û herweha di hilbijartina endamên dadgehên bilind de divê werin zêde kirin. (Heger bi rastî jî dixwazin di şûna huqûqa desthilatdaran de

www.arsivakurd.org

desthilatdarîya huqûqê pêk bînin, ku hertim qala wê dikin, divê ev gav bê texsîr were avêtin.)

**3.8. Divê cudakirina hêzan aşkere be, di biryarstendinê de ne dewlet lê edalet esas were girtin.** Ev hêz divê serbixwe û bêalî bin. (Serbixwebûn û bêalîbûn nabe ku li gor kêfa desthiladarîyê wateya xwe biguherîne, yan na ew dikare xeternak be. Lewma divê jêrxaneya teknîkî û huqûqî ya vê yekê di destûrê de were garantî kirin.)

**3.9.** Hemû çalakîyên wan sazîyên ku li ser navê gel kar dikin, ku parlamento, hikûmet û dadwerî jî tê de, **ji bilî azadîya fikir û ramanê, serbest bin, lê ji bo sûcên din parastina destnedanê were rakirin.** (Mirov hîna jî ji ber gotinên xwe dikevin girtîgehê, lê belê ewên ku bertîl distînin, pere dixin zîmmeta xwe û sûcên adî li dar dixin, di bin sîwana destnedanê de serbest digerin. Ev yek jî şermeke mezin a Tirkîyeyê ye.)

**3.10. Divê li hember hemû sazî dezgehên dewletî çavderîyeke bandorker a dadwerîyê hebe** û sazgehên dewletê jî hesabê bidin. (Tiştê ku "dewleta demokratîk" ji "dewleta burokratîk" cuda dike "hesab dayîn" e. Heger ev nebe her çiqas ji demokrasîyê were behs kirin jî ev yek nikare ji gotinê wêdetir here.)

**3.11. Nabe ku ji ber hincetên îdeolojîk û neteweyî asteng li pêş partîyên siyasî werin danîn, yan jî ew werin qedexe kirin.** (Tirkîye niha veguherîye goristana partîyên siyasî. Azadîya xwe derbirînê bi tenê dikare di nav azadîya xwe bi rêxistin kirinê de watedar be.)

**3.12. Divê struktura navendperest a burokratîk a dewletê were piçûktir kirin û dawî li wesayeta tayînkirîyan a li ser hilbijartîyên birêveberîyên herêmî were anîn.** (Du alîyên vê yekê hene: Wekî li jorê jî hat gotin, kar bi rêveberîyên navendperest û bi burokrasîya hişk êdî nameşin. Tirkîye hîna jî welatekî weha ye ku hemû pirsgirêk li Enqereyê tên tesbît kirin, li Enqereyê tên çareser kirin û hemû çavkanî di destê Enqereyê de kom bûne. Lê belê ev kirasê Enqereyê, ku ji Tirkîyeyê re teng tê, êdî rizîyaye. Lewma divê Tirkîye Şertên Xweserîya Birêveberîyên Herêmî ya Yekîtîya Ewropî, ku hewlê dide bibe endama wê, ji xwe re esas bigire û dev ji navendperestîyê berde. An ku wateya vê yekê birêveberîyên herêmî yên xweser ên hêzdar e.)

### 4. Madeyên ku nabe werin guhertin

Derbarê guherandina madeyên destûrê de hin dîtinên cuda hene. Di warê îdeolojîya destûrê de, destûr pirrengîyê nabîne û bi tenê îdeolojîyekê wekî nirx û referansa berz qebûl dike ku nabe were gotûbêj kirin. Bi vî awayî, destûr û prensîpa di warê îdeolojîyê de bêalîbûna dewletê, ku hîmên esasî yên pergaleke siyasî ya azadîperwer in, li alîyekî hatin hiştin. Lê belê di demokrasîyên azadîperwer ên nûjen de dewlet, di heman mesafeyê de dûrî hemû îdeolojîyan e, li ser hevwelatîyên xwe îdeolojîyeke dîyarkirî ferz nake û wekî dewleteke bêalî ye ku hevwelatî bi xwe hilbijêrin.

Li Tirkîyeyê îdeolojîya ku ruh û naveroka destûrê û herweha sedema hebûna wê dîyar dike "Kemalîzm" e. Ku di doktrînê de jê re "Ataturkîtî" jî tê gotin, ev îdeolojî di destûrê de wekî "Şoreş û înqilabên Atatürk" derbas dibe. Lê belê di destûran de nabe ku navê şexsekî were bi kar anîn. Em bibêjin heger yek ne ataturkî be hingê wê çi bibe? Gelo ew kes dibe hevwelatîyekî derveyî destûrê?

Nabe ku destûr li ser destûrekê were spartin, ku hişk û otorîter e, hin alîyên civakê li derve dihêle û awayê jîyanê ya takekes û civakê dîyar dike. Li Tirkîyeyê ev pirsgirêk heye. Dema ku destûrek tê çêkirin, divê bersiva vê pirsê were dayîn: **Dewlet dê bibe dewleteke çawa?** Ew dê bibe dewleteke sînordarkirî yan nesînordarkirî? Dê çi organên dewletê hebin û destûrmendîyên wan û tekilîyên wan ên navxweyî dê çawa bin? Dewlet dê hesabê bide hevwelatîyên xwe yan na? Di hilbijartin û tayînkirina wan kesan de, ku deshilatdarîya dewletê bi kar tînin, hevwelatî dê bikaribin çiqas beşdar bibin?

Tê gotin ku sê madeyên pêşîn ên destûra heyî nabe ku werin guhertin û pêşnîyarkirina guhertina wan jî ne guncan e. Paşê jî tê îdîa kirin ku dê destûreke nû were çêkirin. Ev herdu nakok in, li hev nakin. Heger "destûreke nû" were çêkirin, wê demê divê her tişt werin gotûbêj kirin û tê de tiştên nû hebin. Ji xwe, nîqaşkirina hin madeyan îlehîm nayê wê maneyê ku ew dê yekser werin rakirin. Dibe ku made wekî xwe bimînin, hin madeyên bi guhertinên qismî her bimînin. Lê belê heger hîna di serî de were gotin ku *"xetên me yên sor hene, em nahêlin ku werin derbas kirin"* di destpêkê de tê wateya seqetkirina wî karî. Di vî warî de tiştê ku **Thomas Paine** gotiye hêjayî bibîranînê ye. Ew dibêje: *"Heger di destûrê de hin madeyên naguherbar werin danîn, ev yek tê wateya hikûmkirina mirîyan a li ser zindîyan"*. An ku prensîp, nirx û sazîyek, ku ji bo nifşekê girîng û hewce ne, dibe ku ji bo nifşeke din ewqas girîng nebe. Heger dem û cihê wê hat, divê guncan be ku hemû feraset û helwêst bikaribin werin berpirs kirin.

### 5. Têgih û nirxên subjektîf û meseleyên etnîk

Destûra 1982yê neteweya tirk ji xwe re dike bingeh û miletên din, ku li Tirkîyeyê dijîn, tune dihesibîne û dewleteke weha nîşan dide ku pirsgirêk û rastîyên civakî yên Tirkîyeyê di asta destûrê de înkar dike û 'piştgirîyeke neteweyî' ferz dike ku nasname, ziman û çandên cuda bi zorê li cem hev radigire. Ew têgihên ku ji alîyê mîmarên darbeya leşkerî ve gelek caran tên serî lê dan û wateyên din li wan tên bar kirin, wekî îdeolojîya dewletê di destûrê de tên cih dan. Lê belê cihê vê yekê di demokrasî û azadîyan de nîne.

Tê gotin ku ew têgihên ***'tirk'*** û ***'tirkîtî'***yê ku di destûrê de tên bi kar anîn eslekî etnîkî yê nîjadekê nîşan nade û eslê wan ê etnîkî, ziman û olên wan çi dibin bila bibin, her kesê ku bi benda hevwelatîyê bi Komara Tirkîyeyê girêdayî be, dikeve bergeha tirkîtîyê. Muteberîya van gotin û îdîayan di warê huqûqa objektîf, zanistî û gerdûnî de nîne. A rast ew e ku eslekî etnîkî an ku tirkîtî li ser eslekî din an ku kurdan û nemusulmanan bi dara zorê tê ferz kirin. Ji ber ku damezirînerên komarê di şert û mercên wê demê de **"pirrengî" û "cudarengî" wekî sedemên qels û lawazbûnê dîtine û da ku dewlet aram û hêzdar be, wan li gor feraseta wê demê doza 'yekrengî' û 'yekgirtin'ê kiriye.** Ji ber ku hîna jî ji piştgirîya vê rewşê tê kirin û di serî de di destûr û qanûnan de hîna jî meşandina vê yekê, ji anakoronîzmayê pêvetir ne tiştek e.

Pêşeka destûrê jî tê de, di hemû destûrê de nasnameya etnîkî ya tirkîtîyê bi gotinên wekî ***'niştiman û neteweya tirk'***, ***'dewleta pîroz a tirk'***, ***'neteweya tirk'***, ***'civaka tirk'***, ***'her tirkek'***, ***'hevwelatîye tirk'***, ***'zimanê tirkî***, ***'çanda tirkî'***, ***'dîroka tirkî'*** tê binxêz kirin. Zimanê destûrê bi struktûra pirrengî ya Tirkîyeyê, ku ji komên cuda yên etnîk pêk tê, li hev nake. Ji ber vê yekê di destûra nû de nabe ku nasnameyeke etnîkî weha were binxêz kirin. Gotina *'neteweya tirk'*, ku him di gelek madeyên destûrê de, him jî di gelek qanûnan de tê bi kar anîn, dikare bi gotina *'hevwelatîyên Komara Tirkîyeyê'* were pevguhertin.

Feraseta xelet a sebaret bi struktûra etnîk, di warê **bawerî** û hin mijarên din de jî derbas bûn. Di warê teşegirtina feraseta awayê tirk a sekularîzmê û di warê cihgirtina wê ya di destûrê de sê faktorên sereke hene: Ev 1) Li derve hiştina olê ya ji jîyana giştî/civakî. 2) Di warê avakirina nasnameya hevwelatîbûnê de pejirandin û bikaranîna olê wekî unsûreke girîng. 3) Kontrola dewletê ya li ser bawerîya olî û qada olî. Di warê lidervehiştina olê ya ji qada giştî de, di destûrê de ev gotin hene: "Wekî yek ji pêdivîyên prensîpa sekularîzmê, nabe ku hestên pîroz ên olî bi kar û barên dewletî û bi siyasetê re werin tevlihev kirin." Him dixwazin elewîyan bikin sunnî û him jî dixwazin sunnîyan bi dara sekularîzmê kedî bikin. Da ku ev wêneya homojenkirinê were temam kirin jî yên ne-musulman jî yan hatine mişext kirin, yan jî bi giştî hatine pişavtin.
Destûra darbeya 12ê îlonê çarçove û bingeha destûrî û qanûnî ya vê ferasetê pêk anî. Divê êdî dev ji vê ferasetê were berdan.

### 6. Pêwîstîyên civaka demokratîk çi ne?

Seretayî, wekî ku di destûrên civakên demokratîk de tê dîtin, dema ku pêşekîya destûrê tê nivîsandin divê bi hin qaîdeyan were kirin. Pêşekî divê kin û kurtencam be; divê gotinên weha nebin; divê ku hin alîyên civakê li der ve nehêle, ku di nav wan cudagerîyê neke û wan piçûk nexe. Divê tê de gotinên weha hebin ku struktûra pirçandî, piretnîsîteyî, pirolî nas dikin û wan wekî dewlemendîyê dibînin. Divê tê de îdeolojî referans neyê girtin; şexsek, sazîyek û nirxek wekî pîroz neyê bi nav kirin û dilsozîyek wekî şert neyê danîn, lê bi tenê dilsozîya dewletê ji bo nirxên gerdûnî yên pirrengî, demokrasî, mafên mirovan, dewleta huqûqê werin pejirandin.

Wekî mînak destpêka destûrê dikare weha were guherandin: *"Em hevwelatîyên Komara Tirkîyeyê, di esasê maf û azadîyên gerdûnî de ku ji bo herkesî ne, her cure cudagerîyê red dikin, hemû cudahîyan nas dikin û wan wekî dewlemendîyeke çandî û demokratîk dipejirînin, îdela hevpar a gerdûnî par ve dikin û vê yekê wekî berpirsîyarî dibînin ku di aştîya cîhanî de tevkarîyê bikin;da ku demokrasîyekê li ser esasa mafên mirovan, desthilatdarîya huqûqê, azadî û yeksanîyê ye û jîyaneke serbilind, ku heysîyeta mirovan bi hev dike, ji xwe re kiriye armanc, damezirînin û vê destûrê wekî nîşaneya vîna me ya ji hevjîyanekê qebûl û piştrast dikin".*

### 7. Encam

Tirkîye niha di pêvajoyeke girîng re derbas dibe. Tiştê ku vê serdemê dîyar bike dê têkoşîna guhertinperwer û statukoperweran be. Heger guhertinhez di vê têkoşînê de bi ser kevin û van pirsgirêkan, ku bi ser hev de kom bûne, bi ferasetekedemokratîk û azadîxwaz çareser bikin, Tirkîye dikare di nav 5-10 salan de bibe yek ji demokrasîyên bijarte yên herêma xwe. Di rewşeke berevajî de Tirkîye dê bikeve kûrahîyên cîhana sêyem, ku tê de hemû pirsgirêk berdewam in û kevneperestî heye. Fetiloka sereke ya vê serdemê jî destûreke nû ye. Meclisa nû, ku rêjeya wê ya beşdarî û temsîlîyetê bilind e, divê bi van berpirsîyarîyan tev bigere û hemû alîyan di vê pêvajoyê de beşdar bike û destûreke nû çêbike, ku bersiva pêdivîyên Tirkîyeyê bide û pirgirêkên wê çareser bike. Yan na, ew dê bikevin bin webala hiştina mîrateke xerab ji bo nifşên dahatûyê.

Wergera ji tirkî: Celîl Kaya

www.arsivakurd.org


**Pelrecords hemû albumên Şivan Perwer ji nû ve çap dike!**

Her şeş albumên pêşîn ên Şivan Perwer di nêzîk de




* Ev çar album cara yekemîn wekî CD li Tirkîye û Kurdistanê derdikevin

**Ji Pelrecordsê albumeke nû:**
















*Navnîşanên xwestinê:*

*Tirkîye:*
Pelrecords Ltd.Şti.
Katip Mustafa Mah. Hasnun
Galip Sk. no:25 a/4
Beyoglu /Istanbul
Tel: (+90) 212 243 83 97
Fax: (+90) 212 244 24 83

*Ewropa:*
Pelrecords GmbH
Carnotstr. 4 10587 Berlin
Tel: (+49) 30 330 990 430
Fax: (+49) 30 330 990 439
Email: info@pelrecords.com

pelrecords
www.pelrecords.com

SINIFÊN NAVÎN DIKARIN ÇI BIKIN?

# Di navbera serîtewandin û serhildanê de

DOMINIQUE PINSOLLE *

**Hem desthilatdarîya li Parîsê, hem ya li Pekîn, Moskova û Washingtonê qedrê tebeqeyên navîn zêde digirin; wan li navenda tevahîya stratejîya siyasî datînin. Di demên krîzê de ew di navbera piştgirîya sinifên gel û hevgirtina bûrjûwazîya bilind de diçe û tê. Dirûvê vê koma ne bi rêkûpêk a sînorên wê şêlû bi awayekî radîkal guherî: Di texeyula civakî de milkdarên piçûk ên xwedîyên asoyên tengok şûna xwe ji xwedîyên dîplomayan ên heyranên Înternetê yên ciwan re hiştiye. Ji Yekîtîya Gel a şîlîyî a destpêka salên 1970yê, heta bi seferberîyên li dijî Vladîmîr Pûtîn, ji têkoşînên dijkolonyal, heta bi raperînên erebî, kîjan hevgirtin kamil nebûn, da ku projeyên pêşverûyan hilgirin? Û ev veguherînên van komên li kevîyan ên di navberê de dema ku weke li Çînê hilkişîneke bi lez, yan jî berevajîyê wê weke li Spanyayê bi awayekî dijwar daketina qonaxa sinifa jêrtir pêk tên, çi digirin nav xwe?**

Wê kêlîya ku bang li fransîyan hat kirin, *herin dengên xwe bi kar bînin,* hebûna hevgirtineke çînên gelêrî û çînên navîn ji bo beşeke mezin a çepgiran teqez xuya dikir, ku heyran û alîgirê "bereyekê" ye ku li gor hestîyarîyên koman hez dike xwe weke "dij-sarkozy", "dij-lîberal" yan jî hema weke "çep" bibîne. Lê belê nebûna ponijîn û hizra taktîk a kûr rastîyeke dîrokî vedişêre: Encama koalîsyonên bi vî rengî devjêberdana ji projeyên veguherîna civakî ye heta ji yên herî bipêşketî jî. Feydeya van koalîsyonan para bêhtir li reforman dibe ku bi tenê destûra pêşketinên sînordar didin. Ji ber vê pêdivî bi vegera li hejmareke dîyar a tecrûbe û ezmûnên siyasî heye da ku were dîyar kirin ka mirov bi kîjan şert û mercan dikare hevgirtineke bi vî rengî bide pêşîya xwe.

Di dema şoreşa fransî de daxwaza dawîlêanîna li rejîma kevin di destpêkê de çîn û tebeqeyên civakî yên pir heterojen tîne cem hev. Di bin zexta gel de û ji ber tehlûkeya kaos û alozîyê, nûnerên kategorîyên herî zêde xwedî îmtiyaz şeva 4ê tebaxê serî hildidin. Ev şoreş bidestxistina desthilatdarîyê ya kategorîyên civakî yên bi tevahî ji hev cuda bi leztir dike. Ev kategorî û tebeqeyên civakî yên ku di navbera esîlan û gundîyan de ne, ji hev cuda ne û para bêhtir ji bilî xwedîtîya sermayeyeke piçûk û asteke dîyar a perwerdeyê pêve tu tiştê wan a wekhev nîne: Muteşebis, firoşkar, tucar, xwedîyên erdên piçûk yan jî xwedîmilk, parêzer, bijîşk, xwende, dadger û dozger... Qonaxa radîkalbûna şoreşê di navbera 1792 û 1794ê de bi reaksîyona thermîdorî [tevgera parlementerên Meclîsa Neteweyî ya dema şoreşa fransî ye ku Robespierre ji text xistin û ew îdam kirin; nota wergêr] qut bû. Vê tevgerê cîh ji rejîmekê re vekir ku tê de "bûrjûwazîya mezin" (bankevan, pîşesazên mezin, karmendên dewletê yên payebilind...) dikarîn weke çîna nû ya serdest bi çirisîn derkevin holê -bi şoreşa 1830ê re-, vê yekê statuya arîstokrasîyê kêm û xirab dikir.

Di vê nîzama civakî de û di bin tesîra pîşesazîbûnê de, hejmara endamên proleteryayê her zêde dibû. Şert û mercên jîyanê yên vê çîna karker a nû peyda dibû "pirseke civakî" ya nû derdixist holê ku xwe di dema pêlên şoreşgerî yên sala 1848ê de ferz dikir. Berevajî ya sala 1789ê hingê monarşî li Fransayê bûrjûwa û "lîberal" bû. Dîsa jî yên ku qral, tevî karker û xwendekarên parîsî dan erdê endamên bûrjûwazîya piçûk bûn û bi vê jî rê 24ê Sibata 1830ê li ber Danezana Komara Duyem vekirin. Lê belê şoreşê zêde dewam nekir. Hilbijartinên 23 û 24ê nîsanê ku tê de mafê mêran bi giştî hebû deng bidin, serketina lîberalan li dijî şoreşgeran derxist pêş. Wan jî 15ê gulanê di bin bandora **Armand Barbès** û **Auguste Blanqui** de hewl da bêencam bi darê zorê Meclîsa Avaker bixin destê xwe. Paşê atolyeyên neteweyî (armanca wan ew bû kar bidin bêkaran) hatin girtin û vê yekê agir berda barûdê û raperîna Rojhilatê Parîsê gij kir: 23, 24 û 25ê hezîranê paytexta Fransayê dika şerên tirsnak e ku di encama wê de bi hezaran serhildêr ji alîyê desthilatdarîya nû ya komarparêz ve hatin qetil kirin. (1) Komara ku mafê dengdana giştî ji bo mêran pêk anî û dawî li koledarîyê anî; wê demokratîk bûya, lê belê wê ne civakparêz bûya.

Çi di çarçoveyên siyasî û çi jî di yên civakî yên bi tevahî ji hev cuda de hin alîyên vê dînamîka şoreşger mirov li derveyî Fransayê jî dibîne. Li welatên ku li wan hê mutleqparêzî serdest e, yên di bin hukmê bîyanîyan de ne û/yan jî yên bi pirsgirêka neteweyî re rûbirû ne (Almanya, Îtalya, Polonya, Macaristan...), tebeqeyên civakî yên ji hev pir cuda doz û daxwazên xwe yên lîberal û neteweyî bi pêş dixin. Di vê navê de bi lez û bez xeteke pir zirav a jihevqutbûnê tebeqeyên nerm û yên radîkal ji hev cihê dike. Tebeqeyên nerm bi reformên siyasî razî ne, belê yên radîkal bi xwe herweha doza tedbîrên civakî jî dikin.

Li tevahîya Ewropayê, pêşdîtina ku **Camillo Cavour** lîderê paşerojê yê ***Pîêmont***ê û hosteyê yekîtîya Îtalyayê, sala 1846ê kiribû, piştrast dibû: "*Heke nîzama civakî bi rastî bikeve tehlûkeyê, heke prensîpên mezin ên ku ew xwe disipêre wan bi rîskên ciddî re rûbirû bibe, hem muxalifên herî biryardar, hem komarparêzên herî dildar, em hemû pê bawer in ku wê bibin yên pêşî yên ku wê di nav refên partîya muhafezekar de cihê xwe bigirin.*" (2) Li alîyê din têkçûna Bihara Gelan - tevahîya rejîmên hilweşandî ji bilî Fransayê di nav salekê de jinûve hatin avakirin- nê nîşana vegera statukoyê ye: Heke bûrjûwazî ketibe nav refên "partîya nîzamê" ku hevgirtina konjukturel û heterojen a sala 1848ê (zeneatkarên pîşeyên ji rêûresmê, karmendên sektorên hê ne pîşesazî kirî, karker, xwendekar, bûrjûwazîya piçûk a dikandar û întelektuel...) li ser birêveberan bi awayekî mayînde û dîyarker ferz kirin ku dev ji têgeha pêkanîna desthilatdarîyê berdin ya ku daxwazên gel dûrîçav û mucered dikirin.

### Marks û Engels: Proleter berî ku hevgirtinan bi çînên din re bikin, divê ew bixwe bibin hêzeke siyasî ya serbixwe

Pêla sala 1848ê wekî din kir ku li ser stratejîya tevgera karker a ku hê di destpêkên xwe de bist bûye, divê qebûl bike, gelek şoreşger bihizirin. Marks û Engels ên ku heman salê *Manîfestoya Partîya Komunîst* weşandin û tevlî raperînan bûn, dema ev kirin jî gihiştin wê encamê ku proleterya divê ji xwe pêve pişta xwe bi tişt, yan jî kesekî din rast nekin. Marks wekî din li bûrjûwazîya fransî eşkere dike: "*Xwişk û biratîyê bi tenê heta ku berjewendîyên bûrjûwazî û ya şoreşgerîyê hevpar bûn,* (...) *ji gelek şoreşên bûrjûwazîya fransî yên ji 1789ê û vir ve kirî yek bi tenê jî ne derbeke li dijî Nîzamê bû, lewma tevî guhertinên pir diqewimîn ên awayê siyasî yê vê serwerîyê û vê koletîyê jî hemûyan hebûna serwerîya çînê, koletîya karkeran, nîzama bûrjûwa diparast. Hezîranê destê xwe da vê nîzamê. Xwelî li serê Hezîranê!*" (3) Bi wan weha bû bûrjûwazîya piçûk bi xwe jî tu berjewendîya wê nîne ku bi awayekî ku bi kêrî şoreşgeran were, civakê serûbinî hev bike. Encama ku herdu nivîskarên manîfestoyê digihîjinê hêsan e: Proleter berîya ku hevgirtinan çêbike, divê bi xwe ji xwe hêzeke siyasî ya serbixwe ava bike.

Li Almanyayê **Karl Kautsky** ber bi dawîya sedsala 19ê ve hizira Marks û Engels bi pêş ve dibe, dema vê dike bilindbûna giştî ya asta perwerdeyê û xwedîhêzbûna pîşeyên întelektuel (bijîşk, parêzer, dadger, mamoste, muhendis, karmend û hwd.) li ber çavan digire. Ev *Întellugenz* (ev peyva bi almanî nikare bê wergerandin bo kurdî, kêm û zêde aqil îfade dike) ya ku di navbera bûrjûwazî û proleteryayê de ye, gelo dikare bibe hevgirêka sosyalîstan? Hêja ye pirs hê bêhtir were pirsîn, lewra beşek ji van tebeqeyên întellektuel di şert û mercên nêzî yên proleteryayê de dijî û dixebite (memûrên payenizm, karmendên piçûk û hwd.). **Kautsky** beramberî kategorîyeke civakî ya ku ew weke di cewherê xwe de korporatîst û reformîst dinirxîne, gelek gumanbir e û wisa difikire ku mirov dikare kevîyên proleterbûyî yên *Intelligenz*ê bixe nav refên sosyalîzmê, bi şertê ku çîna karker di qada siyasî de têra xwe bi hêz be da ku bikaribe fikrên xwe ferz bike. Heke wisa nebe, "*herdu alî wê nêzî hev bibin, lê belê ew ê nebin partîzanên reformên civakî yên ku li me vegerin, lê belê em ê biçin ber bi wan ve*". (4)

Çendekî paşê di "*Divê çi were kirin?*" de ya ku sala 1902ê çap bû, Lenîn ji partîyê amûreke bi îmtiyaz çêdike ji bo ku destûrê bide proleteryayê, xwe bike hêzeke şoreşger a xweser. Erê desthilatdarbûna bolşevîkan li Rûsyayê di çirîya pêşî ya sala 1917ê serketina taktîka lenînîst li welatekî ku hê pir kêm pîşesazbûyî ye piştrast dike, lê belê di heman demê de nemumkinbûna belavbûn û firehbûna şoreşa sosyalîst li Ewropaya mayî jî derdikeve holê. Hukûmeta sosyal demokrat a alman raperîna Berlînê ya çileyê 1919ê bi xwînrijîyê tepisand. "Komarên Konsey" yên Bavyera û Macaristanê heman salê hatin perçiqandin. Li Îtalyayê têkçûna tevgerên şoreşger di salên 1919-1920ê de kir ku **Antonio Gramsci** berîya ku têgeha "hegemonîya" întellektuel û çandî di salên 1930ê de teorîze bike, xwe nêzî modela partîya lenînîst bike: Ew digihişte vê encamê ku berîya hewldana bidestxistina desthilatdarîyê divê ji çîna karker were têgehên xwe, nirxên xwe û fikrên xwe yên siyasî ferz bike da ku razîbûna çînên civakî yên ku ew ê bi wan re hevgirtinê saz bike, misoger bike.

Li Fransayê pirsa hevgirtina çînan bi rengekî din tê pirsîn. Piştî dawîya salên 1920ê nîqaşeke xurt li ser helwêsta ku divê li hemberî bipêşketina çînên navîn çi be, wan dide ber xwe. Di nav Beşa Fransî ya Înternasyola Karkeran (SFIO), **Mercel Déat** bi xwe difikire ku çînên navîn veguherîne hevgirên xwezayî yên çîna karker, lewra cotkarên xwedî erdên xwe, zeneetkar, tucar, memûr, heta pîşesazên piçûk jî êdî bi tehlûkeya kapîtalîzma fînansê re rûbirû ne. Dema ev dikir, pêwîstîyeke bi peymanekê hêdî hêdî derxist pêş, peymaneke di navbera çîna karker a heterojen û rewşa wê xirab dibe û tebeqeyên navîn ên geş bi pêş dikevin; herweha pêwîstîya bi jinûvedîyarkirina rola dewletê, ya ku êdî nema dikare weke amûreke di xizmeta çîneke bi tenê de were qebûl kirin jî derxist pêş. (5) Déat populerbûna faşîzmê analîz dike û îdîa dike ku sosyalîst divê êdî pesnê "*jinûve avakirina dewletê*" û "*parastina neteweyê*" bidin, lewra li gor wî ev hêvîya çînên navîn e. **Léon Blum** bersivê didiyê bi têkelhevdîtina neososyalîzm û faşîzmê û ew vê fikra xwe weha rave dike: "*Min jê guman dikirin ku bi vî rengî me sosyalîzm veguherandibe, partîya çînê veguherandibe partîyeke ji çînan hatî şuştin. Min jê guman dikirin ku dema me weke faşîzmê bi komeke girseyên tevlîhevkirî dewam kiribe, me weke wê bang li tevahîya şêwazên bêsebrîyê, êşê, çavbirçîbûnê kiribe, me çalakîya çîna Partîya Sosyalîst di bin vê pêla "maceraperest" de nehiştibe* (...) *ya ku dor bi dor tevahîya dîktatorîyên dîrokê hilgirtine*". (6)

### Berjewendîyên çînên navîn û tebeqeyên gel li dij hev in?

Çawa ku dîrokzan **Serge Berstein** binê wê xêz kir, tevî ku 'yên neo" ji SFIOyê hatin derxistin jî sala 1933ê, tirsa ku "yên ji çînan kirî" yên ku **Blum** ew pir piçûk dîtin, ber bi faşîzmê ve biçin, komunîst û sosyalîstên fransî mecbûr kirin ku wan weke hevgirên pêwîst bibînin. Partîya Komunîst a Fransî (PCF) a ku ji sala 1928ê ve bi taktîka xwe ya "çîna dijberê çînê" (sosyal-demokrasîya bûrjûwa, weke dijminê sereke yê ku divê şerê wî were kirin, dihat dîtin), sala 1934ê li ser fermana Komîternê bi tevahî çerx kir: "*Li kêleka proleteran,* (...) *em dixwazin çînên navîn ber bi xwe ve bikişînin, wan ji demogojîya faşîzmê xilas bikin.* (...) *Divê em parastina her daxwaza çînên navîn bikin destê xwe, heke ev daxwaz ne li dijî berjewendîyên proleteryayê bin.*" Ev çîn jî di serî de mûçegir, memûr, dikandarên piçûk, zeneetkar û cotkar in.

Vê çerxkirinê, ya ku çardeh salan piştî jihevqutbûna di Kongreya Toursê de sala 1920ê pêk hatî, di navbera SFIO û PCFyê de yekîtîyeke çalakîyan pêkan kir. Di çirîya pêşî ya 1934ê de sekreterê giştî yê PCFyê **Maurice Thorez** pêşnîyar dike ku civîna dijfaşîst were fireh kirin ber bi hêzên nû yên siyasî û civakî û "*hevgirtina çînên navîn bi çîna karker re*" mohr bikin. Maneya vê jî ew e ku destê xwe yê hevgirtinê dirêjî Partîya Radîkal, Komiteya Hişyarîya Întelektuel a Dij-Faşîst, Lîga Mafê Mirovan bikin. Berevajî SFIOyê komunîst dixwazin bi tenê yek Meclîsa Gel hebe û bernameyeke bi rastî ya hevpar bi xwe naxwazin, lewra li gor fikra wan pêkan bû ku hin pêşnîyarên zêde radîkal (ofîsên gelemperî yên çandinîyê, şirketên petixî bi din destekî bawerî pê were, yan jî sosyalîzasyon) çînên navîn bitirsînin.

Em bi dewama wê dizanin: Bereya Gel di hilbijartinên sala 1936ê de bi ser dikeve. Heta bi baskê rastê yê Partîya Radîkal bûn yek da ku di wê hukûmetê de ku **Blum** ew bi rê ve dibir, bi awir û armanca parastina çînên navîn beşdar bibin. Lê belê hevgirtin dewam nake. Grevên mezin ên hezîrana 1936ê kir ku çîna karker maf û tedbîran (betlaneya bi mûçe, hefteyê çil saet kar) bi dest bixe ku li ser bernameya Bereya Gel nebûn. Dikandarên piçûk û pîşesazên ku bi hêvîya ku dawîyê li krîzê bîne para bêhtir dengê xwe dabûn Bereya Gel gazin ji van tawîzên dayî çalakgerên grevan kirin, argumana wan jî ew bû ku tehlûke heye kêmkirina dema kar û zêdekirina mûçeyan înflasyonê zêde bike. Li ***Grenoble***ê ketina meriyetê ya hefteyê çil saet karî bû



İSMAİL ÇOBAN: **Dîmenên mirovan II**, boyaxa rûnî li ser tuwalê, 120 x 100 cm

sedema xwepêşandanên dikandar û zeneetkaran.

Komunîstan fikar kirin û bi bîra Blum xist ku Bereya Gel divê "*milkîyeta piçûk li dijî du sed malbatan biparêze*"; wan ew gunehbar dikir ku pir zêde hêsan xwe li proleterkirina çînên navîn berdaye. Lîderê baskê şoreşger ê SFIOyê **Marceau Pivert** ê ku grevan kela canê wî rakirî, di gotareke di *Populaire* a 27ê gulana 1936ê de da zanîn ku êdî hertişt pêkan e û şoreş êdî mijara rojevê ye. 11ê hezîranê Thorez bersiva wî da û got "*her tişt niha ne pêkan e*" lewra armanca lipêşgirtî hê jî parastina "*lihevkirina girseyan*" e û buhayê wê çi dibe bila bibe pêşîgirtina li "*tecrîdkirna çîna karker*" e. (7)

Havîna sala 1936ê nerehetîya çînên navîn li seranserê welêt xwe dida der û di heman demê de di nav Bereya Gel de muxalefetek bi pêş diket. 23ê çileya 1937ê Blum di *Populaire*ê de vê tespîtê dike: "*Beşek ji çînên navîn û ji bûrjûwazîyê li defa hewarê dixin û dema hewldana bipêşketina civakî xwe bi xisleteke hevalbendî, yan jî zorê nîşan dide, li vegereke reaksîyona siyasî digerin*." Ji bo ku careke din bawerîya wan bi xwe bîne, serokê hukûmetê di sibatê de "navberekê" radigihîne. Çawa ku li Spanyayê desttênewerdan hat nirxandin, ev "navber" jî weke paşvegavavêtinê hat nirxandin. Bereya Gel demeke dirêj xwe li ber vê negirt.

## Li Şîlîyê Allende, li Fransayê Mitterand

Heke em tedbîrên di çarçoveya îstîsnayî ya Azadbûnê de hatî girtin deynin alîyekî, divê em li benda salên "sor" ên dehsalên 1960 û 1970ê bimînin da ku pirsa hevgirtina di navbera çînên gel û çînên navîn de dîsa bibe rojev. Du bûyerên nimûne hene, çawa ku hedefên hilbijartinan ên demkurt hatin pêk anîn, hevgirtineke bi vî rengî bi kîjan zor û zehmetîyan re rûbirû dimîne, ev bûyer nîşan didin: Sala 1970ê hilbijartina **Salvador Allende** li Şîlîyê û sala 1981ê hilbijartina **François Mitterrand** li Fransayê.

## Bûrjûwazîya piçûk nirx dide otorîte, nîzam û dîsîplînê

Dawîya salên 1960ê Demokrasîya Xirîstîyan (DC) nûnerîya piranîya çînên navîn ên şîlîyî dike, baskê wan ê çepgir di hilbijartinan de bi radîkalan, Partîya Karkeran, Partîya Sosyalîst û Partîya Komunîst re bûn yek da ku di hilbijartinên serokdewletîyê yên sala 1970ê de destekê bidin namzedîya **Salvador Allende**. Allende di hilbijartinan de bi tenê bi rêjeyeke % 36.7ê bi ser ket û bi tenê çil hezar deng ji namzetê rastgir **Jorge Alessandri** bêhtir stendin. **Allende** pesnê şoreşeke qanûnî dida, rêz ji birêveçûna sazî û dezgehên demokratîk ên welatê xwe re digirt. Hukûmeta wî ya "Yekîtîya Gel" (UP) di cîh de bernameyeke qutbûna ji kapîtalîzmê xiste pratîkê: Îstîmlaqkirina sifir (dewlemendîya sereke ya neteweyî) bêyî ku tezmînatê bide şirketên amerîkî, bilezkirina reforma çandinîyê, xistina kontrola dewletê ya bankeyên mezin, sektorên kaxet û tekstîlê, yên kanên komirê û ya pîşesazîya hesin û pola û hwd.

Hingê UP bi gelek astengîyan re rûbirû dibe: Muxalefet di her du meclisên Parlemanê de piranî ye; çepê radîkal hukûmetê bi reformîzmê gunehbar dike; Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê ji bo Allende bide erdê dikeve nav liv û tevgerê... Tevî her tiştî ji UPê hat ku bingeha xwe ya dengdaran mezintir bike û qederê %44ê dengan di hilbijartinên parlemanê yên adara 1973ê de bi dest bixe, lê belê dîsa jî di parlemanê de piranîyê bi dest naxe. Ji bilî desteka karkeran, desteka beşeke mezin a memûran, zeneetkaran û pîşeyên serbest di sê salên desthilatdarîya Allende de xwe biryardar îsbat kir. Komunîstê şîlîyî **José Cademartori Invernizzi** (parlemanter û di 1973ê de wezîrê aborîyê) dibêje, rewş gihiştibû wê radeyê ku armanca dijberên UPê ew bû ku "*çînên navîn bikin dijberê Yekîtîya Gel*". (8) Livûtevgera civakî ya zêde dibû, înflasyona aborîyê bêîstîqrar dike, desteka ji hukûmetê re kêm dike, nexasim jî li cem hin mûçegirên dewletê û patronên piçûk. Ji bo ku sûdê ji vê nerazîbûnê bigire, DC doza hilbijartinên nû dike. Ew bêyî ku tiştekî bi ser bixe, hewl dide serokdewlet ji wezîfeyê dûr bixe, bi vê yekê jî rê li ber darbeyeke eskerî vedike. 11ê îlona 1973ê general **Augusto Pinochet** hukûmeta UPê dide erdê û dawîyê li vê ezmûna şoreşê ya pasîfîk tîne. Berevajî hêvîyên DCê bi desteka Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê û bûrjûwazîya mezin **Pinochet** demeke dirêj li desthilatdarîyê cihê xwe zexm dike, bi vî rengî ew herweha hêvîyên nobetguherîneke reformîsttir jî pûç dike.

Hinekê weke sekreterê giştî yê Partîya Sosyalîst a şîlîyî **Carlos Altamirano** di têkçûna UPê de delîla muhafezekarîya çînên navîn dîtin. Ew weha dinivîse, li şûna ku mirov "*ezperestîya wan gij bike û daxwazên wan ên madî* [hêza kirînê, rêjeyên faîzê, bac, ewlekarîya civakî, mûçe, rêya çûna zanîngehê …] *têr bike*" divê wan "*di nav projeyeke mezin a armanca wê guhertina jîyanê ye*" bi cih bike û wan bixe bin "*otorîteyeke bi rastî û bitesîr*", lewma "*bûrjûwazîya piçûk xwe di ser her pêkanîna otorîteyê, nîzamê û disîplînê re dibîne*". (9)

## Komên civakî yên muhafezekar, dikarin veguherin hêzên tevgerê

Heke analîzeke bi vî rengî wisa qebûl bike ku girêdana çînên navîn bi nîzama heyî re asoyekî mirov nikare jê bibihure pêk tîne, hingê ew wê tehlûkeyê bi xwe re tîne ku mirov bikeve nav determînîzma civakî. Çawa ku 1789ê jî pêk hat, dîrok nîşan dide ku komên civakî yên ku em difikirin kêm meyildarên guhertinê ne dikarin di bin hin şert û mercan de xwe biguherînin hêzên tevgerê. Û berevajîya vê jî bi tevahî rast e: Çînên gel ên ku ji ber helwêsta xwe ya civakî dûrî şoreşgerbûnê ne carinan vediguherin eskerên partîya nîzamê. Bi vî rengî hem xwişkûbirabûneke bi rastî ya di navbera xwendekaran û karkeran de (10) û hem jî jihevqutbûn û dûrbûna di navbera daxwazên parçeyekî bûrjûwazîya piçûk a xwendekar û yên karkerên grevîst de xisleta bûyerên gulana 1968ê li Fransayê dîyar dikin. Em roja 17ê gulanê şahidîyê li bûyerekê dikin: Xwendekarên bi kortejê dimeşin, tên bi karkerên grevê dikin ên Renault-Billancourtê re bibin yek, ji ber derîyên girtî yên fabrîkeyê vedigerin.

Çînên navîn timî muhafezekar nebûn, proleterya jî ileh pêşverû nebû, ya dîyarker û girîng ew e mirov bi nirxê wê zanibe ka di bin kîjan şert û mercan de projeyeke veguherîna radîkal a civakê îhtîmal dibe ku du komên civakî yên bi hejmar piranî ne, lê belê berjewendîyên wan dikarin hev negirin, bike yek. Bernameya hevgirtî ya hukûmetê ya çepê fransî ya hezîrana 1972ê hatî mohr kirin hewlê dide ji heqê vê zehmetîyê derkeve. Di çarçoveyeke mezinbûna girseyî ya mamosteyên perwerdeya navîn û pîşeyên navberkar ên sektora dewletê de, ***Partîya Sosyalîst*** (PS) li ***Kongreya Epina***yê sala 1971ê hat damezirandin. Ew pesnê yekîtîya çalakîyan bi PCFê re dide. PCF jî îlham ji serketinên hevrêyên xwe yên îtalî girtibû û dest pê dikir ji nû ve elaqe nîşanî çarenûsa çînên navîn bide. **Mitterand** li alîyê xwe pê dizane ku divê ew hîmê xwe yê milîtan û hilbijêr yê perwerdeyê berfireh bike, yê ku wî hê nû bi xêra hevgirtineke şert û mercên derdorê bi dest xistî. Dema xwe ji "maleke kevin" SFIOya kurmî ya ku di hilbijartinên serokkomarîyê yên hezîrana 1969ê de derba paşveketineke dîrokî (% 5ê dengan) xwaribû qut dike, ew hewlê dide tebeqeyên nû yên navîn ên mûçegir ên ku hingê pir mezin dibûn, ber bi xwe ve bikişîne. Ji bo ku paştir bigihêje armanca xwe ew li ser hesabê xwe ji nû ve radihêje beşekê ji mîrateya gulana 68ê, nexasim jî li ser mijara lîberalkirina adetan û ya çandê. Li ser vê qadê rê ewqasî bêhtir vala û vekiriye ku PCFa fikaran dike ku dînamîka yekîtîyê di warê hilbijêran de bêhtir bi kêrî hevalbendê wê tê, her diçe bêhtir li dîskûrsa xwe ya karkerî vedigere. Bi ser nakeve. Hevnegirtin sala 1977ê bi betalkirina bernameya hevpar re eşkere xuya dike; ji hingê û şûn ve herdu partîyên çep dibin dijberên hev.

## Mitterand û soza qutbûna ji kapîtalîzmê

Çar salan paşê, Mitterand dîsa jî weke serokê komarê hat hilbijartin. Wî soza "*qutbûna ji kapîtalîzmê*" da û ji bo ku vê pêk bîne jî soza "*hevgirtina çînê ya zexm*" da (11), a ku em wekî din di dema hilbijartinên 10ê gulana 1981ê de dibînin. "Vegera hişkbûnê" ya sala 1983yê hate bi rê ve birin (cemidandina mûçeyan; ji nû ve avakirinên pêşesazî yên girseyî) divê weke çendemîn xiyaneta nûnerên siyasî yên çînên navîn li hevgirên wan ên karker were dîtin? Ev awira li tiştan a ku dikare argumana girtina civakî ji destên birêveberên sosyalîst bigire, wê derdor û çarçoveya navneteweyî û îdeolojîk yên ji pêla muhafezekar peyda bûyî ji bîr bike: **Margaret Thatcher** û **Ronald Reagan** berîya demeke kurt li Meliktîya Yekbûyî û li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê hatibûn hilbijartin; "fîlozofên nû" ser dika medyatîk a fransî tijî dikin. Ji sala 1982ê û pêve memûrên payebilind girîngîyeke dîyarker di jinûve terîfkirina stratejîya sosyalîst de bi dest dixin, tevî ku birêveber ne di bin zexteke bi rastî ya sendîkayî û gel de bû. Her tişt hingê wisa qewimî weke ku sosyalîstên li desthilatdarîyê pira di navbera dewletê û civakê de ku partîya wan nûnerîya wê dikir, pir bi lez hilanîn, "*bi vî awayî ji hevgirên xwe yên reel, yan jî muhtemel re tercîheke sînordar di navbera dorgirtina li keleyê, yan jî vekişînê hiştin*". (12) Di van şertan de îdeolojîya lîberal a li her deverên din a cîhana rojava mode ne, mumkin kir ku zehmetîyên hukûmeta nû zûzûka weke encama lihevnekirineke doktrîna sosyalîst bi rastîyên cîhana nû re bên şirove kirin.

Tevî ku cihêrengîya rewşan, astengên li pêşîya di navbera çînên gel û çînên navîn de weke xwe man jî. Tirsa ku projeyên ew weke gelekî radîkal -ango weke mînak îhtîmal e milkiyeta taybet yan jî nirxê danehevê bixin tehlûkeyê- dibînin, li cem çînên navîn peyda dike, dîyar e daneyek e ku naguhere. Bi her halî, nexasim jî di demên krîzên pir bi şid de tirsa ji çînê şuştinê ya ku sîstema heyî li hemberî wê lawaz xuya dike (dema ew bi xwe yekser ne mîmara wê ye) bi kêrî hevgirtin, yan jî hatinên cem hev ên li dora armancên "selameta dewletê" tê. Ji derseke realîzma hinekî mirovan bêhêvî dike û wêde, lêkolîna tecrûbeyên rabihurîyê hejmarek kilîdan dabîn dike ku destûrê didin dîyarkirina şertên biserketina hevgirtineke bi vî rengî, çi civakî bin (civakeke nisbî ya berjewendîyên aborî) çi jî siyasî bin (têkilîyeke hêzan a bi kêrî çînên gel tê). Bi rengekî nakokane hişkbûna newekhevîyan, xirabûna cihguhertina civakî, xisleta her diçe bêhtir hindikahî ya elîtên dewletan kontrol dikin bêyî ku serê xwe ji çarenûsa gelan biêşînin, dikarin bi kêrî yekîtîyeke berjewendîyan bên ku pirî caran dîrok kirine tehlûkeyê.

* Dîrokzan, nivîskarê *Le Matin (1884-1944). Une presse d'argent et de chantage / Le Matin (1884-1944). Çapemeniîyeke Pereyan û Şantajê*, Presses universitaires de Rennes, 2012.


1 Alain Garrigou, "1848, le printemps des peuples / 1848 Bihara Gelan", *Le Monde diplomatique,* gulana 2011ê

2 Eric J. Hobsbawm ji ber girtîye, *L'Ere du Capital / Serdema Sermayê*, Hachette, Parîs, 2002, rûpel 34

3 Karl Marx, *La Nouvelle Gazette Rhénane*, 29ê hezîrana 1848ê

4 Karl Kautsky, "Le socialisme et les carrières libérales / Sosyalîzm û Karîyerên Lîberal", *Le Devenir social,* hezîrana 1895ê, rûpel 269

5 Jean-Paul Cointet, *Marcel Déat : du socialisme au national-socialisme /Marcel Déat: Ji sosyalîzmê ber bi sosyalîzma neteweyî,* Perrin, Parîs, 1998

6 Serge Berstein ji ber girtiye, *Léon Blum,* Fayard, Parîs, 2006 (Analîzên der barê Bereya Gel û herweha jibergirtinên elaqedarî hukûmeta Blum ji vê pirtûkê hatine girtin)

7 Rapora Maurice Thorez li pêşberî Meclisa Komunîstên Herêma Parîsê, 1ê hezîrana 1936ê

8 José Cademartori Invernizzi, "Programme, succès et obstacles pendant l'Unité populaire / Di dema Yekîtîya Gel de bername, serketin û asteng", di Patricio Arnas, Rosa Gutierrez, Oscar Vallespir (koord.), *Salvador Allende. Un monde possible / Salvador Allende. Cîhaneke Mumkin*, Syllepse, Parîs, 2004, rûpel 41

9 Carlos Altamirano, *Chili : les raisons d'une défaite / Şîlî: Sedemên Têkçûnekê,* Flammarion, koleksîyona "La Rose au poing", Parîs, 1979, rûpel 67-68

10 Kristin Ross, *Mai 68 et ses vies ultérieures / Gulana 68ê û Jîyana piştî wê,* Agone-Le Monde diplomatique, Marseille-Parîs, 2010

11 *Projet socialiste pour la France des années 80 / Projeya Sosyalîst ji bo Fransaya Salên 80ê*, Club socialiste du livre, Parîs, 1981

12 Steven C. Lewis û Stanley Hoffmann bi hevkarîya George Ross Srenella Sferza: Ezmûna Mitterand, 'Li Fransaya nûjen guhertin û domdarî'. Presses universitaires de France, Paris, 1988, p. 148


Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

# Li welatên dinyaya sêyem mentiqekî din

ALAIN GRESH

Nîqaşa hevgirtinên navbera sinifa karkeran û "tebeqeyên navincî" li cîhana kolonîzekirî ya berî Şerê Cîhanê yê Yekem naşibe ya di sedsala XIX. ya Ewropayê. Sinifa karkeran li cîhana kolonîzekirî hema hema tuneye, sosyalîzma hê nû pêk tê û tevgerên berxwedana li dijî dagîrkerîya bîyanîyan ên ku bi piranî kadroyên dîndar, an jî ji rêûresmê wan bi rê ve dibin. Li Ewropayê pirî caran wekî "feodal" û "paşverû"yên dijberî pêşveçûnê û "medeniyet"ê tên danasîn, sosyalist jî vê yekê dikin.

Şerê Cîhanê yê Yekem û Şoreşa Bolşevîk a 1917ê dê her tişt biguheranda. Di Kongreya Yekem a Gelên Rojhilat de ku di îlona 1920ê de li Bakuyê pêk hat, nêzî du hezar delege civîyan: Ereb, kurd, tirk, hindî, faris û çînî. "*Tim dema me nebû ku em di mezinahîya bûyerên dîrokî yên ku em tevlî dibûn bigihêjin*" dibêje rêveberê komunîst **Grigori Zinoviev**. (…) *Gelên ku heya dema niha di cîhana kapîtalîstan de wekî garana heywanan dihatin hesibandin û ji wan re 'çîna jêrîn' dihat gotin, bûrjuwazîyê li ser hesabên wan rehet dikir, ji xwe piştrast bûn ku ev gel wê qet ji xweber şîyar nebin. Ev gel serî hildidin.*" Şiara ku Komunîsta Navneteweyî (KN) pesnê wê dide êdî ev e: "*Proleterên hemû welatan û gelên bindest, yek bin!*".

Lê wergera darîçav a vê şîarê ne ew qas hêsan e, giranîya hejmara karkeran di cîhana kolonîkirî de her kêm dimînin: Gelo divê komunîst bi **Mustafa Kemal** re ku rêveberê tirkan e û Peymana Versayê dixe ber lêpirsînê, îtifaqê bikin? Gelo divê Partîya Komunîst a Çînî peymanan bi Kuomintanga nasyonalîst re çêbike? Gelo divê li hemberî emperyalîzmê bi bûrjûwazîya neteweyî re peyman bê girêdan, an jî lihevhatinên wê lê werin eşkere kirin? KN ya ku her diçe li ser stratejîya dewletî ya Moskowê tê rêz kirin, dudil e, dişewişe, carinan ber bi çerxkirinên stratejîk ên hêjayî dîtinê ve gavê diavêje.

Piştî Şerê Cîhanê yê Duyem, li beşeke mezin a welatan ku hê ji wan re welatên dinya sêyem nayê gotin, ji pirsa civakî bêhtir, şerê antîkolonîyal e, ya ku nîqaşa li ser hevgirtinên polîtîk saz dike û piranîya xurt a nifûsê dike yek. Di çend rewşan de –Vîetnam û bi berfirehî Hîndoçîn, Çîn… -, komunîst serkêşîya tevgera antîkolonîyal dikin; dema vê dikin jî mane û neverokeke civakî a li ser bingeha reforma çandinîyê ya bi kêrî gundîyên feqîr tê, perwerdehî û tenduristîyê tê danîn, didin serxwebûnê. Li Hindistan û Endonezyayê ev bûrjûwazî ye ya ku rizgarîya neteweyî bi rê ve dibe, komunîst wekî hêza duyem dimînin û carinan tên tepisandin. Li cihekî din (Cezayîr, Misir, hwd.), hêzên neteweyî bi pesndayîna şoreşê û bi piştdayîna artêşê (lê teqez antîkomunîst) desthilatdarîyê bi dest dixin û reformên kûr jî didin dest pê kirin, bi taybetî jinûve bidestxistina dewlemendîya neteweyî û berfirehkirna xizmetên perwerdehî û tenduristîyê.

Nîv sedsal piştî serxwebûnan û tevî bi pêşveçûyîna welatên wekî Brezîlya û Afrîkaya Başûr, strukturên civakî ên welatên Başûrê kevin kêm dişibin yên "klasik" ên mîna Qralîyeta Yekbûyî ya nîvê duyem a sedsala XIX. a ku **Karl Marx** wê terîf dike. Sinifa karkeran li wir pir kêmejimar dimîne, karê nefermî sereke ye, hejmara tebeqeyên navîn weke hejmar pir zêdetir in, lê bi piranî feqîr dibin, dîsa tevî bajarbûyînê jî, nîvê nifûsê hê jî ji gundîyan pêk tê. Ji hêleke din ve, ev welat êdî bi awayê ku nema dikarin jê veqetin entegreyî bazara global a kapîtalîst bûne, ji salên 1970ê zêdetir girêdayî ne. Di vê çarçoveyê de, dê kîjan hevgirtin bikaribin mengeneya bazaran sist bikin û projeyeke civakî ya bêhtir li ser esasê wekhevîyê dîyar bikin? Wer xuya ye ku bersiva pirsê hê nehatiye dayîn.

Wergera ji fransî: Sevda Orak

# Vegera li "bihara erebî"

GILBERT ACHCAR *

Kî ne motorên raperînên erebî? Ji karkeran heta bi endamên pîşeyên serbest, her yek bi rolekî rabû, belê ev rol li gor welat diguherî.

Raperîna erebî, ya ku bi van protestoyan re ku li bajarê *Sîdî Buzîd* rû dan, dest pê kir, paşê xwekuştina ciwanê bi navê **Mohamed Bouazîzî**, roja 17ê kanûna 2010ê, fikireke weha piştrast dike: Di tevgereke gelêrî ya berfireh de, ya ku li dor muxalefeta dij rejîmeke heqxwar bi daxwaza guherîneke demokratîk dicive, piranîya sinifên navîn û sinifên bêpar ên civakê pirî caran hevkarîyê dikin. **Bouazîzî** dezgehdarekî xizan û perîşan bû û weha, mînakeke protestokarên "bihara erebî" dide girseyeke ku ji bi milyonan ciwan û neciwanan pêk tê, yên ku aîdên beşa nefermî –ya "bêkarên vêşartî" yên ku bi karên nanozikî debara xwe dikin, heta ku karekî ji xwe re bibînin– an jî aîdên koma bêkarên fermî ne. Li Tûnis û Misirê, hêzên rêkxistî yan nerêkxistî yên karkerên mûçegir jî tev li van girseyan bûn, lewre ku li her du welatan, tevgereke karkeran heye ku têkoşîna wê jî pêşengîya bihara erebî kiriye.

Li van welatan ku raperînên girseyî lê çêbûn (Bahreyn, Misir, Lîbya, Sûrîye, Tûnis û Yemen), piranîya sinifên navîn li ser vê enîya berfireh a sinifên bêpar ên civakê zêde bûn: Xebatkarên ferdî, çi kevneşopî (senetkar û dikandar), çi modern (pîşeyên lîberal, nemaze parêzer, muhendis û bijîşk û sinifên mûçegir ên têkildarên wan –mamosteyên zanîngehê, rojnamevan, memûr û xebatkarên beşên ticarî û finansî û patronên şirketên piçûk).

Li van deran ku rejîmê hewayekî terorê yê weha giran li ser xelkê ferz nekiribû ku her rengê protestoyê tê de weke qedexe xuya bike –yanî bi giranî li Tûnis û Misirê– di salên 2000ê de, zêdeyîyeke têkoşînên siyasî û civakî rê li ber tevgerên raperînê vekir. Li Misirê, sinifa karkeran bi taybetî çalak bû û di navbera 2006 û 2009ê de, pêla herî mezin a grevên karkeran ên dîroka xwe jîya, heta serîhildana 25ê çileya 2011ê. (1) Li Tûnisê, ev çalakî zêdetir girêdayî pirsgirêka bêkarî û xizmparêzîyê bûn, nemaze bi raperînên 2008ê re yên ku di herêma kangehî ya ***Gafsa***yê dest pê kiribûn. (2)

## Ji ber awayê pêkhatina wan, tebeqeyên navîn nexwedî helwêsteke homojen a siyasî ne

Li heman dehsalê, li van her du welatan parêzer û rojnamevanan jî çalakîyên cihê yên ji bo demokrasîyê pêk anîn. Ev pîşe bûne hilgirên pêşrew ên protestoyê, endamên wê jî bi rasterastî tev li têkoşînên siyasî bûn, wek mînak li nav tevgera misirî ***Kefaya*** (*Êdî Bes e*), ku ji bo demeke dirêj pêşengîya protestoya li dij karên nelirê yên hilbijartinê yên **Husnî Mubarak** û projeya wî ya amadekirina lawê wî ji bo ku şûna wî bigire, kir.

Her weha, ciwanên ku bi giranî ji sinifên navîn dihatin û bikarhênerên Înternetê bûn, pêşengîya protestoyên salên bihurî kir, wek blogvan (3) –yên ku, di çend welatên erebî de jî, bûne hedefa zordarîya dewletê– an jî, zêdetir rêkxistî, tevgera misirî ya ***Ciwanên 6ê nîsanê***, ku di serî de ji bo piştgirîya bi greva karkerên bajarê endustryel a Mahallah Al-Koubra re –bi taybetî yên tekstîlê– 2008ê hatibû damezirandin. Wekî din, ji Fasê heta Bahreyn, Misir û Sûriyeyê, sinifên navîn di nav her du sazûmanên rêxistinkirina raperînan de cihekî girîng digirin: Toreyên civakî û tevgerên siyasî. Di mehên pêşî de, bêguman dibe ku rola toreyên civakî hatibe mibalexe kirin –bi taybetî ji bo ku raperîn *Western friendly* (Dosta Rojava) bên nîşan dan –lê belê ew hê jî weke berê biryardar e. Li berevajî fikirên heyî, bikarhênerên Înternetê di sinifên xizan de jî hene, ew li malê, an jî li sîberkafeyê dikevin torê– her weha, telefonên destan jî îmkana dan û standinê daye muxalifan.

Her çi hêzên siyasî yên ku di raperînan de cih girt, endamên wan bi giranî ji sinifên navîn tên. Ev rastî bi taybetî ji bo hêzên herî xurt ên weke ***Ennahda*** li Tûnisê, ku endamên meyla ***Birayên Misilman*** in, derdikeve holê. Birêveberîyên wan her weha xwedî tropîzmeke kapîtalîst a giran in, wek **Khairat al-Chater**, bazirganê pir maldar ê ku Birayên Misilman ew wek namzedê xwe yê ji bo hilbijartina serokkomarîya misirî hilbijart.

Ev yek hemanekî neguherbar ê rola siyasî ya sinifên navîn e: Ji ber pêkhatina xwe bi xwe, ew nikarin di dema dirêj de helwêsteke yekreng biparêzin û timî li nav her du qutbên civakê yên derdora xwe belav dibin. Ji Fasê heta bi Sûriyê, meyla Birayên Misilman blokeke pirreng pêk tîne, ku endamên wê ji sinifên navîn û ji burjuwazîya bazirgan jî derdikevin. Li pey qonaxa demokratîk a destpêkê, dabeşîyeke tevgera gelêrî tê xuyan, wek li Tûnis û Misirê. Rêxistinên siyasî li dijî domandina têkoşînên civakî yên mûçegiran derdikevin û wan wek "sinifparêz" nîşan didin, lê belê beşeke girîng a ciwanên sinifên navîn, endamên van rêxistinan jî di nav de, ji bo domandina serîhildanê bi biryar in.

* Profesorê li Dibistana Lêkolînên Rojhilatî û Afrîkayî (SOAS) ya Zanîngeha Londrayê. Pirtûka wî ya bê raperîna erebî ji xwe re dike mijar û wê li dawîya 2012ê ji hêla weşanxaneyên Sindbad-Actes Sud ve bê weşandin.

1 **Raphaël Kempf,** "Racines ouvrières du soulèvement égyptien/Kokên Karker ên Raperîna Misrî ", adar 2011

2 **Karine Gantin** û Omeyya Seddik, "Révolte du 'peuple des mines' en Tunisie/Serhildana 'Xelkê Kanan' li Tûnisê", *Le Monde diplomatique,* tîrmeh 2008

3 **Smaïn Laacher û Cédric Terzi**, "Au Maghreb, les blogueurs sont fatigués/Li Mexrebê Blogvan Westiyane", *Le Monde diplomatique*, sibat 2012



İSMAÎL ÇOBAN: **Tore**, boyaxa rûnî li ser tuwalê, 15 m²

Wergera ji fransî: Simko Destan

# Li Çînê "dewlemendên piçûk"di warê demokrasîyê de pir fikaran nakin

JEAN-LOUIS ROCCA *

Mafê dengdayînê? Ji me re dibêjin tebeqeyên navîn – yên ku bi gotina fermî gihiştin "halxweşîya piçûk"– wê di dawîyê de vî mafî ferz bikin. Lê belê tecrûbeyên Koreya Başûr, yan jî yên Taywanê vê teşxîsê pûç dikin.

Sinifên navîn ên nû (teknîsyen, karmend, patronên ferdî, hwd.), ku xwedî mûçeyên rihet, lê dîsa jî ne dewlemend in, niha çaryeka nifûsa çînî û nêzî nîvê bajarîyên welêt pêk tînin. Ji bo beşeke raya giştî -ya ku di medyayan de diaxive-, ew dibin koma tenha ya ku dikare welêt bike demokratîk. Ew baş perwerdekirî ne û pareyekî baş qezenc dikin, lewre jî tê gotin ku taybetmendîya wan ev e ku hem hêmaneke istiqrarê, hem jî insûreke guherîna siyasî ne. Istiqrar, ji ber ku ew ji rihetîya xwe, maldarî û aramîyê hez dikin, lê herweha ji bo pevçûnên civakî piştgirên çareserîyên aqilane ne: Muzakere û lihevhatin şûna şidetê. Insûrê guherîna siyasî jî, ji ber ku weha xuya dike ku, ji hemû sinifên civakî yên din bêhtir, ew xwedî qabilîyeta parastina berjewendîyên xwe ne û bi vî awayî li ser Partîya Komûnîst pêvajoyeke demokratîkkirinê ferz bikin jî xwedî qabilîyet in.

Lêkolîner, rojnamevan û memûr weha dihesibînin ku dîroka hemû civakên hevdem, rola biryardêr a sinifên navîn di demokratîkbûyînê de eşkere dike. Li Çînê, îdîayeke pir belav e ku modernîteya siyasî ya Ewropa û Dewletên Yekbûyî, ji ber çalakbarîya van sinifên ronakbîr ên carna ji burjuwazîyê jî pir baş nayên veqetandin, pêk hatiye. Ne giring e ku derkertina holê ya demokrasîya temsîlker demeke dirêj berê rabûna sinifên navîn ên nû pêk hatibe; ne giring e ku li Fransa yan Dewletên Yekbûyî, helwêsta wan a siyasî zêde pêşverû nebû. (1) Di dawîyê de, ne giring e ku "tevgerên civakî yên nû" yên salên 1960ê û 1970yê, bi çalakbarîya enîyeke piçûk a çalakvanan (rewşenbîr, xwendekar, protestokirên aktîv), rê li ber modernkirina kapîtalîzmê vekir û her weha hişt ku komên berjewendîyê (homoseksuel, hindikayîyên etnîk) entregreyî wê bibin, li şûna ku wê bixin tahlûkeyê. Ev xeyal dîsa serkeftî didome û "tecrubeya demokratîk a asyayî " wê jî didomîne.

## Li Koreya Başûr demeke dirêj tirsa herî mezin ya ji kaos û ji sekinîna mezinbûna aborî bû

Edebiyateke kûr û hûrgilî dixwaze demokratîkbûyîna Tayland, Taîwan an Koreya Başûr bi riya derketina holê ya sinifa navîn şirove bike, ya ku guherîna siyasî bi serê rejîmên heyî de ferz kiribe. Lê belê, ji salên 1990ê ve, hin nivîsîner li dij vê xeyalê derketin. **Hagen Koo** weha li ser Koreyê derdibire ku *"rola sinifên navîn di demokratîkbûyînê de ne zelal û guherbar e, ne ji ber xwezayeke guherbar a berjewendîya wan a sinifî, lê ji ber ku enîyên wan ên cihê bi awayên gav bi gav bersiva guherîna siyasî didin û pêvajoya demokratîkbûyînê jî dûr û dirêj û kompleks e"*. (2) Tevî ku, heta 1987ê, beşeke mezin a sinifên navîn ên koreyî piştgirîya lîberalîzebûna siyasî kiriye, wan bi dû re, ji ber tirsa kaos û tengbûna aborî, piştgirî da çareserîyên bêhtir otorîter.

Herweha, li gor lêkolîner **Neil Englehart**, sinifên navîn ên taylandî di derketina ji otorîtarîzmê de xwedî tu roleke taybet nebûn. Biryara bicihkirina pergaleke hilbijartinî ya divîya istiqrara welêt biparasta, ji hêla beşeke ji elîtan (leşkerî û îdareyî) ve hat dayîn. Rola biryardêr a sermayeyê bîyan û ixracatan di aborîya welêt de pêwîstîya "pêbawerîya bazaran" bi xwe re dianî û hingê, hilbijartin wek faktoreke saxlemîya/xwegirtîtîya demdirêj dihatin hesibandin. Wek komên civakî yên din, sinifên navîn li dij bertîlxurîyê û ji bo demokrasîyê xwe pêşan da, lê belê, dema ku sinifên civakî yên radîkaltir nîzama civakî dixist xetereyê, helwêsta wan pir haydartir bû. (3)

Di dawîyê de, li Taîwanê, demokratîkbûyîn ne ji ber raperîneke tund a sinifên navbeynkar, lê ji ber dawîya fîksîyona vegirtina parzemînê, hêmana tenê ku dîktatorî rewa dikir, çêbû. Dema ku Guomîndang lê mukir hat ku hikûmeta taîwanî êdî tenê gelê taîwanî temsîl dike, mecbûrîyeta hilbijartinan derket holê. (4) Karmend û burokrasî pir pev girêdayî bûn û tenê fraksîyoneke marjînal a sinifên navîn bi dû re ji lîberalîzebûyîna rejîmê sûd wergirt û tevgerên civakî dan dest pê kirin.

## Gelo çîna navîn çîneke bi serê xwe ye? Yan bi tenê fraksîyoneke çînên gelêrî ye?

Ev teorîya modernbûyînê girêdayî siyaset û dîrokê nabe, lewre ku ew demokratîkbûyînê weke pêvajoyeke ji jorê ve dihesibîne, ya aîdê sinifekê ku, bê guman, ronahî dixist dinyayeke tarî. Xeyalperestîyeke hevreng di salên 1970 û 1980ê de li Rojava rû da, ku pirsgirêka sereke di dîtina komeke civakî de bû ya ku dê bikaribûya cihê sinifa karker bigire, lewre ku wê bi awayekî dîyar nedikarî kapîtalîzmê xira bike. Di vê çarçoveyê de, alîgirîya siyasî ya sinifên navîn pir giring xuya dikir. Gelo ev sinifeke bi xwe ye? Yan tenê fraksîyoneke sinifên gelêrî ye? Belkî burjuwazîyeke piçûk? Yan hêzeke ku hem li dij burjuwazîyê û hem li dij karkeran têdikoşe? Arîstokrasîyeke karkerî ya nû? (5)

Li Împaratorîya Navîn (Çîn) jî, fikira ku sinifên navîn çalakbarên guherînê ne, pêwistîyeke lihevhatî a înkarkirina pirsgirêka siyasî bibersivîne. Rast e ku demokrasîya temsîlker siberoja Çînê ye -her kes kêm zêde vê yekê dipejirîne-, lê belê ev demokrasî wê tenê derkeve holê li dawîya pêvajoyeke dûv û dirêj a parastina hin qaîdeyên bingehîn: Istiqrar û mezinbûna aborî. Beşeke sinifên rayedar weha ditirse ku ew ê hertişt pir zû ji dest bide û dibêje ku çiqasî dereng biqewime, evqas jî baştir e. Rewşenbîr, lêkolîner û rojnamevanên pirhejmar hêvî dikin ku têkoşînên civakî wê rê li ber demokratîkbûyînê (maf û azadîya zêde) vekin, bêyî guherîneke tund a rejîmê. (6) Hinên din jî, wek mînak blogvanê bi nav û deng **Han Han**, şoreşê red dikin û reformê dixwazîn, lewre ku ew weha bi dilgiranî qebûl dikin ku dibe ew ê di serdema jîyana xwe de Çîneke bi temamî demokratîk nebînin. (7) Li gor siyasetnas **Emilie Frenkiel** (8), heta lîberalên wek **Qin Hui** yan **Ren Jiantao** (9) demokrasîyeke yekser hêvî nakin: Ew weha texmîn dikin ku serdemeke derbasbûyîn û adaptebûyînê pêwîst e. Fikir guherbar in, lê belê hemû weha dihesibînin ku Çîn ji bo hilbijartinan ne amade ye û hewldanên zorlêdanê jî, di bin ferzkirina tevgereke gelêrî ya bi şidet de, dê dawîya reforman û heta belkî betalkirina çi demokratîkbûyîna bê, bi xwe re bianîyana.

## Çapemenî û blogvanên çînî wisa hizir dikin ku gel "ne di wê astê de ye" ku dengê xwe bide

Ev lihevhatin bi çend awayan şirove dibe. Lîsteya dirêj a tevgerên ku mohra xwe li dîroka Çînê xistiye, ji Şoreşa Çandî (ji 1966ê ve) heta bûyerên Meydana Tiananmen (1989), dike ku pevçûnên siyasî yên muhtemel bi çavekî xweşbîn neyên dîtin. Wekî din, bi rihetî tê fêm kirin ku parêzvanên gotina "misogerkirina qezencan ji bazdana li dû xeyalan baştir e" pir in. Kes nikare bêje ku pergaleke demokrasîya temsîlker, li gel para xwe ya nayê pêşdîtin di kalîteya rayedarên hilbijartî de û hêdîbûna aîdê hilbijartinê, wê ji dîktatorîya komî ya heyî encamên baştir derxe. Bi kurtasî, medya û piranîya endamên sinifên navîn ên ku li ser Înternetê diaxivin weha dihesibînin ku çînî "negihîştine wê astê ". Dengdarên muhtemel niha bi piranî cotkar, koçber, gelekî belengaz ên bajarî û ne perwerdebûyî ne, bi gotineke din, qewmeke ku bi çavên elîtên rewşenbîrî nikare rola welatîyan bileyize; ku weha be, hilbijartin dê tenê poşmanî û xemgînîyê bi xwe re bîne. Dibe ku dewlemend rayan bistînin û siyasetên xwe yên dijcivakî ferz bikin; ji xwe, **Han Han** lê zêde dike, kî ji Partîya Komûnîst dewlemendtir e?



İSMAİL ÇOBAN: **Dîmenên mirovan IV**, boyaxa rûnî li ser tuwalê, 120 x 100 cm

Divê bê gotin ku mebesta peyva "elît" li vir ne tenê sinifên rayedar, lê belê sinifên navîn e jî, bi taybetî yên ku di rojnameyan de dinivîsînin, lêkolînê dikin, bi mîran dişêwirin, blogan pêşkêş dikin û piştgirîyê didin tevgerên civakî. Statûya wan ji pareyê bêhtir, li ser asta wan a perwerdeyê (mezûnên zanîngehê) saz dibe, her weke sifatên baş ên ku ew xwedêgiravî temsîl dikin: Aqilmendî, kubarî, tamzanî, dilpakî. Ev sifat li alîyekî wan ji "karên nelirê" yên sinifên rayedar, li alîyê din ji "kalîteya xirab" a girseyan vediqetîne. Monopola wan di medyayan de riya ferzkirina qaîdeyên exlaqî dide wan. Pirî cotkar û koçber vê şideta nîşanî ya li dij wan qebûl dikin: Ew xwe bi xwe "ne bi kalîte" dihesibînin û dixwazin ji rewşa xwe rizgar bibin.

## Zêdebûna mûçeyî, bernameyên xanî û staran: Ji bo koçberan, beridîneke bi baldarî û dîqet hatî plan kirin

Ev elîtên xwedî tesîreke nayê înkar kirin a li ser siyasetên giştî ne û weha xwe wek sinifeke îdeal a dergeha demokratîkbûyînê didin xuya kirin. Ji çep heta rastê û ji lîberal heta sosyal-demokratan, ji xeynî hin dengên nerazî yên bi tenê, ev demokratîkbûyîn wek projeyeke teknokrat, aqilmend û pêşverû tê hesibandin, planeke ji jorê ve meşandî ya ku cihê gumanbarîyê tê de tuneye. Wekî din, ji tevgerên civakî bêhtir behsa tevgerên parastina mafan (*weiquan*) tê kirin. Bêhtir mafên ji bo şexsan, bêhtir rewatîya îfadekirina nerazîbûnê, bêhtir zelalîya di "hikûmdarîyê" de, bêhtir edaleta civakî: Weha xuya ye ku qonaxa pêşî ya pêşketina demokratîk ev e. Em sed kîlometre dûrî "şoreş" an guherîna rejîmê ne.

Diwanzdehem plana pêncsalî (2011-2015) ya ku iqtîdarê pesend kir, dixwaze piştgirîyê bide komên bi qezencên navîn û rê bide koçberan ku bi girseyî têkevin sinifên navberkar (bi zêdekirina mûçeyên wan, bernameyên îqametê, başkirina parastina civakî, şandina zarokên wan bo dibistanê), da ku hejmara "welatîyên baş" ên muhtemel zêde bibe. Rojnamevan, lêkolîner, parêzer û siyasetmedarên ku piştgirîyê didin tevgerên protestoyê yên koçber û cotkaran, bang li guherandina wan a ji bo welatîyên haydarên maf û erkên xwe dikin; ew ji wan hêvî dikin ku ji berjewendîyên xwe yên şexsî bêhtir, ew fêrî parastina berjewendîyên kolektîf bibin. Ew weha difikirin ku, dema ku nîvê civakê gihîşt vê astê, Çîn ê bi rastî karibe ji demokrasîyeke temsîlker a rasteqîn sûd werbigire.

Gelo siyaset û dîrok wê bihêlin ku ev projeya teknokratîk zora wan bibe? Deh salên bê, wê ji me re bibêjin. Sernermîya koçberên nifşa duyem li hember siyasetên entegrasyonê û şideta sembolîk ya li wan dixe, ne misoger e. Her çi sinifên navîn in, tevî ku ew bûne stûna rejîmê, dibe ku ew, bi daketina misogerîya statûya xwe, serttir bibin. Nebûna siyaseteke bacî ya ku bi wekhevî bacên sermaye û kar, yên mûçe û berhemên fînansî, werdigire, pirsgirêkên xebatê yên mezûnên nû bi wan re rû bi rû ne, pêwîstîya deyndarîyê ya ji bo cotên ciwan ên dixwazin apartmanek an erebeyekê bikirin: ev hemû nîşanên vê "xembarîya" sinifên navîn in.

* Profesorê li Sciences-Po, Navenda Lêkolînên Navneteweyî (CERI), CNRS, Paris. Nivîsînerê *Une sociologie de la Chine [Civaknasîyeke Çînê]*, La découverte, Parîs, 2010.

1 *Bnr.* Wright Mills, *White Collar. The American Middle Classes,* Oxford University Press, New York, 2002 (çapa yekemîn 1951)

2 Hagen Koo, "Middle Classes, Democratization, and Class Formation: The Case of South Korea", *Theory and Society,* cild 20, hjm. 4, 1991

3 Neil Englehart, "Democracy and the Thai Middle Class. Globalization, Modernization, and Constitutional Change", *Asian Survey,* cild 43, hjm. 2, adar-nîsan 2003

4 Françoise Mengin, "Taïwan: la question nationale et la démocratisation", di Christophe Jaffrelot (birêvebir), *Démocraties d'ailleurs,* Karthala, Parîs, 2000

5 Carolyn Howe, *Political Ideology and Class formation. A Study of the Middle Class,* Praeger, Westport, 1992; Luc Boltanski, *Les Cadres. La formation d'un groupe social*, Minuit, Parîs, 1982

6 Bixwînin Jing Jun, Sun Liping, Shen Yuan û Guo Yuhua, "Des chercheurs chinois réclament des réformes dans leur pays", *Le Monde diplomatique,* tîrmeh 2011

7 Han Han, "Tan geming" ("Li ser şoreşê"), http://blog.sina.com.cn/twocold

8 Emilie Frenkiel, "Une démocratisation aux couleurs de la Chine", *Politique étrangère,* hjm. 4, Parîs, zivistan 2011

9 Qin Hui dîroknas û profesorê zanîngeha Tsinghua ye, ew ji ber piştgirîya xwe ya ji bo ferdîkirin û demokrasîya temsîlker tê nasîn. Ren Jiantao profesorê zanîngeha Sun Yat-Sen e û parêzvanê felsefeya lîberal

Wergera ji fransî: Simko Destan

Nifşên ciwan ji nifşê berê bêhtir zana û xwedî agahî ne. Ji ber rewşa xerab û bê ewle ev nifşê ciwan hêvîşkestî bûne û ew hatine dereceyeke welê ku hêrsa wan dikare belav bibe û bibe hêrseke gelêrî.

# Ji Londonê heta Santîagoyê raperîna yên ku ji sinifên xwe daketin tebeqeyên jêrtir

RAPHAËL KEMPF *

Amir Imran me li nav milk digerîne. (1) *"Konê min li van deran e, nêzî yê servîsa teknîkî yê ku bi Înternet, têkilîyên li gel mijûlîyên din û rojanekirinên li ser Facebookê mijûl dibe. Li vir mitbex heye, ya ku taştê, firavîn û şîvê dide. Ev dever jî konê "çay û empatî" ye, li gel pîyano, çay û qehweya belaş!"* Li ber Katedrala Saint-Paul, li navenda City a Londrayê, bi dehan kon ji 15ê cotmeha 2011ê ve hatine vegirtin. (2)

Imran ji destpêkê ve li vir radikeve û bi tenê hefteyê du rojan ji wargehê derdikeve da ku biçe dersan. Ew 24 salî ye û çend meh berê hat paytextê brîtanî ji bo ku xwendina rojnamegerîyê xilas bike. Ew ji Malaysîyayê tê û li wir *"qanûneke pir zexm heye ku rê li ber girtina kesekî vedike, eger gumanên şkandina aheng û nîzama umûmî li ser vî kesî hebe. Li wir, ez tevlî tevgerên ji bo mafê azadîya xwepêşandanê bûm. Îcazeya protestokirinê ji me re pêwîst bû. Dîsa jî, li vir rihettir e!"* Ji bo wî, tevlîbûna nav refên mîlîtanên "Occupy the London Stock Exchange" (Borsaya Londrayê dagîr bikin) tiştekî xwezayî bû.

Tevgera "Occupy" (Dagîr bikin) a ku di roja 17ê îlona 2011ê de li New Yorkê hat dest pê kirin, dixwaze xwe di rêza "nerazî" yên spanî de bibîne û bi rengê xwe, dengê "bihara erebî" vede. Tevî ku rewş cuda bin û daxwaz carina tevlihev bibin jî, ji Londrayê heta New Yorkê, ji Madrîdê heta Tel Avîvê, li hember nîzameke siyasî ya ku hefsarê wê ji destê welatîyan difilite û li hember olîgarşîyeke ku dewlemendîyan desteser dike, heman nerihetî tê dîtin. Her weke vê hîsa performatîv a tevlîbûna tevgereke global. Lê belê, ji xwesteka xwepêşandêran bêhtir, gelo em bi rastî dikarin van çalakîyan hemûyan di kategorîyeke hevpar de bicivînin? Ji Qahîreyê heta Atînayê, ji Santîagoya Şîlîyê heta San Franciscoyê, gelo em şahidên derketina holê ya *"gelekî dinyayî yê têkoşêr"* in? (3)

Ev pirs ji du xwendekarên ji Şîlîyê tê kirin yên ku, ji meha gulana 2011ê ve, beşdarî tevgera ji bo perwerdehîya umûmî û belaş dibin, li vî welatê ku rejîma general **Pinochet** zanîngeh 1981ê ferdî kirin. (4) Jixwe, Şîlîyê sala 2011ê xwepêşandanên gelêrî yên ji vegera li demokrasîyê û vir ve yên herî mezin dîtin. Malbat û şagirdên lîseyî dan ser şopên xwendekaran. Heta wan pirsgirêka wekhevîyan û ya reforma bacan jî xist rojevê, her weke ya temsîlbarîya pergala siyasî. Ew ne ji "nerazîyan", ne jî ji "bihara erebî" îlhama xwe digrin: Wan daxwazên xwe li gor rewşa welatê xwe saz kirin, lê belê ew dibêjin ku hêrsa ew îfade dikin, ji sînorên Şîlîyê dibihure.

Ji bo **Andrés Muñoz Cárcamo**, *ev dîyardeyeke global e, li hember awayê ku pê pergala aborî kar dike û binesazîyên civakî xira dike. Li Şîlîyê, mesele perwerde ye; li warên din, tiştekî din e"*. Tevî ku bi haydarî cudatîya hemû van tevgeran bin xêz bike, hevalê wî **Vicente Saiz** heyînîya *"bingeheke hevpar"* piştrast dike, lewre ku *"xelk tê dikoşin ji bo ku biryarên xwe bi xwe bidin"*. Jixwe, rast e ku ev îradeya vegirtina iqtîdareke desteserkirî, ev daxwaza tevlîbûna rasteqîn a di jîyana umûmî û awayê hikûmdarîya civakan de li her derî tê dîtin –pir caran, ev tişt hemû bi peyva sade ya demokrasîyê tên îfade kirin.

## Li Puerta del Solê panoyek: "Em li nav taxan in"

Li Madrîdê, berfirehîya hêrsa ku 15ê gulana 2011ê ***Puerta del Sol*** tijî kir –û tevgera "15M" da dest pê kirin– Carlos Paredesê organîzatorekî vê xwepêşandana pêşî matmayî hişt. Tevgera ***"¡Democracia real YA!"*** (*Demokrasîya rasteqîn, niha!*), ku ew berdevkekî wê ye, berîya çend mehan li dor heşt pêşnîyaran hatibû damezirandin, ku ji betalkirina imtîyazên sinifa siyasetmedaran heta bicihanîna rastîn a mafê lojmanê û reforma qanûna hilbijartinan rêz dibûn. (5)

Lê belê, ji bo vî muteşebisê 32 salî, yê ku xwedîyê şirketeke xizmetên kompûterî ye, motîvasyona lidarxistina meşan ji van çend pêşnîyaran kûrtir û berfirehtir e. Li Spanyayê, ew şirove dike, *"banîyeke camê"* heye, ya ku pişkivîna şexsî û pîşeyî ya gel bi sînor dike. *"Yên ku jixwe li jor in, li jor dimînin, yên ku li jêr in, jêrtir diçin. Nemumkinîya pêşketina aborî û civakî hişt ku ez li riyên din bigerim. Weha min **¡Democracia real YA!** dît."* Ew ne endama tu partî yan sendîkayê ye û xwe nêzî tu îdeolojîyeke siyasî nabîne. Lê belê, li gel pergaleke aborî ya her ku diçe newekhevtir dibe, ew vê demokrasîyê rexne dike, ya ku wê ne li Spanyayê û ne jî li Ewropayê kesî temsîl bike. Ew weha *"darbeyên fînansî"* şermezar dike, yên ku sê şexsên nehilbijartî û ji dinyaya fînansê derketî anîn meqamên girîng: **Mario Dragh** li serokatîya Bankeya Navendî ya Ewropî, **Lucas Papademos** li serokwezîrîya Yûnanistanê û **Mario Monti** li serokatîya Konseya Îtalî.

Ev krîza temsîlbarîyê derketina holê ya jixweber a tevahîyeke mekanîzmayan rave dike ku hedefa pesindkirina biryaran bi riya lihevhatinê li ber xwe deynin. "Nerazîyan" xwe ji siyasetê dûrxistî hîs dikir û ji ber vê yekê, wan teknîkên biryardêr ên herî vehewîner saz kirin. Li êvara xwepêşandana 15ê gulanê, hinan weha pêşnîyar kir ku xelk li Puerta del Solê bimîne. Dagîrkerî ji mehekê bêhtir domand û li gel meclisên giştî, munaqeşe û komên xebatê yên li ser mijarên cuda cuda derbas bû. Hemû kesên ku me li Madrîdê dîtin –û her weha di tevgerên "Occupy" ên din de– bi hestyarî ji me re behsa van meclisan kir ku carina bi hezaran kes dicivandin. Fîlozof **José Luis Moreno Pestaña** behsa *"zewqa nîqaşa umûmî"* dike. (6)

## Li gelek welatan bi gelek curên nerazîbûnê

**Ivan Ayala** 31 salî ye. Ew li zanîngeha Complutense tezekê li ser bingehên rêbazî yên aborîya nûklasîk amade dike. Ew weha vedibêje: *"Ez daîmî tevlî tevgerê bûm. Li destpêkê, tiştekî bi heybet bû. Di hin komên xebatê de, pênc sed endam hebûn! Tiştekî hestyar bû ku mirov were Solê û mecliseke ji çar hezar kesan bibîne, yên ku mîna di agoraya yûnanî de nîqaş dikir"*. Ji ber ku ew pergala partîyan red dike, 15M naxwaze xwe wek tevgereke çepgir bide nasîn. Lê belê, Ayala weha dihesibîne ku rexneyên wî li ser bankevan, siyasetmedar, nûlîberalîzm û spekulatoran dîsa jî analîzeke çepgir pêk tînin. Li gel vê, serkeftina wê ya rasteqîn ev e ku *"tiştekî bi munaqeşe, gelî û girseyî ye. Niha, di hemû tax û gundan de, meclis ava dibin"*.

## Destûrê bidin, kêmasîyên sîstema demokratîk werin eşkere kirin

15Mê weha xwe nû kir û karî çalakîyên xwe bidomîne, tevî biryara rawestandina konvegirtin û dagîrkirina herdemîn a Puerta del Solê. Ev taybetmendîyeke tevgerên din e jî: Dema ku "nerazî" biryara rakirina konan didin, ew dikarin belav bibin, di şûnên xwecihî de cih bigrin û xwe bigihînin girseyeke berfirehtir û gelêrîtir. Li 12ê hezîrana 2011ê, bi dawîlêanîna dagîrkirina Puerta del Solê, pirrengîya afîşên şexsî yên li ser meydanê hatibûn daliqandin, hat rakirin û pankarteke mezin şûna wan girt: ***"Nos vemos en los barrios"*** ("*Em ê di taxan de hev û du bibînin*").

Pirrengîya coxrafyayî ya tevgerê li gel pirrengîyeke çalakîyan pêk hat. Wek mînak, platformeke ji bo alîkarîya kirêkeran di bin metirsîya dûrxistinê de hat damezrandin: Dema ku malbat xwe digihînin "nerazîyan", ew di roja dûrxistinê de bi hejmarên mezin tên û, carinan dikarin rê li ber wê bigirin, an jî ji bo çend mehan wê taloq bikin. Ew her weha bînayên vala dagîr dikin da ku malbatên bêpar li wan bi cih bikin.

15Mê weha rê li ber mobîlîzasyon û balkişandina ser pirsan vekir, ên ku duhî evqasî xuya nebûn. Parêzer **Liliana Pineda** tevlî têkoşîna ji bo birêvebirina avê dibe. Lewre ku civata Madrîdê dixwaze şirketa umûmî *Canal del Isabel II* ferdî bike. Ew weha şirove dike: *"Ev kampanya mînakeke hevkarîya tevger û hin partîyên siyasî bi riya platformekê ye. Jixwe 15ê gulanê, pir tişt hatibûn li dar xistin. Lê belê, bi xêra "nerazîyan", hîn xelk li xwepêşandana 8ê cotmehê pirtir hatibû, lewre ku platformê di pir meclisên gelî de cih digirt. Çend partîyên siyasî jî -Izquierda Unidad, EQUO - jî beşdar bûn"*. Ev bûyereke girîng e, lewre ku heta wê demê, weha xuya dikir ku 15Mê tu têkilî li gel partîyên siyasî, yên nêzî fikirên wê jî bin, red dikir.

## *Occupy* êdî bûye tevgereke navneteweyî

Ev pirsa têkilîya bi siyasetê re berîya hilbijartinên meclisê yên 20ê mijdara 2011ê, ku Partîya Gel (PP) ê Mariano Rajoy (muhafezekar) tê de serkeftî derket, ji her demê tundtir bû. Gelo tevgereke civakî ya ku xwe ne alîgir dibîne, wê li hember hilbijartineke weha girîng xwedî çi helwêstê be? Damezirandina partîyekê ji bo *"dawîlêanîna dupartîtîyê"*, wek hinan li hezîrana 2011ê pêşnîyar kiribû? Ev fikir zû bi zû hat red kirin. Dengnedayîn? *"Me tu cara bang li dengnedanê nekir*, **Paredes** israr dike. *Me bang li dengdana partîyên kêmdeng kir, lewre ku em li dij dupartîyîya PP û PSOE* [Partîya Sosyalîst û Karkerî ya Spanî] *radiwestin"*. Armanc jî bi tenê ev bû ku, bi riya hesabên pir zana, partîya kêmdeng bê dîtin ya ku şansên wê pirtir bûn ku bi serê namzedê yekî ji herdu partîyên mezin bikeve. Partîya rastgir dîsa bi ser ket, lê belê kêmanîyên pergala demokratîk a spanî jî bi vî rengî derketin holê. Ji bo guherandina vê pergalê, **Paredes** û hevriyên wî niha li ser projeyeke "demokrasîya 4.0" difikirin, ku wê welatî bikaribin bi riya Înternetê li ser projeyên qanûnê yên li Parlemanê pêşnîyarkirî deng bidin.

Lê belê, ji vê aferînerîya mayînde zêdetir, serkeftina tevgerê ji giranîya wê ya di munaqeşeya siyasî de tê. Wek li Dewletên Yekbûyî û li Keyatîya Yekgirtî, "nerazî" yên spanî derdibirin ku pêşnîyarên wan êdî li ber çavên raya giştî ne. Û berîya hertiştî, Paredes bin xêz dike, ew *"di navneteweyîkirina tevgerê de serkeftî bûn. Occupy Wall Street* [OWS] *û tevgerên îsraîlî* (7) *bi rengekî ji 15Mê dertên"*.

Li welatekî ku çalakbarîyên gel lê weke tiştekî ji dîrokê xuya dikir, çawa dibe ku payîza 2011ê, komeke xwepêşandêran li başûrê Manhattanê bûn destpêka *"raperîneke global"*? (8) Parêzer **Alexander C. Penley**ê tevlî konvegirên newyorkî bûyî, girîngîya serbihurîyan bi bîr tine, yên ku imkan da vê tevgerê, wek tevgera sendîkayî ya destpêka 2011ê li eyaleta Wîsconsînê û herweha jî bihara erebî wek mînakdêr dihesibîne. *"Eger ku tiştekî weha li Fransayê pêk bihata, dê tesîra wê evqas mezin nebûya, lewre ku hûn dizanin, li Fransa û Ewropayê, amerîkî van xwepêşandanan mîna tiştekî ji rêzê dibînin. Lê belê, li Rojhilatê Nêz... Dihat gotin ku ev welat pir girtî û asêmayî ne. Ku li wir çêdibe, tiştek dikare li vir jî pêk were"*.

## Pêşnîyara hilweşandina peykerê Gayê Broadwayê

Belkî ji bo wê, banga dagîrkirina ***Wall Street***ê ya ku kovara kanadî *Adbusters*, bi rexnegirîya tundrew a reklamê meşhûr, li ser Înternetê weşandibû, xwedî bandoreke weha xurt bû. Roja 17ê îlonê, çend sed kes hatibûn da ku li taxa fînansî ya New Yorkê xwe pêşan bidin û kêm zêde bi tesadufî, ew gihîştin Zuccoti Parkê, meydaneke li nav çend balaxaneyên asêmayî, çend deqîqe dûrî Wall Street û Ground Zeroyê. *"Kesekî wek li Yûnanistan an Spanyayê fikira sazkirina mecliseke giştî pêşnîyaz kir"*, David Graeber ê antropolog, anarşîst û kevneprofesorê Yalêyê tevlî plankirina dagîrkirinê bûyî bi bîr tîne. Wê rojê, xelkê li kolanê û di qada umûmî de dest bi guftûgoyên siyasî kiriye, tiştekî ku li Dewletên Yekbûyî kêmdîtî ye. Hin daxwazên cihêreng jî, cidî yan pêkenok, derketin holê. Di yekem meclisa giştî ya OWSê de, betalkirina hukmê "*Citizens United*" ya Dadgeha Bilind weha hat nîqaş kirin, hukmekî ku bandordarîya şirketan li ser iqtîdara siyasî xurt dike (9); herweha, vegerandina qanûna *Glass-Steagall* jî cihê guftûgoyan bû, ku betalkirina wê ya ji hêla **William Clînton** ve rê da belavkirina fînanseke bê kontrol. Bi rengekî cudatir, hinan jî bang li xirakirina peykerê Gayê Broadwayê kir, peykerekî nîşandêra xeyalên bihêzîya Wall Streetê.

Di rojên piştî wê de, xwepêşandêr pirtir in û kon jî hatin vegirtin: Jîyanek li Zuccotti Parkê bi cih dibe. Meclisên Giştî didomin, komên xebatê çêdibin, "Danasîna dagîrkirina New Yorkê" tê pesend kirin. Meydanê mirovên ji hev cihê kom kirin. Ji xeynî mêrên ciwan û spî yên mezûn, kesên bêxanî, endamên hindikayîyan û "dengên marjînalkirî" yên din jî hatin, ku têxistina wan armanceke girîng a di demdirêjîyê de ye -ku hîn bi ser neketiye. Hin ji wan xwe komûnîst an sosyalîst dibînin, yan jî kapîtalîzmê wek serêkanîya pirsgirêkê nîşan didin. Hinên din jî dixwazin vê pergalê û aborîya bazarê biparêzin, lê sererastkirina wê dixwazin.

## Li Nashvilleê, wargehê têkilîyên ku bajarbûneke neinsanî xirakirî, ji nû ve tê ava kirin

Obama hêvîya gelek ji wan pûç kiriye: *"Min dengê xwe dayê, wî tiştek nekir, niha ez dagîr dikim"*. Wek **William P. York**, parêzerê ciwan ê ku me li wargeha "Occupy Nashville" a li Tennesseeyê dît: *"2008ê, ez tevlî xebatên kampanyaya wî ya li Clevelanda Ohioyê bûm*, ew vedibêje. *Ji bo cenga hilbijartinan eyaleteke girîng bû. Ez di warê siyasî de pir çalak bûm, min pir ked daye kampanyayê. Lê belê, piştî hatina wî li ser kar, min zû fêm kir ku ew kêm zêde mîna namzedên din e. Her du partî di rastîyê de yek partî ne. Ew her du jî di bin bandora fîrmayên weha de ne ku çiqas pareyî bixwazin, dikarin bidin namzedan. Van fîrmayan, şirketên pirneteweyî yên mezin, namzed weha kirîne"*. Rexneya iqtîdara şirketên mezin mijareke hevpar a tevgera OWSê ye.

Dagîrkirina zemînên umûmî bû aleta dengvedana vê rexneyê. Ji bo hinan, ew xwe bi xwe rewa dike û pêkanîna konkret a wê civakê ye ku ew dixwazin pêk were: Kiryareke siyasî ya bi têra xwe ye. Lê belê, wek Shane Patrickê ku wek ew xwe dide nasîn *li gel* tevgera OWSê organîzator e, ji me re got, *"kes naxwaze di civakeke wekhevparêz de, lê li nav New Yorkê û di meha çileyê de, bijî"*.

Ji ber vê yekê, pir kes weha dihesibînin ku dûrxistina konvegirên Zuccotti Parkê ji hêla polîsê New Yorkê ve, di şeva 15ê mijdarê de, bandoreke erênî kir. **Michael Levitin**ê kevnenivîskarê *Newsweek* an *The Los Angeles Times* bûyî serredaktorê *The Occupied Wall Street Journal*, vê yekê xuya dike: *"Êdî Zuccotti Park ji me re ne lazim bû. Ji bo rawestandina wê, kêlîya herî minasib bû. Awayê ku şaredar jî em derxistin bêqisûr bû: Bi şidet bû, li hinan xistin, hin girtin, pirtûk avêtin, hemû jî dûrî çavên rojnamevanan"*. Wek ji bo 15Mê li Madrîd an Barselonayê, şideta polîs rê da OWSê ku sempatîya raya giştî qezenc bike, û dûrxistinê fikira awayên din ên çalakîyê li ser dagîrkeran ferz kir, da ku tevgerê bixin qonaxeke nû.

www.arsivakurdi.org

### Slogana nû: Em malên xwe dagîr bikin

Girêdan weha li nav OWS û rêxistinên civatî yên taxên gelêrî yên New Yorkê û derve çêbûn. Roja 6ê kanûnê, platforma ***"Occupy Our Homes"*** (*"Em Malên Xwe Dagîr Bikin"*) li seranserê Dewletên Yekbûyî çalakîyekê pêk tîne ji bo ku xanîyên vala yên aîdên bankeyan dîsa bi dest bixin. Taxa feqîr a East New York armanca rojê ye. Li destpêkê, di navenda Brooklynê de, beşdar bi piranî spî û mezûn in. Lê belê, di ber meşê re, li ser kevîya metroyê û di vagonan de, xwepêşandêr belavokan didin siwaran û haya wan bi rêjeya derxistina ji lojmanan li East New Yorkê dixin, rêjeya herî bilind a bajêr. Hin kes tevlî meşê dibin û dirûşma OWSê jî vedibêjin: "We are the 99 %" ("Em % 99 in", bi vê îşaret bi " % 1 kesên herî dewlemend" dikin).

Nêzî du hezar kesan -mîlîtanên dîrokî yên têkoşînên hindikayîyan, wek **Charles Barron**ê kevneendamê Black Panthers û îro endamê meclisa şaredarîya New York, jî di nav de- dikevin vê taxê. Endamekî din ê meclisa şaredarîyê, **Ydanis Rodriguez**, ji girseyê re dibêje ku ev roj çiqas girîng e, lewre ku ew nîşan dide ku OWS *"bêhtir bi reng"* dibe. Yanî Reş, Îspanî û endamên hindikayîyan tê de pirtir dibin.

Di dawîyê de li *702, Vermont Street*ê, xanîyekî vala tê dagîr kirin, wek li çil bajarên din ên Dewletên Yekbûyî. Malbata **Alfredo Carrasquillo** tê de bi cih dibe. Çend rojan piştî xwepêşandanê, nêzî dwanzdeh dagîrker her dem li wir radiwestin ji bo ku malbatê biparêzin eger bixwazin wê der bikin. **Max Berger** ji karê xwe yê di rêxistineke ne hikûmetî de istîfa kir da ku tevlî tevgerê bibe. *"Em li ser navê malbatekê vî xanîyî dagîr dikin. Min timî xwest ku tevlî çalakîyên weha bibim ku têkilîyên iqtîdarê diguherînin û ji bo kesên di civakê de herî marjînalkirî têdikoşin. Ev pirsa îqametê jî bêqisûr e: Ev dewamîya xwezayî ya tevgera* OWS*ê. Xelk rasterast pê dihesin. Bi dehan malbat bi me re têkilîyê datînin da ku em alîkarîya wan bikin ji bo dîtina xanîyekî, yan ji bo parastina wan ji derkirinê"*. Ew weha lê zêde dike: *"*OWS *xwedîya vê qabiliyetê ye ku tevgereke girseyî saz bike, ya ku wê siyaseta vî welatî biguherîne"*.

### Bajarê Kembera Încîlê Nashville jî dikeve ber bayê nerazîbûnan

Jixwe, tevger bi New York û çend bajarên mezin ên din sînordar nabe. (10) Li Nashvilleyê, di dilê Amerîkaya xristîyan û muhafezekar de, wargehek li ber Kongreya Eyaletê çêbû. Li kanûna 2011ê, bi dehan kon hîn lê bûn û bi xêra serkeftineke hiqûqî li ber dadgeheke eyaletê, xwedî mafê mayîna çend mehên din jî bûn. Wargeh talîyê adara 2012ê ji hêla polîs ve hat vala kirin û Nashville, li gor beşdaran, weha bû yek ji dagîrkirinên herî demdirêj ên Dewletên Yekbûyî. Li wê derê, fikira dîsa girtina cihekî umûmî ji New Yorkê xwedî maneyeke hîn kûrtir e. Ev bajar komeke otorê, balaxane, dêrên bi heybet û firoşgehên erebeyan e, zemînê ûmûmî jî ji erebeyan re veqetandî ye. Li vir, tiştekî bê mane ye ku mirov bimeşe. Her çi konvegirtin e... Bi gotinên dagîrkeran, wargehê têkilîyên ji ber bajarsazîya nemirovî qûtkirî, dîsa pev girêdan. Nashville li nav ***"Bible Belt"*** (*Kembera Încîlê*) cih digire, herêmeke başûrê Dewletên Yekbûyî ye ku bi bînayên dînî tijî ye, yên wek navendên danûstandinê xuya dikin. **Jim Palmer** keşe ye. Berê, ew birêvebirê yek ji van bînayan bû, lê wî ev kar terikand ji bo ku bi awayekî manewîtir xristîyantîya xwe bijî. *"Li şûna ku bala xwe bidin % 10 kesên herî feqîr, dêr di dînamîkeke weha de tên xistin ku bînayên meztir înşa bikin, bernameyên zêdetir çêbikin, da ku bi serê reqîbên xwe bikevin*, ew şirove dike. *Ji nav salên 1970yê, mînaka şirketbûnê li ser keşeyan hat ferz kirin. Dêran wek şirketan bi rê ve dibin. Keşe jî wek serokşirketekî ye ku desteyeke birêvebirîyê li dor wî dicive û her çi endamên dêran in, dengê wan nayê bihîstin"*. Li hember belavkirina vê mînakê, rexnegirîya wê jî li gor taybetmendîyên rewşên xwecihî belav dibe. Palmerê damezirînerê koma navmezhebî ***"Occupy Religion"*** (*"Dîn Dagîr Bik*in") weha bi bîr dixe ku *"Îsa li ba % 99an cih digirt"*.

### "Di sedsala 20ê de çep têk çû. Divê em dersan ji şaşîyên wê bigirin"

Çend mehan di pey destpêka wê re, OWS weha pirşikil û pirreng xuya dike. Ew înîsîyatîvên herî cihêreng li dor xwe dicivîne û çalakî û xwepêşandanan li ser hemû mijaran pêk tîne: Lojman, iqtîdara şirketên pirneteweyî, çekfirotina navneteweyî ya jî hêla pîşesazan ve ku *"li ser navê parastinê, ixracatkerên mirinê ne"*, yan jî deynê xwendekaran û têkoşîna ji bo perwerdeya belaş. Hinên din jî dixwazin cotgehan dagîr bikin. Di demeke kin de, OWSê weha çend pirsên bingehîn -newekhevî, krîza temsîlbarîya pergala siyasî- xistin rojeva nîqaşa umûmî ya amerîkî û xwe wek *"tevgera tevgeran"* (11) bi rê xist, ku dikare balê bikişîne ser çalakîyên ku bê piştgirîya wê, xwedî bandordarîyeke weha nedibûn.

Her çi xwendekarên şîlîyî, ew bi giranî li ser zanîngeh û daxwaza perwerdeya belaş rawestîyan û weha tevgereke klasîktir saz kir. Tevî ku ew li dij encamên siyaseteke nûlîberal a hemanreng -Pinochet zanîngeha şîlîyî guherand û weha perwerde kir mulkekî giranbiha-, tevgera wan bêhtir bi rêxistî ye, li gel hilbijartin û rayedarên temsîlbar û rewa.

Tevî van cudatîyan, xalên hevbeş yên bi OWSê re jî hene. Zimanekî hevpar gav bi gav tê bi kar anîn. *"Di ber kampanyaya xwe re, me dirûşma OWSê "Em % 99 in" bi kar anî"*, **Gabriel Boric**ê serokê nû yê *Federasyona Xwendekarên Zanîngeha Şîlîyê* (FECH), li gel tevgera Afirandina Çepê (**Creando Izquierda**), dibêje. Ew xwendekarê hiqûqê ye û ilhama xwe ji **Antonio Gramsci**, **Toni Negri** yan **Slavoj Zizek** werdigire, axaftina wî ya siyasî jî dîyar e: *"Em çepgir in, lê em dibêjin ku di sedsala 20ê de, çep tek çû. Dinyaya xeyalên wê pêk nehat. Divê em ji van xeletîyan dersê bistînin"*. Li vê meha kanûna 2011ê, piştî saleke çalakîyan û nêzî hatina tatîlên havînê, ew bi israr dibêje: *"Tevgera xwendekaran xilas nebû. Em bi ser neketin, lê em têk jî neçûn"*. Jixwe, xwendekaran weha ji havîna Şîlîyê sûd wergirt ku stratejîyên nû saz bikin: Ew ê neteweyîkirina serêkanîyên xwezayî û reformeke bacî ya ji bo fînansekirina zanîngehan pêşnîyar bikin.

* Rojnamevan.

1 Ji bo nivîsandina vê meqaleyê, nîvîskar çû Londra, New York, Nashville, Santîago ya Şîlîyê û Madrîdê

2 Wargeha Saint-Paulê di 28ê sibata 2012ê de hat valakirin

3 **François Cusset**, "Quand le peuple se rebelle / dema ku gel serî radike", *Le Monde*, 5 mijdar 2011

4 Victor de la Fuente, "En finir (vraiment) avec l'ère Pinochet /Bi rastî dawîanîna li serdema Pinochet", *La valise diplomatique*, 24 tebax 2011

5 **Raúl Guillén**, "Alchimistes de la Puerta del Sol / Sîmyagerê Puerta del Solê", *Le Monde diplomatique*, tîrmeh 2011

6 **José Luis Moreno Pestaña**, "Le mouvement du 15-M: social et "libéral", générationnel et "assembléiste" – Un témoignage /Tevgera 15-M: civakî û "lîberal", nifşî û 'meclisgir' - Şahidîyek", *Savoir/Agir*, Bellecombe-en-Bauges, hjm. 17, îlon 2011

7 **Yaël Lerer**, "Indignation (sélective) dans les rues d'Israël / Nerazîbûn (a neqandî) li kolanên Îsraîlê", *Le Monde diplomatique*, îlon 2011

8 **Keith Gessen**, Astra Taylor, Eli Schmitt, Nikil Saval, Sarah Resnick, Sarah Leonard, Mark Greif û Carla Blumenkranz (brv.), *Occupy ! Scenes from Occupied America*, Verso, New York, 2011

9 **Robert W. McChesney**, **John Nichols**, "Aux Etats-Unis, médias, pouvoir et argent achèvent leur fusion / Li dewletên Yekbûyî çapemenî, desthilatdarî û pere di nav hev de heliyanê", *Le Monde diplomatique*, tebax 2011

10 **Olivier Cyran**, "Dans le Mississippi, les fractures de l'Amérique profonde / Li Mississippîyê derzên Amerîkaya Kûr", *Le Monde diplomatique*, nîsan 2012

11 **Prachi Patankar û Ahilan Kadirgamar**, "Wither Wall Street: The Challenge of the Occupy Movement", 2 çile 2012

Wergera ji fransî: Simko Destan

# Di siyasetê de xuypakîyek

Heya niha tevahîya stratejîya sosyalîst li ser hîpoteza ku hejmara proleteran bilind dibe û sinifa navcîn kêm dibe dihat saz kirin. Demeke dirêj, ev hîpotez bi rastîyê re li hev dihat. Ew êdî li rastîyê nayê. Li merhaleyeke eşkere ya bipêşketina welatên kapîtalîst, serûbinbûneke bi rastî diqewime: Hejmara proleteran kêm dibe û ya sinifa navîn bilind dibe."

**Henri de Man**, *La Vie socialiste* (Jîyana Sosyalîst), 4 Çirîya Paşîn 1933

"Ev endamên koma navîn in ên ku para wan a pir mezin ji mûçegir, bispor, agahdar, perwerdekirîyan pêk tê, banê civaka me çêdikin. Bi xêra armancên înterjenerasyonî [di navbera nifşan de] yên ew li dûv in, ew di civakê de îstîqrarê misoger dikin. Ev armanc ji hêlekê ve xwe dispêrin ragihandina mîrasa çandî û perwerdeyî ya didin zarokên xwe û ji hêleke din ve jî mîrasa milk û carnan malî ya didin zarokên xwe, ev jî girêdayîbûna wan a bi "ekonomîya bazarê" ve nîşan dide."

**Dominique Strauss-Khan**, *La Flamme et la Cendre* (Pêt û Xwelî), Grasset, Paris, 2002

"Berpirsîyarên polîtîk dizanin, ger ku wan bixapînin [sinifên navîn] ew nikarin bên hilbijartin û gava bi tenê berê xwe bidin feqîran, yên ku îro hindikayî ne, hingê jî ew mehkûmî têkçûnê ne. (…) Hingê em dikarin bibêjin ku Amerîkaya Latîn li armanca piranîyeke -biçûk lê her mezin dibe- mirovên serkeftî, reqabetkar û hem jî azwerîyên wan kozmopolît hene".

**Jorge Castaneda**, wezîrê kevin ê Meksîyayê yê Karên Derve û entelektuelê bandordar, *International Herald Tribune*, 12.12.2011

"Ez sedema nû ya civakê ya ku şoreşê jî wisa kir ji dil diparêzim, wekî prensîba yekem, wekhevîya li hember rêzikan û sinifên navîn ji bo regeza bingeh".

**François Guizot**, Mémoire pour servir *à l'histoire de mon temps, tome 1, Michel Lévy, Paris, 1858*

"Ramana sinifên navîn, ji ramana sinifên din bêhtir, pir caran ji rastîyekê bêhtir dişibe daxwaza hin beş û kategorîyên mirovan".

**François Simiand**, Cours d'économie politique (Dersa ekonomîya polîtîk), Domat, Paris, 1929

Sedaneya amerîkî yên ku wisa tên hesibandin ku %1ê wan amerîkîyên herî dewlemend in: 13.

**Harper**'s Index, Rêbendan 2012

"Di dawîya 1950yê de, ciwan ji bo bidestxistinê bûn bazareke nû, şansekî mezin a reklamê. Têgeha nûgihiştîyan ji reklamê tê, avakirineke pir bêedeb e, lewre hema bi vî awayî deqkirina wan kir ku ciwanên di vî temenî de îdîa bikin ew nûgihîştî ne. Vê yekê bazarek ne tenê ji bo kinc û kozmetîkan, lêbelê ji bo muzîk, edebîyat û tiştên din jî afirand. Selikeke bazarê. Ev bû pêtek, pêleke mezin a balixîyê. Beatlemaniya û dînîtîya li dora Stonesê ji wir tên".

**Keith Richard**, *Life* (Jîyan), Robert Laffont, Paris, 2010

"Awayên serkarîya bêpîvan alîkarî kir ji bo balkişandina ser [%1ê amerîkîyên herî dewlemend] balafirên taybet, qesr û qonaxên 5 000 m2, şîrînayîyên bi çikolata ku bi toza pudrayê hatine xemilandin ên bi 25 000 dolaran. Lê demeke dirêj bû ku sinifa navîn dikarîbû kredîyên pêwîst bicivînin ji bo ku xercên unîversîteyan bidin û ji bo başkirina rewşa malê ya car caran, ev daxwaza îtîrazê derxist holê. Piştre di 2007-2008ê de îflasa sermayedaran dest pê kir, depresyona aborî ya mezin li pey wê hat û %1ê ku me teserifên teqawidîya xwe, ekonomîya xwe û sîstema xwe ya polîtîk emanetî wê kiribû, wekî çeteyeke bêberpirsîyarî û narsîsên çavbirçî, belkî jî sosyopat, tevgerîya. Wisa dîyar dibe ku heya van mehên dawîyê, %99ê ji bo bikin ku "nasnameya wan a berjewendîyê" bibe xwedî qîmet hê komek pêk nedianîn. *(…)* Lê Occupy dê nekarîya bi gewde bibûya heke beşeke mezin a %99'ê dest bi dîtina pêwendîyên giştî nekirina, yan jî qe nebe hin cudatîyên di nav wan de heyî daneynana alîyekî."

**Çîna navîn bingeha herî ewle ya organîzasyona baş ya civakê ye?**
Barbara Ehrenreich û John Ehrenreich, ji ber wan hatiye girtin di *D'Athènes à Wall Street. Indig*nés, échos d'une insurrection des consciences (ji Atînayê heta bi Wall Streetê. Hêrsbûyîyên, dengvedanên serîhildaneke wijdanan), Zones/La Découverte, Paris, 2012

"Erê rast e ku sinifa navîn bingeha herî ewle ya organîzasyoneke baş a civakê ye: Rast e heke giranîya vê sinifê ji herduyên di ser hev de bêhtir be, an jî qe nebe yeko yeko ji herduyan bêhtir be, dê bajarek bivê nevê bibe xwedîyê birêveberîyeka baş. Ev ew sinif e ku bi sekinîna li cihekî dê tewazina siyasî xera bike û dê pêşîyê li serdestbûna tundrewên herdu alîyan bigire. Bi vê rihetîya sinifa navîn, va ye rêveber dê bextê xweş ê dewletê misoger bikin. Heke birêveberî di bin destê wan kesan de be ên ku pir zêde ne, an jî zêde kêm in, an dê demagojîyeke bêtirs, an jî dê olîgarşîyeke despotîk çêbe. Sinifa navîn a ku kêm dikeve ber van tundrewîyan hemûyan ji bo demokrasîyan bixwebarîyekê û temenekî ku rejîma olîgarşîk ne xwedîya wê ye, misoger dike."

**Aristote**, *Politique*, IV, 11, ji hêla welatîyê Champagneê Antoine Bailleul ve hatiye wergerandin, Paris, 1797

"Civaka Fransayê û bi gelemperî civaka Ewropayê, ji sê sinifan pêk tê: proleterya, sinifa navîn û sinifa kapîtalîst. (…)
Sinifa navîn ji van pêk tê ku xwedî kapîtaleke dîyar in, bêhtir bi tevlîbûna xwe ya çalakîya aborî debara xwe dikin. Ev in: Peyanerên (miteşebis) biçûk, bazirganên biçûk, pîşesazên biçûk, dikandarên biçûk ên ku şaxên xwe berdane jêr, ên ku xwedî muşteriyên dîyar in. (…) di nav sinifa navîn de ew cotkar hemû hene, yên ku xwedî erdekî ne, yê ku têra wan û malbata wan dike ku pê debara xwe bikin. (…)
Bi kurtasî, sinifa navîn hemû karkerên ku heqdestê xwe digirin ji bo ku hinek tesarûfê bikin û bi dilrihetî li benda cihekî nû bin, hemû endamên karên lîberal û rêveberîyên gelemperîyê yên ku bi van karan re bûne wekhev dihewîne. Ev mirov hemû ileh ne wekî peyanerên biçûk in, ên halê hazir xwedî kapîtalekê; kapîtala wan pirî caran bi xercên perwerdehî re qediyaye, lê ev perwerdehî bi xwe nûnerîya wan dike. Berevajî proleteryayê, bi awira aborî xisletên sinifa navîn ewlehîyeke nisbî ya jîyanê û serxwebûneke têra xwe fireh in".

**Jean Jaurès**, La Dépêche de Toulouse/Nameya fermî ya ji Toulouseê, 3 Adar 1889

"Pêşveçûna ku berdewam dike, dûr e ji wê ku du sinifan – burjûwazî û proleterya- bîne hemberî hev, ev herdu sinifên ku ji binî de dijber û dijminên hev in û xwe bi bipêşveçûna komeke mezin a navendî, ya xetên wê kêm jihevqutbûyî û zîrek e, bi firehbûna wê ya hejmarî ya bi lez û bez, bi girêdanên xwe yên bi her kategorîyên din ên civakê re, bi wesfa xwe ya vekirî ya ku pê misoger dike ku bi nirxên modern ên ku ew hilgirên wan e, bi rihetî di nav xwe de her diçe bêhtir û bi awayekî aştîxwaz li tevahîya civaka fransî ya vebe û wê bigire nav xwe".

**Valéry Giscard d'Estaing**, Démocratie française (Demokrasîya Fransî), Fayard, Paris, 1976

Kurê burjûwazîya ji rêzê
Kurê Yezdan dizane ku
Hûn hemû destkeftîyek in
Nexasim mafê bêdengmayîna we
Ji bo ku bipeyive li ser navê
Ciwanên karker
b… yên biçûk ên belengaz
Ciwanên karker
Bêhişên biçûk ên belengaz
(…)
Dema ku wexta hêrsên we
Dema ku kewirînên we
Ne bi tenê demkî bin
Û dîmenên we yên xeyalî yên kevin
Kurên burjûwazîyê yên ji rêzê
Yên ku em derheqê we de dizanin
Hûn ê wekî bavên xwe deng bidin
b… yên biçûk ên belengaz
Hûn ê wekî bavên xwe hûn deng bidin
Bêhişên biçûk ên belengaz
(…)
Ger bavê we wisa dide nişan ku
Sermayeyê dibire
Ger hîleyên we yên biçûk
Êdî xweş nazivirin
Heke ez ê we serê we diêşîne
Ji mentiqê bêhtir
Li fabrîkayê cih hene
Bêhişên biçûk ên belengaz
Li fabrîkayê cih hene
Bêhişên biçûk ên belengaz
Jean Ferrat, b… yên biçûk ên belengaz


Hinek ji van ji meqaleyên li jêr hatine girtin:
**Christophe Charles**, "Discours pluriel et histoire singulière/ Guftûgoya pirjimar û dîroka yekjimar", Revue d'histoire moderne et contemporaine, no: 50-4 (Kovara Dîroka Modern û Nûjen), 2003.
**Klaus-Peter Sick**, "Le concept de classes moyennes: notion sociologique ou slogan politique ? / Têgîna sinifên navîn: Têgeha sosyolojîk an slogana polîtîk?", Vingtième siècle / Sedsala Bîstem, berg 37, 1993.

Wergera ji fransî: Sevda Orak










ÇILE 1997

PÊNCÎ SAL PIŞTÎ TÊKÇÛNA KOMARA KURDÎ

# Bîranîna xemgîn ya Mehabadê

JAN PIRUZ

Mehabad, bajarê lanetkirî yê Iranê, çi di dema îslamîstan de û çi jî di dema şah de, ev bajar ji ber ku carekê piştî bidawîhatina Şerê Cîhanê yê Duyem, cesaret kir xwe wek komareke otonom ya kurdî şanî da, ev bajarê ku bi nifûsa xwe gundî ye û ji şêst hezar kesî zêdetir e ji wê rojê ve di bin çav û kontrola leşgerî de ye. Ji alî têkilîyên birêvebirinê ve, ji herêma Kurdistanê hatîye dûrxistin, di warê aborîyê de hatîye fetisandin, di warê çandî de hatîye ji birkirin, ji dîrok û nasnameya xwe hatîye bêparkirin. Ev bajarê ku sembola serxwebûna gelê kurd e, îro tenê mînakeke tarî ya neheqî û zilma rojane, ya li ser gelê kurdên Îranê û herweha yên din e jî.

Mehabad, dilê Komara Kurdistana jiyankurt ku di 22.01.1946ê de, li Iranê hate damezirandin û di meha 12an a heman salê de, ji alî artêşa Şah Muhamed Reza ve hate belavkirin. Mehabad ji tixûbên Iraqê yên rojhilat sed kilometre dûr dikeve, nîv sedsal bi şûn de, ji vî warê ku di bîr û xeyalên kurdan de cîhekî gelek girîng û kûr digire çi maye?

Mîlîtarîzasyona navçeyê li ber çavan e û mefûma dûrbûnê bê mane dihêle. Zehmetîya kontrola navçeyê, ji ber dîyar, newal û çîyayên wê, Tehranê aciz dike û dixwaze hemû herêmê bike *"zonên qedexekirî yên ewle"* ji bo bibe ***"no man's land",*** herêmên bê kes û dorgirtî û di bin kontrolê de. Mehabad tevlî der û dora xwe şêst hezar kes lê dijîn, (di 1946ê de, şazdeh hezar), Li gel hemû gundên xwe "şarestan" (wîlayet) dibe sed û deh hezar, ger mirov bi seransera Îranê re bide ber hev pêşdeçûneke demografîk têra xwe kêm e (1993, ji % 3,5). Lê Kurdistan di bin tesîra birînên berê de maye.

Parçekirina îdarî ya Mehabadê paradoksa yekem e, bi zanebûn ev paytexta kevn ya herêma Kurdistanê dabeş kirin û bajar bi herêma Kurdistanê ve girênedan, bi Azerbeycana Rojava ve girêdan. Berpirsîyarên herêmê, Kurdistana Îranê (1) hîn bêtir ber bi bajarê Senendecê (***Sine***ya berê) ve dikşînin, ev bajar dikeve başûrê Mehabadê û 280 km jê dûr e. Çend deng û tevgerên lokal, rabûn û xwestin da ku bajar wek struktûra salên 30yî dîsa bi herêma Kurdistanê ve bê girêdan, an jî Kurdistanek nûh bête avakirin û Mehabad bibe navenda vê navçeya îdarî. Lê tu pere nekir, karîna merkezî ya Îranê çi di bin hukmê şah de û çi jî di bin hukmê melayan de, naxwazin sifateke îdarî bi navê Kurdistanê ve girêdin, ev sifat ya herî rast e ku hemû herêmên kurd û yên kurdîaxêf temsîl bike.

Wekî din, Mehabad, bi farisî "bajarê heyvê", navek e ku ji alî Reza şah ve hatibû diyarkirin, ev polîtîka berfireh ya toponîmîk ango farisîkirina navên cîh, gund û bajarên kurdan, şêst sal berê dest pê kir. Navê berê Sawucbûlak e, bi eslê xwe bi tirkî bû. Bajar di sedsala 17an de ji alî sultanekî Qecarî ve hate damezirandin, îro jî mozoleya wî li goristana nû bi cîh e. Ji bo desthilatdarîya îranî ciyê xemgînîyê bû ku nikarîbûn navekî antîk ji bo Mehabadê peyda bikin da ku bi nasnameya persî ve girê bidin.

Bajar di kûrana (hawza) qûntara çîyayê Zagrosê de bi cîh bûye ku heta 2000 metre bilind in. Ev rewş bajarvanan hinekî îzole dike û zivistanan dijwar dide derbaskirin. Li Bakur û Rojhelat, dîmenên yek ji çîyan dema ku bi xêza Spêdê ve tê ber hev, wêneyekî gelek balkêş peyda dike. Navê wî jî "qûrtqûlak" e, bi tirkî texmînî maneya wê ev e: "guhê gur", dema ku mirov li jora wî digere û bala xwe didê, mirov dibîne ku her der hatîye kolandin ji bo sedemên leşkerî û bi vî awayî bajar di bin kontrola herdayîm de dimîne. Ne bawerî, şuphe berdewam e. Hawirdorê van avahîyên leşkerî bi mayinan hatine dagirtin û qezayên rojane di nav miletekî ku terorîze bûye, kêm nabin. Ev jî ne xema kesî ye.

## Bibîranîn qedexe ye

Ji bo ku mirov emîn be, têr dike ku mirov serî li nexweşxaneya Mehabadê xe. Ev nexweşxane ji alî şahê dawîn ve hatibû avakirin, piştî şoreşa îslamî, navê wê kirin Ayetûllah Xomeynî. Qezezade ku piranîya wan şivan, zarok û seyranger in, bi şêweyekî, yek li ser ê din û bê duzen û di nav gemarê de, ev rewş, bixwe hinek bûyerên din yên xemgîn ku tecîlkirîne tînin bîra mirovî. Di dema şerê Îran û Iraqê de, Mehabad ji bîst rojan zêdetir ji alî arteşa Îranê ve hate bombe kirin, wek sedem jî, bicîhbûna peşmergeyên ***PDK-Î*** û ***Mucahîdînên*** **Mesûd Recawî** şanî didan. Ev tevger, bi Iraqê re qismî hevkarîya wan heye. Di dema ablûkaya bajêr û avêtinên top û qezîfan de, kêsên ku fersend nedîtin birevin, mecbûr diman ku xwe di kozikên binê erdê de veşêrin. Gel bi rîskên jîyana xwe derdiketin da ku bikaribin xwarinê peyda bikin, li gor hesaban 1 500 sîvîl hatine kuştin, di dema van operasyonên leskerî de, rewşeke gelek nêzî şerê hundurîn peyda bû. Hedefên serokên islamî yên Îranî,eşkere û navdar bûn: *"serê marê kurd Mehabad e, pêwist e bêt eciqandin"* vê bê ûjdanîya korane, şopa xwe û birîn hîşt.

Li gel 60 000 bajarî, hinekî dijwar e ku mirov bikaribe bibêje ku Mehabad bi temamî bajar e, şekl û şemala bajêr hîn bêtir dişibe gundekî mezin, bi bazara xwe hîn bêtir bi "jîngeheke" cotkarî û ziraetê, dîmenên gundan diyar dike. Di dema şahîya Pehlewî de û herweha di dema rejîma Komara îslamîst de, tu kesî hêl (hêz) neda ku bingeha çalakîyên endustrîyel dirust bike, mirov difikire ku bi zanebûn ev li dar xistin da ku bajêr di halê xwe de bifetisînin. Sozên ku hatibûn dayîn ji alî serokkomar **Alî Ekber Refsancanî**, dema ku Mehabad di Tebaxa 1995ê de zîyaret kiribû, wek sozek li hewa û mirî ma.

Çalakîyên çandinî û zîraetê, roj bi roj hesastir dibe, ji ber ku têra xwe bazarê peyda nake, her çiqas baraja Mehabadê ku di salên 60ê de ji alî Yûgoslavîyayê ve hatibû avakirin, gelek feydeya wê ji çandinî û avdanîyê re çê bû, bi vê avê titûn, baxçeyên sebzeyan an jî binerdikên ji bo şekir hatin avdan, li gel vê jî, berhemên wê ji bo navçeyê têr nedikir. Sanayî ya ku berhemên çandinî û ziraetê bê kar dike li herêmên din hatin avakirin, gelê Mehabadê ji vî awayî gelek hêvîşkestî man û bawer dikirin ku hatine ji bîrkirin. Avahîya herî bilind sîloya genim ku ji dema Sovyetê de maye wek xeyaletekê bi ser bajêr de xûz dibe û dibe îşareta xizanîya şênîyên bajêr.

Kêmasîya aborîyê, ciwanên kurd mecbûr dike ku derkevin dervayî navçeyê, bidûrketina xortan ji herêmên wan, bi wext ve wan hêdî hêdî ji çand û adetên wan jî dûr dixe, ji ber çanda serdest ya farisî ciwan dikevin bin talûkeya asîmîlasyoneke gelek mezin. Li Mehabadê, ji demek nêz ve, zanîngeha "unîversîteya azad ya îslamîk" hatîye avakirin, ji bajarên der û dorê yên cîran jî xwendevanan dicivîne, bi taybetî ji bajarê Ûrmîyeyê ku bixwe wek paytexta Azerbeycana Rojava tê qebûlkirin. Ev dezgeh, dezgehek e şexsî ye, bi pergala xwe ya îslamîst, têra xwe biha ye, hemû perwerdeya wê li ser bingeha mezheba îslama şîî ye, ew jî di civata îranî de piranîyeke mezin pêk tîne, halbûkî Kurdistanî bi piranî sûnî ne.(2) Ji bo vê yekê ev dibe sedemên gelek provokasyon û pevçûnan.

Hîç pêwistî nîne ku mirov bibêje ku tu bîranîn an jî xwepêşandanên gelêrî an fermî ji bo bîranîna salvegera pêncî salîya Komara Kurd pîroz bikin çênebûn, ji ber ku bîranînên eşkere qedexe ne. Her weha xebatên di derheqa dîroka vê bûyerê de, bi temamî qedexe ne. Ger pirtûka referans ya **William Eagleton** (3) hatibe wergerandin ji bo farisî û kurdîya kurmancî bi alîkarîya dîroknasekî herêmî, belavkirina wê ji sala 1982ê ve qedexe ye, şahidên zindî yên Komarê dema -ger ji alî rejîmê ve nîn be-, bi hemdê xwe hêdî hêdî holê terk dikin. Ji alîyê din, di tarîyê de, hêdî hêdî, bi sebr xebatek tê kirin da ku bikaribin van bîranînên ku hatine dizîn, taze bikin û ji nûve jîndar bikin, herweha gora (tirba) her sê serokên dîrokî yên Komara Kurd, bi taybetî ya serokkomar **Qazî Mihemed** ku dema leşkerên îranî ketin Mehabadê, hate bi dar ve kirin. Gora wî li goristana kevn her xuya ye. Ziyaret kirin gelek dijwar e ji ber ku der û dora wê bi têl û dîwarên bilind in, lê miqatebûna wan bi dizî çêdibe.

Meydana ku jê re ***Çarçira*** tê gotin maneya wê hîn qîmettir dibe. Ji ber ku li wê dere Qazî Mihemed di 22.01.1946ê de ***Komar*** îlan kir û dîsa li wê derê ku her sê serok di 31ê adara 1947ê de hatin bi dar de kirin. Lê belê vê carê tu avahîyên fermî bê ***Çarçira*** neman, berpirsîyarê bajêr bi awayekî zor aqilane ***Çarçira*** plan kir, da ku meydana ***Çarçira***yê bi şeklê xwe yê glover bêt bi bîr anîn.

Cîhek din yê bîranînê, li goristana nû, cîhek bi taybetî û bê destûr ji bo şexsîyet û nivîskarên ku li Mehabadê ji dayîk bûne hatîye amadekirin, gelek ji van goran ku li ser kevirên wan helbestên ku gazî serhildanan dikin, hatine gulebarankirin. Bi taybetî yek ji wan zêdetir hatibû tahrîbkirin, ku li ser wê ***"azadî"*** hatibû nivîsîn.

Gelo kurdbûn li Mehabadê tê çi maneyê? Tecrûbe şanî didin ku kurdbûn û hela parastina kurdbûnê têra xwe talûke ye. Di bin vê karîna bê qanûnî de, pêwîst e ji bo xwe îfadekirinê rêyên duyem bên dîtin, rêyên ku du mane lê dikevin dibe awayê xwe îfadekirinê, durûtî û xapandin dibe jîyana rojane. Tirsa di zik de, bi ser de, tirsa polîs û leşkeran. Ger axaftina kurdî li cîhên gelêrî tê tehamûlkirin, xebatên çandî yên bi perspektîf berpirsîyaran gelek aciz dike, bi taybetî di warê çapemenî û weşanan de. Kesek ku rîsk bigire û bi kurdî berhemekê biweşîne, derhal tê mecbûrkirin ku Îranê terk bike û bibe penaber an jî tê sirgûnkirin.

Yekser piştî soreşa îslamî, herdû salên destpêkê partîyên sîyasî, rêxistin, tevger, rojname û kovarên kurdî pêşketinên mezin pêkanîn. Ev demên zêrîn hinek derbasbûn, li paş man. Ji nav van xebatan tenê du kovarên kurdî îro jiyana xwe berdewam dikin, lê belê tenê di warê edebî de. Yek ji wan SIRWE ku li Ûrmîyeyê dertê, ya din, AWÊNE li Tehranê dertê, yek ji wan jî li Mehabad dernayê. Wekî din weşanên bi kurdî yên radyo û televîzyonê tenê nûçe û bernameyên fermî ku bi rejîmê ve bi hişkayî girêdayî ne, tên wergerandin û tercumekirin. Ev weşan ji alî gel ve gelek kêm tên guhdarîkirin. Ji ber kêmasîya medya şexsî, kesên ku halxweş in ji xwe re antênên parabolîk (sêlik) peyda dikin, kêfa rêjîmê hîç ji vê rewşê re nayê, tehamula pasdaran (parazgerên şorêşa îslamî) hîç nîne, wan dişkînin an jî dest datînin ser wan. Li hember van nerehetî û zextên pasdaran, gel li gor xwe tedbîran digirin û ji bo ku bikaribin tîbûna xwe ya agahdarîyên navnetewî yên azad bişkînin, antenên xwe bi şev derdixin.

Bi vî awayî bi qasî pêncî malbat li hev dicivin û bi hev re li kanala kurdî ya satelît MED-TV ku ji Londonê weşanê dike mêze dikin. Bi vî şêweyî ruhê pankurdî bi bîranîna û li ser hîmên Komara Mehabadê ji nûve şîn dibe. Li alîyê din hemû hewldanên ronesansa polîtîk bi awayekî barbarî tên şikandin. ***Partîya Demokrata Kurdistana Îranê*** (PDK-Îran) li Mehabadê hatîye damezirandin, ji alî rejîmê ve wek klîkeke terorîst û li hember şoreşê tê nasîn û li ser vê bingehê mi'amele bi endamên wan re tê meşandin. Zîndankirinên kêfî, revandin, îşkence kirin û kuştin, çalakîyên rojane ne. Hemû înîsîyatîfên sivîl bi çi şêweyî dibe bila bibe, herçiqas di çarçeweya legal ya îslamî de be jî, ji hêla Tehranê ve derhal der û dor lê tê girtin û tê qedexe kirin. Pêncî sal bi şûn de jî, kurdên Mehabadê hîna cirma cesareta salên borî didin.

1 Kurdistan, herêma ku kurd li wê derê bi cîh in û dijîn. Di navbeyna Tirkîye, Îran û Iraqê de dabeşkirî ye û kurdên her parçeyî ji bo bi destxistina mafên xwe li ber xwe didin

2 Li bakurê Iranê, kurdên şîî hene, ji wan re "ehlel heq" tê gotin. Li Îranê hejmara xiristîyanan gelek kêm e

Wergera ji fransî: Vehbi Aydin



www.arsivakurdi.org



KANÛN 1997

# Tirk, li Kurdistanê di herîyê de çikîyan

ALAIN GRESH

Şerê ku li Rojhelat û başûrê Anatolîyê ji panzde salan vir de berdewam e, beşek mezin yên ekonomîya Tirkîyê dadiqurtîne, hejmara leşkerên ku li herêmê tevdigerin di navbeyna 200 000 û 300 000 de ne. Nêzî nîvîyên hemû hêjmara leşkerên tirk in. Ev bûyer tirsa jihevketina Tirkîyê zêdetir dike, herçiqas di salên 80ê de, bi înîsîyatîfa **Turgut Özal** pirsgirêka kurdan hate munaqeşekirin jî, îro mesele cardin paşde diçe û babeta stratejîya klasîk ya kevn digire: pêşvexistina aborî û darê zextê.

Li gor serokwezîr **Mesût Yilmaz**, "pirsgirêk ji ber du sedeman berdewam e, yek jê aborî ya din civakî ye; me, projeyên herî mezin yên pêşvebirina herêmên Başûr û Rojava - daye ber xwe, navê vê projeyê : Projeya Bakûr û Rojava ya Anatolîyê yê (GAP), di vê projê de 35 baraj û navendên hîdrolîk hene. Li alîyê din hukûmeta min hêl dide ku li herêmê îmkanên peydakirina kar zêde bikin û bibin alîkar ku karmend bikaribin bi cîh bibin, bi vê projeyê axa belaş li kesên ku ciyê kar ava bikin, peyda bikin, wan deh salan ji baca dewletê muaf bikin. Her weha buhayê elektrîkê daxin nîvî û hwd." Sebebên serhildanên kurdan ne daxwazên mafên çandî û ne jî netewî ne? "xwestinên mafên çandî û netewî xapandinên derva ne".

Li gel serkeftinên rastîn, di "şerê li hember terorîzmê" de, tu kesek li Ankarayê bawer nake ku şer dê bi dawî bê, ji ber ku piştî şerê Kendavê tekoşîn ber bi bakurê Iraqê ve dikişe, li wê derê bi alîkarîya hêzên li hember Seddam yên welatên Rojava, di bin kontrola Partîya Demokrata Kurdistanê (PDK) ya birêz M. Barzanî û Yekîtiya Niştimanî Kurdistan (YNK) ya birêz Celal Talabanî, herêmên otonom tên avakirin. Ji havîna 1996ê vir de, ji ber şerê birakujî ya di navbêra herdû rêxistinan de, li herêmê tu otorîte nemabû, ji ber vê yekê jî, ji derve de mudaxeleya Tehran û Ankarayê bi hêsanî pêkdihat. Herweha PKK jî ji ber heman sedeman hêzên xwe li wir xurt kir.

Tirkîye, hinek jî deynê encamên polîtîka amerîkî ku Iraq di ber sînorên wî de parçe kir, dide. Ev parçekirin di tixûbên Tirkîyeyê de, jê re bû wek birîneke nêm (îltihab) girtî. Dîplomatekî tirk weha dibêje "Em di nav dîlemayeke sergêjî û bê çareserî de ne". Ger şerê KDP û YNKê bisekine, dê yekîtîya kurdan çêbibe, ev jî hîç li hesabê me nayê, ger şer berdewam be, ku nuha rewş ev e, PKK ji rewşê qawet digire û hêzên xwe li herêmê xurt dike, ev jî li hesabê me nayê. Ji ber wê jî em dixwazin ku Bexda li herêmê ji nûve kontrolê bigire destê xwe, lê belê Amerîka bi herhalî li hember vê fikrê ye." Halbûkî ji meha 10ê ve ye herdû partîyên kurdan hêldidin ku bi hukûmeta merkezî ya Seddam Husseyîn re bazaran bikin...

Di vî halî de, dimîne ku herêm bêt dagirkirin. Îsal, artêşa tirk du caran êriş anîn ser Kurdistana Iraqê (ji 1984ê vir de, çend dehcar berê jî êriş kiribûn), Di van êrişan de, hercar bi deh hezaran leşkerên xwe bi kar anîbûn, ya dawîn gulana borî û ya nuha ji meha îlonê û vir de. Leşker bi qasî 200 km bi sînor ve kişîyan heta ku başûrê Hewlêrê derbas kirin û gehiştin tixûbên YNKê û li hember wan şerê çekdarî pêk anîn. Bi taybetî ji havîna borî û vir de, ***erkanî giştî*** qerar da ku qerargehên daîmî li wir bi cîh bike. Yek ji wan li ber sînorên Tirkîyeyê, kontrola sînorên Sûrîye û Iraqê li ser axa Iraqê çêdike.

Di çirîya pêşîna 1997ê de, rojnameya tirkî Hürriyetê qebûl dikir ku, li gor agahdarîyên fermî heşt hezar leşkerên tirkan li alîyên din, di navçeyeke tampon de bi cîh bûne. Ev navçe bi kûrahîya xwe 15 km ye û bi dirêjahîya xwe 330 km ye, di vê rewşê de, di navbeyna herdû dewletan de sînor namînin. "Bajarên kurd", hinek berpirsîyar difikirin ku hemû kesên ku koçber bûne, wan li cîhên mezin bicivînin, ev rewş, bê hemd gundên ku ji alî amerîkîyê ve li Vietnamê gîhandibûn ser hev ji bo ku hêsantir bikaribin şerê wan bikin bi tahlî tîne bîra mirovî.

Li gor berspirsîyarên kurdan, hevkarên Tirkîyeyê PDK jî di nav de, li gel serokên Sûrîyeyê difikirin ku Ankarayê hê jî dev ji xwestekên xwe yên kevn yên li ser bajarên zengîn yên neftê Kerkûk û Mûsûlê bernedaye, çend beyanên serokkomarê kevn Turgut Özal jî ev tirs hinekî zêdetir kirin. Çend sed hezar turkmenên ku mîlîsên wan ji alî Ankarayê ve tên kêdîkirin, li hember kurdan wek hêzên tampon tên qebûlkirin. Çi tê gotin bila bê gotin, valatîya sîyasî ku li Kurdistanê peyda bûye îşteha Ankarayê baş dikşîne û mudaxeleyek dikare jê re bibe dafik. Ev nîyetên Ankarayê bi awayekî tevayî dikare navbeyna wan û welatên Eraban xera bike, bi taybetî jî yên Sûrîyeyê ku ji parçebûna Iraqê gelekî ditirse. Ji ber vê yêkê jî Sûrîye têkilîyên xwe bi Iraqê re, ji bihara 1997ê ve ji nûve ji çav derbasdike, Ji meha gulanê ve, heyetek di bin serokatîya Rateb El Challah de, ku mirovekî bi nav û deng e û serokîya Odeya Bazirganî ya Şamê dike çûn Bexdayê. Mehek paşê sê derîyên gûmrikê di navbeyna herdû welatan de ku ji pazde salan vir de girtî bûn, hatine vekirin. Serokkomar Esad, li ser pirsê di tîrmeha 1997ê de weha digot:" Iraq welatekî ereb e. Min xwest ez cûdayetî û ferqîyetên di navbeyna hemû terafan de ji holê rakim, bo bikaribin ji nûve hêzên xwe bikin yek (ji bo dunya ereban), lê wisa dîyar e ku ev dem hîn nehatîye. Gavên ku di warê bazirganîyê de di navbeyna herdû welatan de hatine avêtin, ji bo nuha têr dikin" (1). "Lê belê her gaveka ku di vî warî de tê avêtin, amerîkîyan gelek nerehet û bêhizûr dike" li gor agahdarîyên diplomatên Rojava ku li Şamê bi cîh in derbas dikin. Bi vî awayî Sûrîye dixwaze ji Washingtonê re bibêje ku "li herêmê divê hesabê min bê kirin û ez hêzeke giring im, ger ez bixwazim, ez dikarim tesîra blokaja li hember Bexdayê ku ji alîyê welatên Rojava hatîye rêzkirin bişkênim".


1 Agahdarîyên ku ji alî ajansa çapemenî ya misirî MENA hatine bi nav kirin û ji alî Summary of World Broadcasts, hatîye weşandin, SWP û BBC. Londra, 7/7/1997

Wergera ji fransî: Vehbi Aydin



İSMAİL ÇOBAN: **A-B-C Fatsa (Evîn-Şer-Tirs)**, boyaxa rûnî li ser tuwalê, 204 x 396 cm

## WÊNESAZÊ VÊ HEJMARÊ



### İSMAİL ÇOBAN

İsmail Çoban di 1945ê de li Çorumê ji dayik bûye, ji 12 zarokên malbateke xizan ê herî biçûk e. Di biçûktîya xwe de diçe Stenbolê, ji alikî ve li cem dukandar û terzîyan dixebite û rojnameyan difiroşe, ji alîyê din ve jî perwerdeya xwe didomîne. Bi armanca bicîhanîna îdeala xwe ya mamostetîyê di navbeyna salên 1960-65ê de li Ankarayê di *Dibistana Mamostetî ya Atatürk* de dixwîne. Îdeala xwe ya mamostetîyê bi cîh tîne, lê evîna wî ya hunerê berê wî dide rêyeke din. Dîsa vedigere Stenbolê û li wir di çapxane û kargeha grafîkê de dixebite. Di salên 1965-68ê de *Dibistana Bilind a Hunerên Bedew* dixwîne, 1968ê de ji ber sedemên dijwar yên jîyanê mecbur dimîne him ji dibistana xwe û him ji Tirkîyê dûr bikeve, İsmail Çoban tê Almanyayê û perwerdeya xwe ya hunerê li vê derê bi dawî tîne. 1971ê de li bajarê ***Wuppertal***ê bawernameya xwe digire û dest bi wênesazîyê dike.

İsmail Çoban bingeha huner û xebatên xwe li ser hîmeke pirçandîyê ava dike, ji formên ku tên nasîn û ji hunera pîyaseyê pir dûr e. Çoban ji rastîyên ku pê bawer e tu caran tawîz nedaye û xwedîyê şêwazeke bi hêz û xwerû ye.

İsmail Çoban hizirîna felsefeyê bi hostetî dinexşîne, ji bîr û bawerîyên xwe yên polîtîk jî tu caran tawîzan nade. Hunermend di wêneyên xwe de rewşa dijwar a ku mirov di jîyanê de rû bi rû dimînin, hêjayîyên mirovîyê yên di bin gefan de ne û di heman demê de bûyerên dîrokî jî dinexşîne.

Xebatên hunerî yên İsmail Çoban bi tenê bi Almanya û welatên Ewropayê re ne bi sînor e. Ew bi bawerîya hêza xwe ya hunerê Amerîka, Japonya, Kore û Azerbeycan jî di nav de li gelek welatan dersan dide, konferansan çêdike û pêşangehan vedike. Hunermend herweha di 2005ê de li Wuppertalê "*Weqfa İsmail Çoban a Piştgirîya Hunermendên Ciwan*" damezirand.

İsmail Çoban ku bê hejmar xebatên wek pêşengah, sempozyum û çalakîyên hunerî li dar xistine, li Wuppertalê dijî û xebatên xwe yên wênesazîyê û weqfê li kargeha xwe ya Wuppertalê didomîne.

İsmail Çoban armanca xwe bi van gotinan tîne ziman: **"Mirov tenê bi xwarinê najî. Huner û çand nirxên civakê ne. Huner û çand pêşengîya lihevhatina civakan dikin. Civateke bê huner û bê çand wek şorbeyeke bê xwê û bê çêj e."**

Ji bo agahdarîyên zêde li malperên **http:/www.ismailcoban.com** **http:/www.ismail-coban-stiftung.de** binêrin

www.arsivakurdi.org

Piştî darbeya eskerî ya li Malîyê birêveberê Microsoft yê Afrîkayê Şêx Mobîdo Diarra weke serokwezîr hat dest nîşan kirin. Googlea ku hin mûçegirên wê di "bihara erebî" de navdar bûn, milîtanên mafê mirovan digire kar û Wezîra Karê Derve ya amerîkî Hillary Clinton desteкê dide projeyên insanî yên ku karsazîyê û teknolojîyê têkil hev dikin: Va ye serdema dîplomasîya dîjîtal hat.

### DYA YA KU XWE KIRIYE HEVALBENDA HEM MUTEAHÎDAN HEM JÎ DEZGEHÊN HUMANÎTER, XWE DISPÊRE TEKNOLOJÎYÊN NÛ

# Dîplomasîya telefonên destan li ser rêya fethkirina xizanan e

LAURENCE ALLARD *

Saetên piştî erdheja 12ê çileya 2009ê li Haîtîyê gelek înîsîyatîfan destûr da ku nexşeyeke pêdivîyan, daxwazên alîkarîyê, bangên malbatên kesên wenda were amade kirin… **Patrick Meier** dersdar û lêkolînerê bispor e di babeta nexşekirina krîzê de, ew hingê bi bernameçêkerê kenyayî **David Kobia** re şirîkatîyê dike. **Kobia** sîstema ***Ushahidi*** damezrandibû ku armanca wê ew bû destûrê bide welatîyan ku pevçûnên piştî hilbijartinan bidin zanîn. Dîsa jî bi awayekî mirov ne li bendê, dema ku **Meier** û **Kobia** sîstemeke ***hawar***ên cihê wan tesbîtkirî [jeo-lokalîze] bi riya telefonên destan çêkir, ev amûr wê weke platformeke agahîyên lezgîn li Haîtîyê bi kêr bihata. Şirketa operator ***Digicel*** jî bi wan re tevgerîya û hejmareke ***hawar***ê ya yekane da haîtîyîyan, hejmara 4636. Bi sedan mirov wê bihatana xilas kirin.

Bi xêra xizmeta peyaman (SMS) a telefonên destan û amûra tesbîtkirina cîh, ***Ushahidi*** destûrê dide ku bersiva ***hawar***ê tevî pir pir kêm derfet û navgînan were dayîn. Ji tevahîya welêt xeber û *hawar* tên: kesên wenda, kêmbûna zad û qût yan jî ya avê li sêwîxaneyan, mirovên saxfilitî û hwd. Du rêxistinên ne hikûmetî (NGO) – *Samasource û Crowdflower* – peyamên nivîskî werdigerînin *fransî, ingilîzî* û *kreolî*, cihê wan tê tesbît kirin, agahî tên piştrast kirin û li kategorîyan tên dabeş kirin. Piştre komeke xebatê ya dilxwazan ên ku li ***Fletcher School of Law and Diplomacy a li Massachusetts***ê, devera ku **Meier** dersê dide, ev peyam li ser nexşeyekê tên weşandin. Şirketeke amerîkî ya nû dest bi kar kirî ya ku bispor e di birêvebirina agahdarîyan a rewşên krîzê de ***InSTEDD***ê pireke kontrolê ya SMSê saz kir. Bi xêra vê pira kontrolê ya SMSê Xaça Sor –belê herweha artêşa deryayî ya amerîkî jî– dikarîn bi hewarên ku rewşeke bi tehlûke radigihandin û cihê wê rewşa bi tehlûke bihisin.

Ev hevdîtina berê nedîtî ya muhendisên agahdarîyê yên kenyayî û artêşa amerîkî di warê ji nû ve ta'rîfkirina rêbazên ***Wezareta Karê Derve ya Amerîkî*** de û bi teşwîqa **Hillary Clinton**, bi roleke dîyarker rabû. Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê bêguman xwedî rêûresmeke kevin e di warê bikaranîna teknolojîyên ragihandinê de da ku ***Dengê Amerîkayê***– navê radyoya weşana navneteweyî ye ku di dema Şerê Cîhanê yê Duyem de weşana wê dest pê kiribû û armanca wê teşwîqkirina berjewendîyên amerîkî bû –biweşîne. Lê belê, van salên dawîyê *smart power* [hêza zîrek] lê veguherî tewereyeke stratejîk. Şêweyê *soft power* (hêza nerm) a **Joseph Nye** – ango bikaranîna navgînên bandorkirinê yên ne bi darê zorê, yên strukturel, çandî yan jî îdeolojîk–, ev "hêza mejî" ku sala 2004ê seroka rêxistina *Human Rights Watch*ê **Suzanne Nossel**ê teorîya wê çêkir, katalogeke amûran –yên dîplomatîk, aborî, eskerî, siyasî, legal û çandî –yên ku li her rewşê tên, pêşnîyaz dike. Di çarçoveya hevkarîyeke hatî, nû kirin a navbera dewlet, bazar û NGOyan, yan jî weqfên ji bo berjewendîyên gelemperîyê de mijar herweha teşwîqkirina şirketên amerîkî yên teknolojîya bilind e jî. Bi vê doktrînê dîplomasîya amerîkî nexwe modeleke nû ya aborî ya ku sektorên bazarê û yên ku armanca wan ne kar e, têkel hev dike, derdixe pêş, destekê didiyê.



İSMAİL ÇOBAN: **Tenêtî**, boyaxa rûnî li ser tuwalê, 206 x 196 cm

### Amûreke ji bo bihurîna ji sansûra Înternetê

Tevnên tele-ragihandina dîjîtal û seyar di nav wê de amûrên bi îmtiyaz in. Di axaftina xwe ya damezirandinê ya 15ê sibata 2011ê de **Clinton**ê îşaret bi vê yekê kir "*civaka teknîkê teknolojîya nexşeyên înteraktîf pêk anî û bi vê yekê alîkarî bi me re kir ku em pêdivîyan nas bikin û çavkanîyan dîyar bikin. Vê duşemê* [li Haîtîyê] *keçikeke 7 salî û du jin, piştî ku SMSeke hawarê şandin, ,ji bin xirbe û kavilên supermarketeke hilweşîyayî û xilyayî hatin xilas kirin. Komeke hawar û xilaskirinê ya amerîkî ew xilas kirin* ." Wezîra Karê Derve pêdivîya bi belavkirina teknolojîyên dîjîtal di nav xelkê de, da ku demokrasî û mafê mirovan bi pêş bixe, derxist pêş. Ew vê bangê dike "*hevgirtineke di navbera pîşesazî, cîhana akademîk û NGOyan de dike, da ku hewldaneke misêwa organîze bikin ya ku wê destûrê bide sûdwergirtina ji hêza teknolojîyên pevgihandin û ragihandinê, û bikaranîna wan ji bo armancên me yên dîplomatîk*". (1)


Projeya Commotion [alozî, tevlîhevî] a ku bi mîqdareke 2 mîlyon dolaran tê fînanse kirin, yek ji projeyên tîpîk ên vê nêzîkbûnê ne. Ew tevneke şaneyî ya xweser e ku prensîpên Înternetê bi kar tîne û her tişta nedarîçav jî di nav xwe de dihewîne. Ew divê destûrê bide milîtanan ku xwe ji sansura tevna Înternetê xilas bikin – li vir em tînin bîra xwe ku li Misirê di çileyê 2011ê de hema berîya ji textê desthilatdarîyê ketina **Husnî Mubarek**, Înternet hatibû qutkirin. Kesê ku li bingeha vê projeyê heyî **Sacha Meinrath** e ku bi xwe milîtanekî doza nivîsbarîyên kompûterê yên azad û azadîya dijîtal e. Ew hewl dide kompûterên *laptop* û telefonên destan yên bi *Wi-Fi* bi hev ve girêbide da ku binesazîyeke bêtêl a ragihandina daneyan a bi lez ava bike. (2) Amûrên ewlekirinê wê di vê projeyê de anonîmbûna bikarhêneran misoger bikin. Bi vî rengî, bi awayekî nakokane, kêlîya ku ***WikiLeaks*** bi korsanî kete tevna Wezareta Karê Derve ya Amerîkî, *smart diplomacy* bi pirsgirêkên "hacktîvîst" re rûbirû bû. (3)

Afganistan bû yek ji erdên pêşî ku ev tekno-dîplomasî lê hat ceribandin. Sala 2009ê li welêt hê hingê bêhtirî panzdeh mîlyon aboneyên telefonên destan hebûn, nufûsa welêt bi xwe sîh mîlyon bû. Ji sedî 65ê wan telefonên xwe ji bo şandina peyaman bi kar tînin û bêhtirî nîvê wan jî pê li radyoyê guhdarî dikin. Lê belê artêşa amerîkî herweha pê hisîya bû ku ***Talîban*** li deverên ku tevna telefonên destan lê kêm belav e, çalak in.Wê di navbera sedem û encamê de têkilîyek dît û 113 mîlyon dolar pere li bipêşxistina ragihandina sîvîl razandin, di nav vê de stratejîyeke bi rastî ya propaganda û bipêşxistina aborîyê jî hebû. Wekî din di çarçoveya şerê li dijî bertîlxwarinê de polîsê afgan êdî pereyên memûrên xwe hew pêşin dide, bi rêya navberkarîya sîstema telefonên destan M-PAISA (*nivîsa di çarçoveyê de bixwîne*) mûçeyê wan dide. (4)

Gelek aktorên pir ji hev cihê bi vî awayî înîsîyatîfên tekno-polîtîk qat bi qat zêde kirin. Em dikarin behsa bernameya *"rêyên hevrîşim ên dîjîtal"* bikin, ***Internet Bar Organization*** ev bername daye dest pê kirin. Ji sedî 85ê afganan bi xêra erd û zevîyên xwe debara xwe dikin; piştî salên şer niha lihevnekirinên cidî yên li ser xwedîtîya milkan hene. Di çarçoveya vê bernameyê de bikêrhatinên GPSyê, wêne û SMS tên bi kar anîn da ku agahîyên ewlekirî bişînin bankeyeke daneyan. Bi vî rengî kadastroyeke ferazî hat ava kirin û alîkarîyeke huqûqî tê pêşnîyaz kirin da ku lihevnekirinan girêdayî maf û huqûqa rêûresmî çareser bikin.

Carinan dibe ku *smart power* [hêza zîrek] di çavdêrîya hilbijartinan de jî bi awayekî darîçav were bi kar anîn. Li Afrîkaya jêra Sehrayê rewş ev e. Li Gîneyê ji sala 1958ê û vir ve hilbijartinên pêşî pêk hatin; sefareta Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê ya li vî welatî bi vî rengî ji bo pêkanîna sîstemeke bi navê ***"I vote, I see, I send"*** ("ez dengê xwe didim, ez dibînim, ez dişînim") destek da komîsyona hilbijartinê ya welêt. Vê bernameyê di dema dengdana 27ê hezîrana 2010ê de destûr da şandina peyamên SMSê, ev peyam girêdayî malpereke Înternetê bûn, li ser vê malperê çavdêr û dengdaran dikarî wan analîz bikin. (5) Seferate Fransayê jî bi pêkanîna navendeke çapemenîyê bûbû şirîka vê bernameyê. Çavdêrîya fermî û "ji hundir nêrîna" welatîyan (weke ***Ushahidi*** ya li Kenyayê) hevdu temam dikin, carinan jî heman platforman bi kar tînin. Sala 2010ê û sala 2012ê li Sûdanê kontrola hilbijartinan bi rêya welatîyan ji alîyê endamên Wezareta Karê Derve [ya amerîkî] ve hatin destek kirin, li alîyê din sîstemên îlhama xwe ji ***Ushahidi*** girtin li Etyopya, Misir, Tanzanya, Peravên Ivory û Lîberyayê hatin bi kar anîn. (6) Raporên hatin şandin îşaret bi hîleyan (nemumkinbûna dengdanê, nebûna belgeya dengdanê ji bo hin namzetan...) dikin, belê herweha îşaret bi nebirêkûpêkîyên dema kampanyaya hilbijartinê (tacîz, neqanûnîbûna hin kirinan, provokasyonên nijadperest...) dikin û destûrê didin agahdarkirina ji şideta piştî hilbijartinan.

Bi leza peyameke SMSeke ji telefoneke destan digihîje armanca xwe –jixwe di rewşa çavdêrîya li cihê cih de li gor kompûtereke laptop, telefoneke destan çêtir li ber destê mirovan e – û kirinên sûc li ser nexşeyekê tên nîşan kirin. Ev nêzîkatî xwe disipêre prensîpa *accountability* -ku zehmet e mirov wergerîne kurmancîyê-. Maneya siyasî ya peyvê îşaret bi berpirsîyargirtina hukûmetan bike jî, di ferhenga sosyolojîyê de *accountability* îşaret bi tevneke têgînî dike ku heqîqetbînî, darîçavî û berpirsiyarîyê bi hev ve girêdide. (7) Di vê çarçoveyê de şefafbûn encama fîlozofîyeke siyasî ye ku destûrê dide ew hêman xuya bibin ji bo ku palpiştîya peymana heqîqetbînîyê –bi maneya



İSMAİL ÇOBAN: **Mirîyên Milönönê**, boyaxa rûnî li ser tuwalê, 9 m²

# Karteke telefonên destan li şûna xelîtka pereyan

Bikaranîna telefonên destan weke navgîna peredana ewlekirî fikreke nû ya ji Kenyayê hatîye. Li wir *m-banking* (bankeya mobîl) bi salan li pêş e, destûrê dide yên herî xizan eger hesabê wan ê bankeyê nebe jî bikaribin pereyan bişînin yan jî wergirin. Li ser rêyên Kenyayê êdî em dikanokên piçûk ên rengîn ên ku kartên telefonan difiroşin, najimêrin. Ji sala 2007ê ve sîstema ***M-Pesa*** – *pesa* bi zimanê swahîlî pere ye – peredana bi telefonên destan li welêt xwe bi rêkûpêk kir. (1) Karta SIMê wezîfeya kisê pereyan û hesabê bankeyê bi hev re bi cih tîne. Lewma tevnên teleragihandinê % 60ê çarsedhezar gundên parzemînê dihewînin, ajansên bankeyan bi xwe pirî caran bi tenê li bajarên mezin hene... û bi tenê %5 ta %10ê malên afrîkî xwedîyên hesabekî bankeyê ne. (2)

Ev xizmet xwe dispêre tevneke bîstûheşt hezar wezîfedarên tesdîqkirî (nuqteyên telefonên destan ên servekirî, yan jî *call box*, dikanên piçûk...), mûçeyê wan bi xwe weke komîsyonekê [pere] li ser hesabê wan yê ***M-PESA*** tê razandin. Ji bo veguhestina pereyan bes e ku mirov biçe cem wezîfedarekî û hejmara telefonê ya kesên ku pere jê re biçin, bibêje; kesê pere jê re tên şandin bi rêya SMSekê wê bê agahdar kirin ku dikare vî pereyî ji cem firoşyanekê wezîfedar bikişîne. Di nav sê salan de 405.5 mîlyar şîlîng *(3.7 mîlyar euro, ango % 20ê Hilberîna Nesafî ya Hundir a Kenyayê)* bi vî rengî bi rêya M-PESAyê dest guhertin. Rojê 3 mîlyon dolar bi vê rêyê hatin şandin, piranîya kirarîyan(miamele) ji 30 doloran nabihurin. Li gor hin analîstan, vê herikîna pereyan a fermî destûr da ku li deverên gund û derveyî bajaran ên welêt hatina madî % 30 zêde bibe. (3)

*Komeleya Operatorên Telefonên Destan a Cîhanê* (GSMA) û *Weqfa Bill û Melinda Gates* îlham ji vê modelê girtin û li Afganistanê ji sala 2008ê ve sîstemeke dişibe *mbankingê* ya bi navê M-PAISA teşwîq dikin. Ev sîstem her diçe bêhtir derfetê dide bikaranîna bersivdêrên telefonên destan ên bi deng da ku pere werin veguhastin û şandin. Ya rastî li welatekî ku % 70yê xelkê wî nexwende ye bikaranîna SMSan ne tercîha herî baş e.

1 www.safaricom.co.ke. Weqfa Rockefeller, operatora telefonên destan **Vodafone**, herweha **Western Union** û niha jî tevna bankeya Equity hevkarên vê xizmeta pêşeng a mBankingê ne

2 Henri Tcheng, Jean-Michel Huet û Mouna Romdhane, "Les enjeux financiers de l'explosion des télécoms en Afrique subsaharienne / *Kêşeyên zehmet ên malî yên pir zêde belavbûna teleragihandina li Afrîkaya jêra Sehrayê*", Note de l'Institut français des relations internationales (IFRI), Paris-Bruxelles, çileya 2010ê

3 Consultative Group to Assist the Poor, çirîya pêşî ya 2010ê

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

mirov nikare mandel (înkar) bike ku li wir tiştek ji bo kesekî qewimî– bike, dema vê jî dike berpirsîyarîya herkesî angaje dike.

Ji Silicon Valleyê **Clinton**ê bangek li muteşebisên teknolojîyan ên li dinyayê kir: "*Lazim e mirov destekê bide kesên li pişt van amûran, ango nûker û muteşebis bixwe. Em dizanin ku gelek şefên şirketan hene ku dixwazin beşekê ji bisporîyên mûçegirên xwe bidin karê çareserkirina pirsgirêkên tevahîya dinyayê, lê belê, pirî caran ew nizanin çawa vê yekê bikin. Xala mirov bikeve nav vî karî kîjan e? Kîjan fikir wê karibe bibe xwedîya bandora herî zêde?*" (8)

## Afrîka, bazarek bi xurtî mezin dibe

Ev gengeşe derket holê digel bangeke ji bo hevkarîya di navbera dîplomat, muteşebîs û rêxistinên ku armanca wan a kara malî nîne ya ji bo destekkirina qada nûkerîya teknolojîyên mobîl, ku Afrîka nûnerîya wê dike. Gelo ev bangeke li niyeta baş e? Ne bi tenê. Piştî Asyayê, duyem bazara herêmî ya mezin Afrîka ye û li tevahîya dinyayê ya herî zêde bi lez mezin bûyî ew e, dawîya sala 2011ê hejmara girêdanan 649 mîlyon bû û çav li rê ye ku dawîya sala 2012ê hejmara aboneyan bibe 735 mîlyon, ev dane li gor rapora Komeleya Operatorên Telefonên Destan a Cîhanî (GSMA)yê û "*African Mobile Observatory Full Report 2011*"ê ne. Li gor mînaka **Google**ê ya ku li Afrîkaya Başûr û Kenyayê tevî Fondation Grameen (9) û operatora telefonên destan MTNê strukturek bipêşxistina bikaranînan – "AppLab" – pêk anî ku di vê strukturê de gelek xizmetên cihê yên teknolojîyên mobîl hatine pêkanîn: Pêşnîyazên SMSan yên ku bersivê didin pirsên derbarê tenduristîyê, yan jî cotkarîyê yên ku bi SMSê hatine şandin, yan jî ***Google Trader*** ya ku pêwendîyê di cîh de di navbera şirketên piçûk û kirîdaran de datîne.

Bi xêra pêşbazîyên mîna ***Apps4-democracy***, yên ku xwe dispêrin daneyên gelemperî yên eşkere û bi rengekî azad dikarin bên bi kar anîn yên ku hukûmet li ser malpera ***data.gov*** diweşîne, aktorên *smart power*ê hevkarên nû bi dest dixin. Jixwe li gor vê modelê tîrmeha 2010ê li Nayrobîyê musteşara dîplomasîyê û karûbarên dewletê **Judith McHale** hevrikîyeke bi navê ***Apps4Africa*** da dest pê kirin. Wê rê li ber vekir ku komek pêşnîyaz ji Kenya, Rûanda, Ûganda û Tanzanyayê derkevin holê. Pêkanîna bi ser ket *Mamabika* bû. ***Mamabika*** hêmanek e ku pêşnîyazî jinên ducanî yên li kevîyên bajêr ên Nayrobîyê dike ku neh mehan li ser hesabekî girêdayî telefona wan, pereyên xwe bidin ser hev da ku karibin li klînîkekê zarokên xwe bînin dinê. (10) Pêşbazîyên din û bernameyên ku *smart power* a "femînîst" û teknolojîk a **Clinton** pişta wan digire: ***mWomen BOP Apps Challenge*** (yan jî *TechWomen*) ku armanca wê afirandina pêkanînên taybet ên ji bo jinên li welatên xizan e. Modela wê: ***HarassMap*** ê ku sîstemeke nexşeçêkirinê ya ku bûyerên tacîzkirina cinsî û şideta di nav malê de li Misirê qeyd û rapor dike.

Gelek weqfên amerîkî ev rê dane ber xwe. Em dikarin ji xwe bipirsin ka ew xwedîyên dewreke çawa ne, dema ku hin aktorên herêmî bi gotinên stranbêjê mîlîtan ê afro-amerîkî **Gil Scott Heron** diqîrin û dibêjin: ""***The revolution will be not funded***" (11) ("*Şoreş wê neyê finanse kirin*"). Damezrênerê ***eBay***ê **Pierre Omidyar** –ê ku nêzîkbûna xwe di *Harvard Business Review* de teorîze dike (12) – weqfa ***Omidyar Network*** saz kir û vê weqfê fînansmaneke 2 mîlyon euroyî jî danî alîyekî da ku li Afrîkaya jêra Sehrayê înîsîyatîfên li ser hîmê "*teknolojîyên amûran didin welatîyan*" avabûyî teşwîq bike, li ser hukûmetan jî ferz dike hesab ji wan jî bike. NGOyeke holandî ya li Nayrobîyê a bi navê HIVOS vê fînansmanê bi rê ve dibe. Di îlona 2010ê de di civîna bilind a **Clinton** *Global Initiatove* (sala 2005ê ji alîyê serokê DYAyê berê **William Clinton** ve hat damezrandin) Weqfa Omidyar dabû zanîn ku ew 55 mîlyon daloran dide tevna *Tech for transparency* [Teknolojî ji bo şefafîyê; nota wergêr], qederê nîvê van pereyan jî ji bo nûkirina di qada teknolojîyên mobîl de. Ev weqf herweha piştgirîya FrontlineSMSê dike, ku bi xwe pireke SMSan a ji bo bihevvegirêdana ragihandinê ya NGOyan e û girêdana li ser platforma ***Ushahidi*** bi bîr dixe.

Ji bo **Bill Gates**ê damezrênerê ***Microsoft***ê û aktorê herî darîçav ê li cîhana *Teknofîlantrofî* [fîlozofîya bê berjewendîyên şexsî başkirina rewşa mirovahîyê bi riya teknolojîyê, nota wergêr], pir berdar nîne mirov kompûteran li welatên xizan bifiroşe, lê belê ferz e ku mirov telefonên destan bi kar bînin, yên ku destûrê didin mirov ji mirinê werin xilas kirin. (13) Ji ber vê jî ew dikeve nav qada *mHealth* (bikaranîna telefonên destan di qada tenduristîyê de), bi organîzekirina pêşbazîyên ji bo bernameyên nivîsbarîyê yên têkoşîna li dijî vîrûsa dike ku xweparastina bedena mirov têr neke (HIV/AIDS), li dijî lerzetayê, tuberkulozê, û hwd. Bêguman dema vê dike, destekê dide sîstema bikaranînê ya Microsoftê ango ***Windows Mobile***ê jî tercîh dike.

Weqfa Bill û Melînda Gates (BMGF) sala 1994ê hat damezirandin û sermayeya wê 66 mîlyar dolar in. Ji bo ku ji muafiyeta bacdayînê ya weqfan sûdê werbigire herî kêm % 5ê malê xwe divê weqf bike. Ji sedî 95ê mayî li karûbaran bi kar tînin û carinan jî karûbarên pir kêm fîlantrofîk tên razandin. (14) Sala 2009ê BMGFyê bêhtirî 3 mîlyar doleran subvensîyon dan û 409 mîlyon dolar li mesrefên bikaranînê dan, di serê de jî ji bo projeyên armanca wan başkirina jiyana xizanên li welatên bi pêş dikevin. Di qada tenduristîya giştî de tu kirêdêr bi qasî hukûmeta Dewletên Yekbûyî ne xwedî bandor e. (15) Bi xêra weqfkirina 30 mîlyar dolarên Warren Buffett, weqfê fînanskirina xwe ya destpêkê jî du qatan bêhtir kir, bi vê jî veguherî saziya alîkarîya mirovan a herî girîng.

Ev hevdîtina di navbera **Gates** û **Buffett** de destûr da şefê buroya rojnameya *The Economist* a li New Yorkê **Matthew Bishop** ku fikra "fîlantrokapîtalîzmê" çêbike (16) da ku teşe bide yekarmancîya dozên mezin û bazarên baş. Buffett û Gates ya rastî şêweyekî nû yê hevkarîyê li ser rêxistinên alîkarîya mirovî û hukûmetan ferz dikin. Armanc ew e ku nîşan bidin, wê kêlîya ku dewlet budceyên xwe yên civakî kêm dikin û para bêhtir hindiktir rîskan digrin ser xwe û ji ber vê jî nikarin destekê bidin rêxistinên nû yên fîlantrofîk, şirket dikare bibe "*hêza herî mezin a qencîyê li dinyayê*".

## Dozên mezin û karên kar dizên

Li gor Gates û Buffett "dayîn" dikare bibe qeraseyê herî mezin ê ji bo guherîna li dinyayê. Lê belê bi awayê stratejîk "dayîn" – û li gor modelên cîhana karsazîyê. Bi maneya xwerû û rast a peyvê, divê mirov li van fîlantrofên nû weke muteşebisên civakî serwext bibe. Ew cihê ne ji karê alîkarîya mirovî yê ku pîşesazên pêşî yên damezrênerên weqfên amerîkî yên weke **Andrew Carnegie** yan jî **John D. Rockefeller** ruh pê anîbû.

Di çanda van aktoran de, teknolojî herweha dikin ku anînên karê yên li ser veberanînan jî hûr û kûr lê were kolan. Bi vî rengî, kronometre ji bo taylorîzmê çi be, telefonên destan jî ji bo fîlantrokapîtalîzmê ew e. Bi xêra bikêrhatinên wê yên cihêreng –SMS, kameraya vîdyo û mekîneya wêneyan, bersivdêra telefonîk, GPS...– telefona destan amûreke baş a *reporting*ê ye û bi vî awayî ya şefafîyê jî. Karûbarên ev weqf fînanse dikin, dikarin kite bi kite werin pêşkêş kirin bo kesên pereyan didin weqfan. Her yek ji wan dikare bibîne ka proje çawa hatiye bi kar anîn, û çiqasî bikêrhatî ye. Karûbarê alîkarîya mirovî bi teknîkê bi gurçûpêç dibe, fîlantrofî rasyonalîze dibe, bexş û weqfa alîkarîya mirovî vediguhere veberhênanê.

Dewlemendên nû yên ***Silicon Valley***, mîlyardarên sektora înformatîkê yên ku carinan xwe ji karûbarên şirketan vekişandine, weha xuya ye biryardar in ku aborîyên nû peyda bibin fetih bikin. Telefonên destan ên evqasî bibandor û karhêner ê xizmetên bi rastî yên ji bo tevahîyê, ji ber vê yekê amûra li ber dilê wan e.

* Dersdar e li Zanîngeha Lille 3/ Ircav-Paris 3; nivîskara *Mythologie du portable/Mîtolojîya telefona destan*, Le Cavalier Bleu, Parîs, 2010, û ya *Devenir média. L'activisme sur Internet entre défection et expérimentation/ Bûna medya. Çalakgerîya li ser Înternetê di navbera qutbûna ji refan û ceribandinê de* (tevî Olivier Blondeau), Amsterdam, Parîs, 2007. Blog : www.mobactu.fr

1 "Remarks on Internet Freedom/Li ser azadîya Înternetê hin fikir", 21 janvier 2010

2 Yves Eudes, "Commotion, le projet d'un Internet hors de tout contrôle/Commotion, projeya Înterneteke li derî tevahîya kontrolan", *Le Monde,* 30yê tebaxa 2011ê

3 Peyva *valise* [valîz] a dişibe *hack*ê – derxistina holê ya înformatîk – û çalagerîparêzî. Bixwîne Jean-Marc Manach, "Les 'bidouilleurs' de la société de l'information/ 'Hackkerên' civaka agahdarîyê", *Le Monde diplomatique,* îlona 2008ê

4 Monty Mumford, "M-Paisa: Ending Afghan Corruption, one Text at a Time / M-Paisa: Dawîlêanîna li bertîxwarîya afgan, her carê SMSek", Techcrunch, 17ê çirîya pêşî ya 2010ê

5 Charles W. Corey, "SMS Texting Program Allows Guinean Voters to Protect Their Votes / Bernameya şandina SMSan destûrê dide hilbijêrên gîneyî dengên xwe biparêzin", www.america.gov (arşîv), 21ê hezîrana 2010ê

6 Girêdana Înternetê ji bo tevahîya karûbarên behsa wan hat kirin: http://blog.ushahidi.com/index.php/category/elections/

7 *Bigire li ber* Harold Garkinkel, *Recherches en ethnométhodologie/lêkolînên di etnometodolojîyê de*, Presses universitaires de France, Parîs, 1967 (sala 2007ê ji nû ve hat çapkirin), li gorî vê dînamîka di navbera dîtin, şirovekirin û bicihanînê de wî ji*accountability*ê erka nîzama civakî bi xwe çêkir

8 "Clinton to Tech Innovators and Entrepreneurs: 'We Want You'/Clinton ji Nûker û Muteşebîsên Teknolojîyê re got: Em we dixwazin", 15ê çirîya pêşî ya **SAL**, Fastcompany.com

9 Ev weqf di mîkrofînansê de bispor e û ji sala 1997ê ve alîkarî da jinên ûgandî ku dikanên piçûk ên ji bo telefonên destan bi pêş bixin

10 Laurence Allard, "Monnaie mobile: des services innovants portés par les usagers/Pereyê seyar: Xizmetên nûker ên ku bikarhêner wan hildigirin", 24ê çirîya paşî ya 2010ê, www.mobactu.fr

11 Hakima Abbas, "The role of donors in the movement for social justice in Africa / Rola kesên pereyan di tevgera ji bo edaleta civakî ya li Afrîkayê de weqf dikin", *Pambazuka News*, Nayrobî, 17ê çirîya paşî ya 2010ê

12 Pierre Omidyar, "How I Did It : EBay's Founder on Innovating the Business Model of Social Change / Min çawa ew pêk anî: Damezrênerê eBayê der barê Nûkirina Modela Karsazîyê ya Guhertina Civakî de [dipeyive]", *Harvard Business Review,* Boston, îlona 2011ê

13 Brian Dolan, "Bill Gates: Mobiles not PCs for global health / Bill Gates: Telefonên destan ne kompûterên şexsî ji bo Tenduristîya Cîhanî", 27ê nîsana 2010ê, www.mobihealthnews.com

14 *Bigire li ber* Charles Piller, Edmund Sanders û Robin Dixon, "Les investissements bien peu philanthropiques de la Fondation Gates / Veberhênanên pir kêm fîlantrofîk ên weqfa Gates", *Problèmes économiques,* Parîs, çirîya pêşî ya 2008ê

15 Çavkanî: http://keionline.org/microsoft-timeline

16 Matthew Bishop et Michael Green, *Philanthrocapitalism: How the Rich Can Save the World / Fîlantrokapîtalîzm: Dewlemend çawa dikarin dinyayê xilas bikin*, Bloomsbury Press, **BAJAR,** 2008, www.philanthrocapitalism.net

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

Di dema "bihara erebî" de kanala El-Cezîreyê ji bawerîya dida, kêm kir, lewra wê piştgirîya xeta stratejîya navneteweyî ya Qetarê kir. Pêre jî di heman demê de televîzyonên satelîtî yên taybet jî derdikevin holê, di van kanalên televîzyonê de para bêhtir sermayeyê suûdî serdest e.

## Rengê çapemenîya erebî piştî hilbijartinan

# Dema ronahîya stêrka El Cezîreyê vedimire

Yves Gonzalez-Quijano *

Ji tevnên civakî pir kêmtir navdar bin jî, televîzyonên erebî dîsa jî di "bihara ereban" de bi qasî wan bûn xwedî roleke girîng. Telefonên destan dikarin şûna kamerayên rojnamevanên profesyonel bigirin, lê belê heta kîjan ast û radeyê: Dîmenkêşanên wan ên demkurt nikarin qasî hêza bicoş a dîmenên kamerayên kanalên *El Cezîre*, an jî *El Erebîye* bi tesîr bin, her du kanalên li herêmê di rêza pêşî de ne û bo nimûne di dema ragihandinên xwe yên zindî yên ji cihê bûyerên meydana *Tahrîr* a Qahîreyê, dikarin bi deh mîlyonan temaşevanan li hev kom bikin. (1) Ti awayên navîgasyona li ser tevnên Înternetê nikarin bi tiştên ku temaşevanên televîzyonê karîn temaşe bikin, bikevin qayîşkêşîyê, bo nimûne her roja înê ya sibata 2011ê, li ser ekranên televîzyonê di cîh de eynî mîna bûyerên mezin ên sporê yên cîhanî, xwepêşandanên li paytextên ereban jî dihatin belav kirin: Tûnis, Qahîre, Trîpolî, Sanaa, Manama… Ezmûneke bi her halî ji bo demeke dirêj di bîra hişê siyaseta herêmê de hat neqiş kirin.

Li Misirê, *Konseya Bilind a Hêzên Artêşê* (CSAF) di vî warî de nexelitî, ji ber ku wê di nav saleke dawî de, bi darê zorê li studyoyên belavkirina bernameyan jî mudexeleyê rojnamevanên televizyonê kir. Di destpêka sala 2012ê de di dema maça *Port-Saîd* de mirina bi dehan fanatîkên fûtbolê, -ku ev alîgirên futbolê gelek caran di dema şerên li dijî hêzên rejîmê û dûre jî di salvegera şoreşê de di rêza pêşî de bûn-, eger bi qasî sala berê nebûn sedemê livûtevger û çalakîyên mezin, ev yek ne bi tenê ji ber westabûnê û endîşeya beşeke raya giştî bû, lê belê herwiha sûdwernegirtina ji cihgirtina bûyeran bi awayekî erênî li ser ekranên *sazîyên mezin yên çapemenîya* erebî bû.

Li gel vê yekê, bi naverokên ku bi hêsanî ji piştgirîyekê derbasî ya din dibin, ferqa navbera medyayên nû û kevin zêde tiştekî îfade nake: Medyaya çapê li gel çavkanîyên li ser Înternetê hevkarîyê dike û kanalên televizyonan hema bibêje temamîya bernameyên xwe li ser Înternetê diweşînin. Careke din, *El Cezîre* di vî warî de siyaseteke nûjen bi pêş xist, welew ev yek ji ber zehmetîyên wê yên bi rêya weşana ezmanî xwegihandina hin herêman be jî: Tevî îltîfatên ku Wezîra Karê Derve ya amerîkî **Hillary Clinton** ji bo kalîteya weşanên wê yên têkildarî şoreşên erebî arasteyî wê kirin jî, li bakurê Amerîkayê hê jî temaşevanên *El Cezîre*yê nikarin bi rêya peykan lê temaşe bikin! Malpera wê ya ku ji sala 1998ê ve ava bûye, di pêvajoya *Şerê Xezayê* de di çileya 2009ê de bû yek ji 25 malperên herî pêşketî yên cîhanê û bi mesafeyeke mezin ket pêşîya reqîbên xwe yên navneteweyî, bi taybetî ji ber ku wê cih dida nûçeyên ji cihên bûyeran ên ku belaş *(Creative Commons)* belav dikirin, ji hundirê Şerîda Xezayê, li demeke ku di pratîkê de ew bi tena serê xwe bû, di ragihandina nûçeyên li ser êrişên îsraîlî de. Ji hingê û şûn ve, kanalê bênavber danûstandinên xwe yên li gel bikarhênerên Înternetê xurt kirin, bo nimûne îsbateke berbiçav e; partnerîya wê ya tam di dema herî germ a serhildanên çileya 2011ê de li gel X Media Lab îmzekirî, ku ramangeheke (think-tank) navneteweyî ya bi îtîbar a di warê medyaya dîjîtal de bispor e.

### 700 kanalên televîzyonê û 40 mîlyon bikarhênerên Facebookê

Cîhana erebî ya ku îro êdî xwedîya zêdetirî heft sed kanalên televîzyonê, bi sedan hezar blogvanan e û nêzî çil mîlyon bikarhênerên wê yên *Facebook*ê jî hene, ne mumkun e kes bikaribe bi temamî pêşî li ragihandina wê bigire. Lê belê, pirbûna kanalên televîzyonê û destekên şêwirmendîyê, tevngirêdana sabit a navbera tevnên cihêreng, gelo têra pêkanîna pêşkêşkirina pirrengîya heyî dike, bi taybetî jî li qada televîzuel ku hê jî navgîna sereke ya pêkhatina nêrîna esasî ya raya giştî ye? Bi sorkirin û gurûgeşkirina livûtevgerên ji bo hilweşandina hin rejîmên zordar, bûyerên 2011ê dibe ku yekcar bal kişandibin ser çend pratîkên dema berê yên herî karîkatural ên kanalên bi temamî ketibûn bin fermana rejîman û nikaribûn dest bi bulteneke nûçeyan bikin, bêyî ku behsa pêkanîn, an jî livûtevgerên –merasîmeke vekirina avahî, an jî sazîyekê, hevdîtina li gel heyetên bîyanî.... – mirovê li ser deshilatê bikin. Meyla heta radeyekê ji bo pirdengî û pirrengîya li herêmê, ku ev çend sal in li ber çavan dikeve, dîviyabû were piştrast kirin: Bi vî awayî, otorîteyên cezayîrî weha xuya dikin ku bi biryar in, qadeke audîo-vîzuel a neteweyî ji reqabetê re vekin. Hêmanên taybet bivênevê wê derkevin ser dikê û pirsgirêka xwebicihkirina wan beramberî deshilatên siyasî yek ji mijarên herî sereke ên pêvajoyê ne.

Bîlançoya sala bihurî dîsa jî zêde cesaretê nade mirov, hetta, li welatên ku bi lezûbez beşdarîya guhertinên rejîmê jî kirin. Li Tûnisê, xala destpêkirina hejîyanên siyasî ku li seranserî cîhana erebî didomin, *Nessma Nessma* –kanala tv ya sereke ya arizî- ku di 2009ê de ava bû, bi saya weqfa karsazên ji derdorên cihêreng ên xwecihî û yên *Mediset*ê, ku şirketeke **Silvio Berlusconî** ye –pir bilezûbez têkilîyên xwe yên li gel desthilateke ku gelek qencî pê re kiribûn, xira kirin. Lê belê tercîhên wan ên programkirinê, bi taybetî yên weşandina bernameyan, tam jî berîya hilbijartinan, *Persepolîs* a **Marjane Satrapî**, weke provokasyonên mezhebên nêzî Îslama Siyasî derketin holê. Ji ber kêlîya tercîhkirî ya ji bo vê rexneya deshilata olî ya Îranê pir hêrs bûn, ku herwiha hertiştê bi zaravayê tûnisî belavbûyî weke temsîlîyeta fîgurekî îlahî dinirxand: Înîsîyatîfeke bi taybetî dilxelîner ji bo kesên bi çavekî xirab dibînin hertiştê ku bikaranîna erebîya quranî dike mijara pêşbazîyê. Ev bûyera ku ji alîyê medyaya navneteweyî ve bi berfirehî hat belav kirin, ya rastî ewçend jî ne hêjayî balkêşîyê bû. Tevî vê yekê jî, di çarçoveya tengijînên raya giştî de bûyereke watedar e û îşareteke xirab a kapasîteya aktorên taybet e, ji bo bicihbûna li raserî şerûpevçûnê, da ku wezîfeyên xwe yên agahdarkirinê pêk bînin.

### Dîyardeya nuh: Qayîşkêşîya di warê kanalên televîzyonê de

Li Misirê, pêşbazî û qayîşkêşîya herêmî hê jî pir girîngtir in; serhildanan dawîya dawî ti itîbar nehiştin ji bo navgîna ragihandinê ya dewletê; ku bênavber û bêrûkûpêk dîmenên geşûseyranê yên çemê *Nîl*ê diweşandin gava ku hemû kanalên cîhanê bi awayekî zindî şer û pevçûnên navbera polîsan û xwepêşandêran belav dikirin. Mehên dane pey şoreşê, bûn şahidên pêkhatin û bigewdebûna bi dehan însîyatîfên xisûsî, hem yên ku carina ji profesyonelên teyîdkirî zêdebûn û xwe dispartin derdorên karsaz ên xwedî derfetên mezin, hem jî yên mîlîtanên bêtecrûbe, lê bi coş û heyecana xwe, zengîn û rengîn. Bi lezgînî, CSFAyê biryar da her weşana nû bide paş û di heman demê de careke din sansur weke tehdît deranî pêş û dema ku rojnamevan **Yûsrî Foda** di cotmeha 2011ê de di weşana zindî de îstîfa xwe pêşkêş kir, sansûr bi zelalî derket holê.

Salekê piştî çûna **Husnî Mubarek**, kanalên ku ji pozîsyonên nisbê zeximtir sûdê werdigirin, bi zimanekî hevpar li ser navê hêzên sereke yên siyasî, an jî aborî diaxivin: *El-Heyat* malê xisûsî yê rêveberê niha yê *Partîya Wefd* e; Misir 25 dengê fermî yê Birayên Misilman e; ONTV kanala dawî ye ku hê jî alîgirîya şoreşê dike, ji alîyê milyarderê lîberal **Naguib Sairis**, bazirganê *Partîya Ehrar* ve tê fînanse kirin. Aktorên herî qels hatin bêtesîr kirin, an jî ji îstîqametên xwe yên pêşî hatin vegerandin; Tahrîrî TV, bi rojnamevanên weke **Îbrahîm Îsa**, rûçikê navdar ê muxalefeta rejîma berê, karsaz **Suleyman Amer** ew ji nû ve kirî û evê dawîyê bi vî awayî bilezûbez beşdarên herî dijwar ji dewrê derxistin. Pişka nû ya siyasî di modelên aborî de ti tişt neguhert: Ji ber nebûna çavkanîyên reklamî yên têrker, wê lêgerîneke beyhûde dest pê bikira, lêgerîna ji bo peydekirina înîsîyatîfên ku karibin bêyî desteka komên xurt ên diravî yên pir hindik bin jî, xwe li ser piyan bigirin, ji derdorên siyasî pir dûr ketine…

Tofanên sala 2011ê ji ber vê yekê serdestîya kanalên ragihandinê yên pan-erebî bi awayekî pir sînordar da dest pê kirin. *El Cezîre* ya ku di 1996ê de û *El Erebîye* ya ku di 2003yê de hatin ava kirin halêhazir hê jî ji bo Qetar û Erebistana Suûdîyê navgînên pêşî yên bi tesîr ên dikarin, tevî her cure şiroveyên li ser medyayên nû jî, perdeyekê bikşînin ser zextûzorên pir dijwar ên li qralîyeta biçûk a *Bahreyn*ê, lê belê bi pifa xwe pereng û pizotên li Lîbyayê û zêdetir jî yên li Sûrîyeyê, geş û sor bikin.

### El Cezîre êdî îtîbara xwe winda dike?

Lê belê dîsa jî mirov dikare li ser çêbûn û bigewdebûna *El Cezîre* ya ku berî çendekê panzdehsalîya xwe pîroz kir, hinekî din jî li mijarê bikole. (2) Li gel sloganên weke *"gel dixwaze…"*, bûyerên sala 2011ê dikarîbûn weke îlustrasyoneke xwesteka edîtoryala wê, xuya bikin: Mirov mafê gotinê bide aktorên rasteqîn, vê jî li ser bingeha îdîaya nasnameyî bike; hem ya neteweyî, hem jî ya olî. Lê belê kanala ku xwe bi profesyonalîzm û serbixwebûna xwe karakterîze dikir û gihiştibû asta dîyarkirina ajandayên gelek aktorên herêmê, di pêvajoya şerûpevçûnên bihara erebî de, ji wê îtîbara xwe pir tişt winda kirin. Piştî meha hingivîn a randevûyên pêşî yên şoreşgerî, bi temamî bicihbûna wê ya li ser xeta pozîsyonên dîplomatîk a Qetarê – desttêwerdana li Lîbyayê û bi taybetî jî li Sûrîyeyê– ew dawîya dawî veguherand qûqlayeke bi ser gelek kanalên fermî, an jî alîgir-fermî ve û berdevkên arastekirinên siyasî yên kesên wan fînanse dikin. Ji bo pir kesan, *El Cezîre*yê têkilîyên xwe ji prensîbên xwe yên profesyonel bi temamî qut kirin; ên li ser daxwaza gerînendeyê wê yê giştî **Waddah Khanfar**ê di 2011ê de îstîfa kir – kirin ku îstîfa bike. Ev veqetîn jî li gelek veqetînên din zêde dibe û dibe îşareta xwe nerehet hîskirina gelek rojnamevanên ku bi taybetî di navenda kanala erebî de dixebitin.

Li Şamê, û li Tûnisê jî, xwepêşandan hatin pêkanîn li dijî kanaleke ku heta berî demeke nêz jî kesî gotineke nebaş der barê wê de nedigot, û ev îşaretek bû ku stêrka El Cezîreyê dest pê dikir, vedimirî, hem jî li demeke ku ewlehîya raya giştî ya erebî pir pêwist e ji bo dîplomasîya gelemperî ya Qetarê. Weki din sal wê wisa dewam bike û televizyonvanîya li herêmê wê berfireh bibe, bi taybetî di warê kanalên ragihandinê de, bo nimûne, li Beyrûdê, El Îttîhad û El Mayadîn (ku ji alîyê nûçegihanê berê yê El Cezîreyê li Libnanê, ku wî jî îstîfa kiribû, Ghasan Ben Jîddo ve tê meşandin) û nexasim, li Kendavê, El Ereb, kanala nûçeyan a ji alîyê El-Ealid Ben Talal ve tê ecibandin.

### Hevgirtina bi Rupert Murdoch re

Mîrekê suûdî, xwedîyê **Rotana,** koma yekem a erebî di warê bernameyên şahîyê de, ji bo vê operasyonê ji xwe re weke hevpar grûpa ***Bloomberg*** tercîh kir. Tê zanîn ku Bloomberg di warê nûçeyên aborî û diravî de bispor e û di vî karî de hevpareka **Rupert Mudoch** e. Wekî din hêjayê gotinê ye ku **Murdoch**, yek ji kesên herî bi hêz ê medyaya awustralyayî ye ku ramanên wî yên pro-sîyonîst û herwiha ultra-muhafazakar qet jî ne sir û raz in, bixwe amadekarîya vekirina kanaleke taybet a erebî ya bi navê ***Sky Arabia*** dike. Surprîzeke piştrastkirî bi îlaneke berî demeke kin derket holê ku El Ereb wê biryargeha xwe bibira ***Manama***yê. Piştî nûçeyên nepiştrastkirî yên weke bicihbûna wê ya pêşî li ***Beyrûd***ê, an jî li ***Qahîre***yê, dûre jî li ***Doha***yê, bivênevê piştî sererastkirina têkilîyên xwe bi rêveberên Qetarê re û herî dawîyê jî li Emîratên Erebî, tercîhkirina paytextê Bahreynê pir jî nedihat payîn. Ev mîkro-dewlet, a bêyî ti ezmûn û pêzanînê, hema hema dîsa di warê pîşesazîya ragihandinê de jî bêyî tecrûbe, di ser de jî ji adara 2011ê ve serê wê ket nav belayên ku bûn sedemê desttêwerdana artêşên welatên Kendavê, bi taybetî jî ya ***Erebistana Suûdî***yê.

Ji alîyê mîrekî ku ti caran dilbijîn û daxwazên xwe yên siyasî veneşartine û giranîyeke mezin a aborî daye vê projeya kanala ragihandinê ya cîhana erebî, *(ew xwedîyê bêhevpar e di vî karî de, tevî ku di razemenîyên xwe yên din de hevparên wî hene, bo nimûne hevparekî grûpa Rotana ye)* bicihbûna li ***Manamayê,*** tê wateya daxwazkirina şûneke xweser ji bo kanala paşerojê di navbera dengê fermî yê ***El Erebîye*** û yê hinekî din îtîrazkar ***El Cezîreyê*** de. Li profesyonelekî pir rexne tên girtin ji ber ku otorîteyên Erebistana Suûdîyê berî çend mehan spasîya wî kiribû, ango **Jamal Kashoggi** redaksîyona El- Ereb hatiye spartin. Dirûşmeya wê ya weke: *"Azadî û pêşketin"*, ku ji niha ve hatiye dest nîşan kirin, bêguman sloganên tevnên civakî yên *"bihara erebî"* bîne bîra mirov jî, ew bêhtir bala mirov dide ser siyaseta paşerojê ya ku **Ben Talal** ji bo herêmê difikire pêk bîne, bo nimûne, *"sermayedarîya bi awayê îslamî"*. Rêyeke ku serkeftina wê hatiye dîtin, bi taybetî ji dema ku li herêmê şêwirmendîxaneyên hilbijartinan yên pêbawer ava bûne û vir ve.

* Doçentê li Zanîngeha Lumière Lyon II, û lêkolînerê Instîtuta Fransî ya Proche-Orient; anîmatorê bloga Culture et politique arabes, http://cpa.hypotheses.org/

1 Binêrin li nivîsa Mohammed El-Oifi a bi sernavê "Al-Jazira, scène politique de substitution / Al-Jazira, dika siyasî ya veguhezandinê", *Le Monde diplomatique*, gulan 2011

2 Li ser kokên kanalê, binêrin li nivîsa David Hirst a bi sernavê "La télévision arabe qui dérange- Televîzyona ereb ya ku nerihet dike", *Le Monde diplomatique*, août-tebax 2000

Wergera ji fransî: Baran Nebar

# Pekîn û Waşîngton ji bo hev bitirsînin gavên xwe yên lîstikê diavêjin

Pêşketina lezgîn a Çînê hêzên heyî dihejîne û têkilîyên wê yên bi Amerîkayê re tevlîhev dike. Waşîngton bersivê dide û di serî de biryarên parêzgar dide, lê belê dibe ku Pekîn van biryaran êrişkar bihesibîne û hêza xwe hê jî bêhtir bi pêş xe.

SHEN DINGLI *

Di dehsalên bihurî de, hilberîna hindûrîn a brût (HHB) a Çînê ji ya Amerîkayê (Dewletên Yekbûyî) deh qat bileztir zêde bû. Ew 2000ê ji 1 100 mîlyar dolaran, gihîşt 5 880 mîlyaran sala 2010ê û di heman demê de, ya Amerîkayê ji 10 000 mîlyaran gihîşt 14 600 mîlyaran. Ji bo dema niha, aborîya çînî hîn pir li paş radiweste, lê belê bispor weha pêş dibînin ku ew ê bîst sal bi şûn de bigihîje asta aborîya amerîkî. Ku ev tevger piştrast bibe, dibe ku Pekîn, tevî hêdîbûnekê jî berî dehsalekê li asta Waşîngtonê bisekine.

Welat gav bi gav hemû sifatên superhêzeke paşerojê ji xwe re peyda dike. 2011ê, budceya wê ya parastinê 91.7 mîlyar dolar bû, reqameke ji ya Japonyayê % 80 û ji ya Hindîstanê % 200 bilindtir. Navbera wê û Amerîkayê jî, ku 2000ê ji 1ê heta 20ê diçû, aniha bi qasî ji 1ê heta 7ê kêm bû. Çîn hê jî li paş maye, lê belê ew niha di warê lêçûnên leşkerî de di rêza duyem a dinyayê de ye û eger ku Waşîngton siyaseta xwe ya sînorkirinên budceyî bidomîne, dibe ku ev cudahî hîn kêmtir bibe.

Ji salên 2000ê ve, têkilîyên navbera herdu welatan pir guherîn. Çîn teqrîben sêyeka rezervên xwe li senedên maliyeya amerîkî radizîne û weha dibe deyndêra yekem a Amerîkayê. Ew herweha di rêza neteweyên ixracatkar ên dinyayê de bûye yekem û di nav welatên ku mal difiroşin DYAyê welatekî sereke ye Ev jî riya kêmkirina enflasyonê li ber Waşîngtonê vedike û dihêle ku veberhênerên amerîkî jî pere qezenc bikin.

Ji krîza fînansî ya 2008ê û vir de, Pekîn bê rawestan li ser dika navneteweyî û di têkilîyên xwe yên di gel Amerîkayê de xwe derdixe pêş. 2009ê, di zîrveya Kopenhagê de, ew di derbareyê salnameya kêmkirina karbonê de li dijî Waşîngtonê derket. Di heman salê de, filoya wê dora keştîya hêzên deryayî yên amerîkî ya bi navê "Bê kêmanî" girt, lewre ku ew di devera aborî ya xwerû (DAX) ya çînî de, li deryaya Çîna başûr, diseyirî. 2010ê, iqtîdara çînî careke din li ber zextên Waşîngtonê ji ya xwe daneket û êrişa girava başur-koreyî ya Yeonpyeong ji hêla Koreya Bakûr ve şermezar nekir. Ji 2011ê ve, ew herweha guhê xwe nade ambargoya li ser itxalatên petrola îranî, tevî ku li ser programa çekên nukleer bi awayekî serttir li hember Tehranê tev gerîyaye.

### Hevkarîya DYA û Çînê û qayîşkêşîya di navbera wan de

Dîsa jî, hevkarîyeke çînî-amerîkî ya berfireh di pir waran de rû dide: Ji bo têkoşîna li dij terorîzmê û belavbûna çekên imhakirina girseyî (qet nebe heta dereceyekê, wek nakokîyên li ser Komara Gel a Demokratîk a Koreyê jî nîşan didin), an jî ji bo kêmkirina krîza fînansî. Lê belê, cihên nakokîyê jî li hev zêde dibin.

Li ser enîya aborî, Waşîngton ji Pekînê ne razî ye, ji ber ku ew karên amerîkî "didize" û bi jinirxkirina diravê xwe û binpêkirina qaydeyên pîyaseyê, reqabeteke nelirê dike. Li alîyê stratejîk, DYA weha dihesibîne ku Çînê bazeke çekan da dest pê kirin û hêzên xwe li herêma Asya û Pasîfîkê belav dike û vê yekê jî ji xwe re dike cihê endîşeyê. Di warê îdeolojîk de jî, ew nikare reqabeta "lihevhatina Pekînê" (1) û ya Waşîngtonê qebûl bike.

Lê belê, xirabûna civaka amerîkî ya ji ber nemana kar û jicihrabûnên beşa pîşesazîyê, di serî de ji ber lîberalîzma aborî û kapîtalîzma ku qezencên maksîmûm ferz dike, pêk tê. Wekî din, reqabet ne tenê di navbera Çîn û Dewletên Yekbûyî, lê belê li nav tevahîya welatên endustiryel li alîyekî, û tevahîya welatên di pêşketinê de li alîyê din çêdibe. Kura yuanê jî ferq nake, lewre ku produksîyon dikare li Vîetnam, Bangladeş, Hindîstanê û hwd. jî bê danîn. Herkes pê dizane, lê di vê sala hilbijartinên amerîkî de, her yek dê rola xwe jî bileyize.

### Hevkarîyeke ecêb

Li alîyê stratejîk, Dewletên Yekbûyî li hember rabûna qûweta Çînê ne xweşbîn e. Hêzên hewayî yên di ber modernkirinê de niha xwedîyên balafirên bombaranê yên bi pergalên kefşkirinê û fermandarîya hewayî yên Awacsê gurçûpêçkirî, iqmaldêrên li hewayê û gemîyên balafiran ên li ser kar in. Bernameya fezayî, ku tê gotin alîyekî wê ji bo parastinê jî tê veqetandin, herweha bi quwet bû û hêzên deryayî cebilxaneyeke çekên asayî û nukleer ên mesafedirêj ji xwe re peyda kir. Divê pêşketina imkanên çînî yên di sîberfezayê de jî lê bê zêde kirin. Lewre jî, di ber vekişandina leşkeran ji Iraq û Afganîstanê de, Pentagon hêzên xwe li Asyaya rojhilatî belav dike; ew li gel hevpeyman û hevkarên xwe yên nû li ser ceribandina qabiliyetên hêzên deryayî yên çînî dixebite, nemaze li deryaya Çîna Başur. (2)

Ji hatina xwe ya li Qesra Spî ve, serokkomar **Barack Obama** xwest ku ji pevçûnê bêhtir girîngîyê bide riyên dîplomatîk. Jixwe, ji nav biryarên wî yên pêşî, mebesta destpêkirina guftûgoya li gel Çîn, Îran û Venezuelayê hebû. Ev awayê xebatê carna serkeftî bû, mesele li Burmayê ku serokkomarê wê **Thein Sein** hêdî hêdî welatê xwe demokratîk dike. Dewletên Yekbûyî piştgirî daye vê pêşîlêvekirinê, wek ziyareta dîrokî ya wezîra karê derva **Hillary Clinton**, roja 1ê kanûna 2011ê li Naypyidawê, nîşan dide. Her çi hevkarîya leşkerî ya heyî li gel Japon, Kore, Fîlîpîn û Vîetnamê, paşfikirên stratejîk ên li hember Çînê jî tê de rola xwe dileyizin.

Bihêzbûna Çînê ne cihê matmayînê ye: Ji dema ku civak bo aborîya bazarê hat vekirin û globalîyê dest bi hêsankirina çûnûhatina ferd, sermaye û agahîyan kir, bihêzbûneke weha di dîrokê de hatibû nivîsandin. Jixwe, Pekînê zor neda kesî. Veberhênerên amerîkî fersenda bikaranîna hêzeke xebatê ya erzan stand. Çînîyan endustrîya xwe bi pêş de xist û, di heman demê de, amerîkîyan jî bi fiyatên erzantir danûstandin kir û kargehên gemarker ji çînîyan re jî hiştin. Qezencên sabit ji vê pevguhastinê derketin, lê encamên xiraker ên mayînde jî pêre hatin, nemaze ji bo rewşa xebatê li Amerîkayê û ya hawirdorê li Çînê.



İSMAİL ÇOBAN: **Xwazgînî**, boyaxa rûnî li ser tuwalê, 120 x 100 cm

### Tilîya Çînê di nav aborîya Amerîkayê de

Pekîn û Waşîngtonê weha hevkarîyeke ecêb û nayê jihevkirin danî: Çîn hawirdora xwe gemar dike da ku DYA pere hindik xerc bike, lê belê Çîn herweha senedên Maliyeya Amerîkî jî distîne da ku DYA pereyê mezin li Iraq an Afganistanê jî serf bike. Dema ku serokkomar **George W. Bush** 2001ê hat ser kar, deynê amerîkî 5 000 mîlyar dolar bû. Li dawîya wekaleta wî, ew gihîştibû 10 000 mîlyaran. Di kêmtirî sê salan de, serokdewlet **Obama** ew anî asta 15 000 mîlyaran. Tevî ku para berpisîyarîya Çînê di vê felaketê de jî hebe, ew herweha mexdûra wê ye. 1 150 mîlyar dolarên senedên Maliyeya Amerîkî ku di destê wê de ne, giranîya krîza fînansî sivik dikin û weha rê didin DYAyê ku li ser şergeha Afganistanê bêhtir pare xerc bikin. Pereyê naqît yê ku Bankaya Navendî ya Amerîkî (Federal Reserve, FED) bi ser de dirijîne, riya wergirtina fonan dide wan û herweha imkana standinê ya dolarên çînî kêm dike. Ev pevgirêdana ecêb û nexweş jî her ku diçe xirabtir dibe.

Pêwîstîya hevsengîyeke nû ya têkilîyên çînî-amerîkî weha bi zelalî dîyar dibe. Di berjewendîyên Çînê de ye ku ew danûstandina bazara hindûrîn pêş de bixe, bala xwe bide jîngehparêzîyê û zêdehîyên ticarî li gel hevkarên amerîkî kêm bike. Li Dewletên Yekbûyî, hevsengîyeke nû li nav fînans û endustrîyê dê baş bibe, li gel domandina jicihrabûna hin aktîvîteyan û bicihbûna nû ya beşeke hilberînê li ser erdê neteweyî. Divê rayedarên amerîkî herweha lê hay bibin ku bicihbûyîna li Çînê qezencên zêdetir bi xwe re anîn, lê belê newekhevîyên civakî jî kûrtir kirin û bi vî rengî li exlaqê wan bi xwe qelibî, heta wê radeyê ku pevguhastina azad jî niha bû cihê munaqeşeyan.

Wekî din, qama stratejîk a herdu welatan jî ne yek e. Dewletên Yekbûyî bi îradeyeke hegemonîya dinyayî radibin û xwedîya hêza tenê ye ya ku dikare bi lez û bez li tevahîya cihanê belav bibe, tiştekî ku Çîn demeke dirêj nikariye saz bike. Dawîya 2011ê, Dewletên Yekbûyî biryara çekfirotina bo Taîwanê girt, tevî ku, roja 6ê îlona 2011ê, wezareta çînî ya agahîyan noteke bi navê riya pêşketineke aştîyane ("China's peaceful development") weşand û tê de şeş mijarên sereke yên neteweyî binxêz kirin, vehewandina giravê jî di nav de. Pekîn weha texmîn dike ku ew ê di demeke nêz de bibe xwedî navgînên aborî yên ji bo vê yekê pêwîst, û herweha dixwaze li tengav û herêma xwe jî bibe serdest. Modernkirina tevahî ya qabiliyetên wê yên pêşîlêgirtinê jî ji bo gihîştina vê armancê pêwîst e.

### Taywan, mijareke ji bîran dernakeve

Herdu welat niha ketin mantiqeke pevçûnê. Firotina çekan li Taîwanê weha dike ku Çîn cebilxaneya xwe jî modern bike. Leşkerbûna wê jî dibe sedema rabûna şikên Waşîngtonê ku Çînê hedefên stratejîk ên li derveyî devera tesîra xwe li ber xwe danîne. Jixwe, ma ne ew li ser soza xwe ya berêdayîna Taîwan û parastina peravên xwe û belavnekirina hêzên xwe li xerîbîyê vegerîya. Çîn balafirên menzîla wan ji herêmê wêdetir çêdike, gemîyan di *Kendava Aden*ê de bi cih dike û dixwaze hîmên piştgirîya lojîstîk jî li xerîbîye bi cih bike.

Ji ber van îşaretan, Dewletên Yekbûyî peywirên naskirinê di deryayên zemînî û fezaya hewayî ya çînî de li hev zêde kirin. Ji bo ku di rewşa êrişeke Taîwanê de operasyonên xwe biparêze, Împaratorîya Navîn heta gemî û balafirên amerîkî jî bi riya derveyî devera xwe ya aborî û têkane kir. Hin raporan herweha dîyar kiriye ku Pekîn dixwaze deryaya Çîna Başûr wek aîdê berjewendîyên xwe yên neteweyî bihesibîne. Ev helwêst, li gel siyaseta wê ya li hember Japonê (3) û nîvgirava koreyî, xwedîya pareke giran di vegera Dewletên Yekbûyî li Asyayê de ye. Lewre ku wan weha argumana azadîya seyirînê li deryaya Çînê jê wergirt û mesele bi vî rengî bi temamî tevlihevtir bû.

Ev siyaseta "vegera li Asyayê" ji ber armanceke dualî çêdibe: Xurtkirina hebûna hêzên amerîkî di herêmê de û rêlibergirtina her binpêkirina qaîdeyên navneteweyî yên di Pasîfîkê de. Jixwe, berjewendîyên her du welatan di warê seyirîna ava kûr de digihîjin hev û her du wê ji azadîya çûnûhatinê sûdeke mezin werbigirin. Lewre jî, sedema protestokirina heyînîya hêzên amerîkî tuneye, heta ku ew xetên ragihandinê yên hev û din qût nekin. Lê belê, divê maf û erkên her du welatan jî bên dîyarkirin. Lazim e ku Amerîka mafên çînî yên bingehîn bin pê nekin. Dibe ku hevsengîya nû ya iqtîdarên her du welatan bibe mijareke sereke ya vê dehsalê.

* Dekanê Enstîtûya Lêkolînên Navneteweyî û Birêveberê Navenda Lêkolînên Amerîkî yên Zanîngeha Fudan a Şanghayê.

1 Ev gotin, pêşketina modela çînî destnîşan dike

2 **Michael T. Klare**, "Quand le Pentagone met le cap sur le Pacifique / Dema ku Pentagonê berê xwe da pasîfîkê", *Le Monde diplomatique*, adar 2012

3 2010ê, gemîyeke hikûmetî ya japonî ji hêla keştîyeke çînî ve hat rawestandin –, li gor Tokyoyê bi zanîn– û bûyereke mezin weha rû da

Wergera ji fransî: Simko Destan

www.arsivakurdi.org

Dema ku Dewletên Yekbûyî dikeve nav "şerê li dijî terorîzmê" û hejmareke her diçe zêdetir ya eskerên xwe ji Iraqê heta bi Afganistanê dişîne seranserî dinyayê, pêrgî zehmetîyekê tê: Peydakirina şervanan. Ya rastî welatîyên wê pir zêde ji bo fikra mirina ji bo welêt, ne bi kelecan in. Artêş ji ber vê pirsgirêkê, bi soza dana pasaporteke amerîkî, newelatîyan digire eskerîyê. Wê wekî din bang li şirketên ewlekarîyê yên taybet kir, da ku ew bi xwe eskerên temamker ên ku piştî hatin bi kar anîn, "mirov dikare wan bavêje" ji Afrîkayê peyda bikin.

### LI ÛGANDAYÊ HEVDÎTINA BI HÊZEKE KAR A KU MIROV DIKARE PIŞTÎ KARÊ MIROV PÊ QEDÎYA, BAVÊJE

# Eskerên mûçegir ên afrîkî ji bo şerên amerîkî

ALAIN VICKY *

*Ez di cî de têgihiştim ku min şaşîya herî mezin a jîyana xwe kiribû. Lê belê êdî pir dereng bû. Min ji bo salekê* [*peymana kar*] *mohr kiribû. Diviyabû ez weke zilamekî tevbigerîyama"* **Bernard** (1), ê ku êdî di şirketeke taybet ya ewlekarîyê ya amerîkî de li Iraqê kar dike, bi wan gotinan xwezîya nekirinê derdibirî. Ev ûgandîyê ciwan endamê *"artêşa nedîtbar"* (2) e ku ji alîyê Dewletên Yekbûyî ve, ji bo ku desteké bide hewldanên wan ên şer, weke esker hatibû wezîfedar kirin. Di 2011ê de bi halekî nexweş vegerîya welatê xwe û ji hingê ve, tevî ku di peymana wî ya kar de hemû mafên parastina civakî û tenduristî jê re hatibûn nasîn, ji her cure mafên xwe bêpar hat hiştin.

Li alîyekî hemkarên wan yên derwelatbûyî yên spî amerîkî, îsraîlî, afrîkîyên başûr, brîtanî, fransî, yan jî sirbî yên ji alîyê şirketan ve bi kontrata li gel Pentagonê hatine wezîfedar kirin, (ji 2003yê ve 120 mîlyar dolar ji bo van peymanan hatine xerc kirin) – ji lêçûn û tazmînatên hiqûqî yên rihet sûd wergirtin û her yek ji wan pirî caran mehê zêdetirî 10 hezar dolaran werdigire, kesên din ên bîyanî (*"third country nationals"*, TCN) yên weke **Bernard** rastî muameleyên kêfî hatine, mafên wan ên huqûqa kar hatine bin pê kirin û bi livûtevgerên xirab re rû bi rû mane. Carna birîndarbûyî ew şandine malê, bêyî ku bi wan re elaqedar bibin û îro ew ne alîkarîyekê, ne jî destekekê ji karbidestên xwe yên berê werdigirin.

Di hezîrana 2008ê de, dema ku Waşîngton dest bi vekişîna ji Iraqê dike, beramberî 153 hezar eskerên nizamî, 70 167 TCN hene. Di dawîya 2010ê de hejmara wan jî hema hema bi qasî yên nizamî ye: 40 776 beramberî 47 305 eskerên amerîkî. Ev eskerên ku ji mêr û jinan pêk tên, ji welatên Başûr in. Bi hezaran ji wan, bi wezîfeyên curbecur li bîst û pênc baregehên artêşa amerîkî yên li Iraqê hatine wezîfedar kirin. Yek ji wan baregehan, baregeha binavûdeng ***Camp Liberty*** ye, *"bajarekî piçûk ê Amerîkayê"*, yê li nêzî Baxdayê hatiye ava kirin, bi hejmara nifûsa xwe di asta xwe ya herî bilind de ji sed hezar kesan bihuriye. TCN –ku %59ê karûbarên sektora bi navê "pêdivîyên bingehîn" pêk tîne –bi metbex, paqijî, çêkirina avahîyan, lêkirina zû ya wargehan, elektrîk û hetta karûbarên estetîk yên jinên eskeran re mijûl dibin.

Hin ji wan herwiha dikarin ji bo ewlekarîya wargehan, carna li tenişt eskerên din ên nîzamî bên wezîfedar kirin. Ev rewşeke xweser a îstîxdamkirîyên afrîkî ye û ew bêhtir çûn û hatina nav avahîyên baregehê kontrol dikin. Ev afrîkîyên jêrsahrayî ji sedî 15ê parêzvanên sabit ên şirketên eskerî yên taybet ku li ser hesabê Pentagonê kar dikin, pêk tînin. Ji van parêzvanên bi heqdestên nizim dixebitin, ûgandî yên herî zêde ne: Dibe ku hejmara wan li derdora bîst hezaran be. Nakokîyeke tirsnak, ew carna ji bo perçiqandina kesên di rewşa wan de tên xebitandin, çawa ku di gulana 2010ê de ji bo ku serhildana bi qasî hezar TCNîyên ji jêr parzemîna hindî, li ***Camp Liberty*** biperçiqînin, hatin wezîfedar kirin.

## Şirketên bazirganîya eskeran

Ev zêdetemsîlîya ûgandîyan li Iraqê bi konteksta siyasî ya destpêka salên 2000ê ya li Afrîkaya Navendî tê îzah kirin. Wê demê, li rojhilatê Ûgandayê, şerê Golên Mezin bi awayekî fermî qediyaye. Li bakurê welêt, serhildêrên ***Artêşa Berxwedanê ya Xwedê*** hatine têk birin. Li Sûdana cîran, şerê navxweyî bi dawî bûye û pêşî li vebûna rêya serxwebûna Başûrê welêt vekiriye. (3) Zêdetirî şêst hezar zilamên artêşa ûgandî bi carekê xwe terhîskirî dibînin. Iraq di wê rewşê de ji bo wan dişibe derîyekî xwe rizgarkirinê. Wekî din, Kampala, hevalbenda sereke ya Amerîkayê li herêmê, yek ji kêm paytextên afrîkî ye ku amade ye destekê bide rêveberîya **Bush** di dema destpêkirina şer, di 2003yê de. Ji nîveka salên 1980ê ve, eskerên her du welatan di nav hevkarîyê de ne. Rojnamevan û blogvanê ûgandî **Angelo Îzama** tîne ziman ku *"di 2005ê de, pêdivîya amerîkî bi personelên ji bo sektora paramîlîter û ewlekarîyê pir zêde dibe. Ji ber ku Pentagon dikeve dû peydekirina karkerên anglofon, bi tesîr û xwedî tecrubeya şer, ji bo vê yekê bi awayekî xwezayî berê xwe dide bazara mirovan a Ûgandayê"*. (4)

Ji bo **Norbert Mao**, namzetê bextreş ê Partîya Demokrat ji bo hilbijartinên serokatîyê yên 2011ê, şandina ûgandîyan ber bi Iraqê di heman demê de xwe dispêre sedemeke din: *"Şervanên berê yên ku bi carekê xwe bêkarûbar dibînin, dikarin pirsgirêkan biafirînin. Ji ber vê yekê ji alîyê hukûmetê ve weke rêyeke baş a xwe rizgarkirina ji terhîskirîyan li Iraqê hat fikirîn"*. (5) Ji bo pêkanîna debara vê qefleya nû, li gor wî, *"şirketên ji alîyên eskerên berê yên amerîkî ve avabûyî, li gel şirketên din ên ji alîyê berpirsîyarên bilind ên berê yên artêşa ûgandî re têkilîyên xwe bi pêşve birin"*.

Disa yek ji navdartîrîn karbidestên şirketa qada ewlekarîyê li Ûgandayê –general **Salim Saleh**, ku herwiha birayê serok **Yoweri Museveni** ye–, Xatûn **Kelen Kayonga** jî bi vî awayî şirketa *Askar* saz kiriye. Ji dawîya 2005ê ve, ev şirket elemanan ji bo şirketa *Special Operation Consulting* (SOC), peyda dike; a li Nevada ya ji alîyê du sûbayên berê yên amerîkî ve hatiye saz kirin. Raqîba wê ya sereke li bazara xwecihî, şirketa pakistanî ***Dreshak International***, heman salê şaxê xwe yê bi navê ***Kampala*** vedike û dest pê dike ji bo şirketa eskerî ya amerîkî ya taybet a li Iraqê faal e, dixebite. Ji 2006ê ve bi qasî deh kesên ku **Mao** weke *"serkêşên tevdan û tevlîhevkirinê"* bi nav dike, li welêt bi cih dibin. Li taxên populer ên Kampala, Iraq dibe sînorê nû yê *kyeyos*an (xebatkarên namzed ji bo koçberîyê). Şervanekî berê yê ku careke din dibe esker, dikare mehê heta 1 300 dolaran (993 ewro) qezenc bike û ev jî reqemeke pir zêdetir e ji mehaneyên li Kampala ji alîyê sektora geşbûyî ya baxçevanî û parastina sivîl ve tên teklîf kirin.

Di 2007ê de zêdetirî sê hezar ûgandî li Iraqê ji bo kar hatin bi cih kirin. Di 2008ê de ew bûn deh hezar. Karbidestên wan ên sereke şirketên amerîkî *Torres, Dyncorp, Triple Canopy, Sabre* û *SOC* bûn. **Îzama** gotinên xwe wiha didomîne: *"Hingê bû ku şerê qirêj ê heqdestan dest pê kir"*. Bi bahaneya têrkirina bazara *kyeyos*an, *"heqdest hêdî hêdî daketin. Ew wisa hêsan kêm dibin ku îstîxdama li xerîbîyê li Ûgandayê nayê pêk anîn. Li alîyê din, di wê demê de, ji bo îstîxdamê êdî ne tenê li pey şervanên berê digerin. Êdî kî dibe bila bibe, dikare biçe Iraqê"*. Ev daketina zêde ya heqdestan ku dibe reqabeta destkarîyeke nû li Kenya û Sîerra Leone, bêyî ku wezîrê xebatê yê ûgandî jê gazinan bike, bi pêş dikeve. Di dawîya 2009ê de, heqdest dadikevin bin benda 700 dolaran. Di wê pêvajoyê de, şirketa amerîkî ***Sabre*** ji bo her ûgandîyê ku îstîxdam dike, 1 700 dolar (1 298 ewro) ên hukûmeta amerîkî dixe berîkê. Askar jî ji alîyê xwe ve ji bo du sed û şest û çar parêzvanên ku li Iraqê li cem ***Beowulfa*** amerîkî îstîxdam dike, 420 000 dolaran (321 000 ewro) werdigire. Ji alîyê çapemenîya ûgandî ve deşîfrekirî, bûyerên pêşî yên kedxwarinê yên *kyeyos ji 2008ê* ve hêdî hêdî derdikevin holê. Lê belê pê razî dibe ku bi hin operasyonên paqijkirinê li derdorên operatoran posîzyona şirketên herî xurt… û yên herî nêzî serok **Museveni** zexim bike.

## Şirket çawa heqdestê eskerên ûgandî dixwin?

Ji bo **Mao**, *"çûna Iraqê, dişibe xwe bi tîmsahekê ve girtinê, bi fikra ku ew ê we ji xeniqînê rizgar bike"*. Di kanûna 2011ê de, heqdestên mehane yên *kyeyos*ên Iraqê daketin 400 dolaran, (305 ewro), ji bo xebateke hefteyê şeş rojan û rojê dozdeh saet. Hemû zilam û jinên em rastî wan hatin û temenên wan di navbera 21 û 32 salî de, ji kanûna 2009ê ve ji bo wê derê hatibûn veguhestin. Berîya Iraqê, beşa wan a herî mezin a ku ji gundîyan pêk dihat, ji bo şirketên baxçevanîyê yên paytexta ugandî xebitîbûn. Du kesan ji wan li zanîngeha Makerereyê perwerda xwe kiribû. Dilê wan teng dibû dema serpêhatîyên li ser şertên jîyana xwe vedigotin û ji ber vê yekê gelek caran bi bêhnvedaneke dirêj navber didan vegotina serpêhatîyên xwe.

## Peymaneke kar a bi lez û bez hatî mohr kirin

Pêşî li cem **Dreshak**ê ku îstîxdamkirîyên wê yên ûgandî li navenda Kampalayê hatin bi cih kirin, hertiştî dest pê kir. Pêvajoya du mehan, *kyeyos* ketin nav antremaneke eskerî ya ku armanca wê ceribandina qabîlîyeta wan a eskerî bû. Ji bo stajê ti pere nedidan wan, tiştê ku şirketê dida wan tenê xwarin û vexwarina wan bû. Di dawîya vê qonaxê de, **Dreshak** ji wan xwest ku vegerin malên xwe û li bendê bimînin heta ku careke din bên vexwendin. Ji bo hinan vê bendemayînê sê mehan dewam kir. Roja ku, axirî, hatin vexwendin jî, ji bo wan bû werçerxeke bêveger. Yek ji wan bi bîr dixe ku *"Çareserîyeke din êdî tinebû. Di pêvajoya hemû vê dema bi bendemayînê derbasbûyî de, bêyî ku em pereyên din qezenc bikin, me sirf pere xerc kirin. Hinan ji me, ji bilî kursîyên xwe, hertişt firotibûn. Ji bilî îmzekirina peymanê ti rêyeke din li ber me nedima. Û di van şertûmercan de, wan dikaribû hertişt bi me bidana qebûl kirin"*. Peymana ku datînin ber wan ji yazdeh rûpelan pêk tê û divê di panzdeh deqeyan de bên parafe kirin.

Kom wê rojê navê karbidestê xwe yê dawî keşif dike: SOC a amerîkî. Tê bîra **Bernard** ku berî peymanê îmze bike hinek dudilî maye: *"Ez di servîsa Înternetê ya şirketekê de dixebitîm û gava min heqdestên ku pêşnîyarî me dikirin dîtin, min bi rastî jî ji xwe pirsî ka hêjayî wê zehmetîyê ye an na. Mehane, tenê 300 000 şîling* [kêmzêde 89 ewro] *ferq hebû di navbera heqdestan de"*. Li ser israra hevalên xwe û dîsa ji ber gelek telefonên zextkar ên *"berpirsekî amerîkî"*, **Bernard** dawîya dawî biryarê dide ku biçe. Piştî du rojan û li pey heft saetên di balafirê de, ew lingên xwe datîne qada balafirgeha navneteweyî ya Bexdayê.

Bi qasî mesafeya sê çaryekan bi helîkopterê ji Bexdayê dûr, baregeha hewayî ya Al Assad dişibe Amerîkayeke piçûçik li ser xaka ereb. Yekîneya SOC ku *kyeyos* xwe lê digirin, bi qasî heşt sed welatîyên wan pêşwazî dike û ev welatî ji alîyê mistek derwelatîbûyîyên ûgandî yên fermanên xwe ji şefên xwe yên amerîkî werdigirin ve hatine daxwaz kirin. Piştî meheke antrenmanê, dîsa bêyî heqdest, qefleyên nû yên xapandî bi *haboobên* fetsîner (firtoneya qûmê) û şevên qerisîner ên zivistanê re bi carekê rû bi rû dimînin. Piştî vê zendegirtîmana bi carekê, neçar dimînin gelek mehên din xwe li vir ragirin, berî wergirtina pêdivî û malzemeyên ku SOCê soz dabû bide wan. Lepikên ji bo parastina wan ji sermaûseqema şevê, heta digihîjin lepên wan, zivistan bi dawî dibe. Hin ji wan neçar dimînin ji heqdestê xwe yê jixwe têra xwe kêm, bi berdêla 25 dolaran (19 ewro) tozgîrên xwe ji PX (maxaza) a Al Assad bikirin. Malzemeyên eskerî yên li wan tên belav kirin jî zêde bi kêrî wan nayê: AK 47, rext, kask û êlekên pola yên destê duyem –*"malê çînî"*, *kyeyos*an dixin rewşeke pêkenokî. Ji eskerên nizamî zêdetir çekûrextkirî, lê belê kêmtir parastî *"ji nîşangirekî ku dikare ji çend sed metreyan li te bixe"*, ev kes neçar dimînin bi taybetî çend sed erebeyên her roj dikevin nav baregeha Al-Assad kontrol bikin.

Di pêvajoya hefteyan de, ew têderdixin ku tehdît di nav yekîneya wan bi xwe de ye: Şefên wan wan daf didan pêş, wêdetirî qad û sînorê ku di peymanê de hatibû dest nîşan kirin. Hin ji wan neçar in rojê panzdeh saetan kar bikin. Tatîlên wan (ên bê berdêl) ji bo welêt, a piştî saleke xebatê, bê navber tên paş xistin. *"Em bi şevan jî di bin zextê û terorê de dijîyan,* bi van gotinan rewşa xwe tînin ziman ev terhîskirî û wiha didomînin: *Tu nikarî ti tişt ji wan re bibêjî. Ew dikarin der barê jîyana te de biryarê bidin, çi cihê dilê wan bixwaze, dikarin te li wir wezîfedar bikin, bi taybetî jî, eger texmîn bikin ku tu yê serêşîyê ji wan re çêkî, dikarin te bidin wezîfeyên xeter…"*

## Çermê rûyê min rabû

Ji bo şikandina serîrakirina serhişkan, SOC serî li çareserîyeke pêşîlênegir dide: Betalkirina peymanê bêyî ku tezmînatê bide wan û vegerandina wan li rewşa wan a rût a destpêkê. Ji bîst û yek xalên girêdayî cezakirinê yên du rûpelên peymanên şirketê ku me bi dest xistin, qonaxa 4ê ya bi navê *"dawîleanîna xizmetan"*, weke prensîb tenê piştî rêzek gilî û gazinan weke hişyarnameyekê,

www.diplomatiquekurdi.org

an jî desteserkirina heqdestên pênc rojan tê bi cih anîn. Ev yek li qadê, ango di pratîkê de bi awayekî pir dijwartir û qebatir tê bi cih anîn û SOC di rewşa nehatinên bêxeber de *"maf dide xwe ku tedbîrên din ên dîsîplînî werbigire. Bo nimûne te hişyarnameyek werdigirt, sirf ji ber ku te kaska xwe li derveyî kar nedabû serê xwe û wan du hefteyan meaşê te dibirî. Û tevî vê yekê jî, diviyabû tu bixebitîya! Em ditirsîyan ji karê xwe bibin. Ji ber vê yekê, me dengê xwe dernedixist"*. Sosreteke din a ku kenê mirov tîne: Di rêziknameya xwe ya awayê livûtevgerê de SOC ji TNCên xwe dixwaze ku *"bi awayekî maqûl îdealên Komara Ûgandayê temsîl bikin"* û xwe ji *"xirakirina îmaja welatê xwe li derve"* dûr bigirin.

Peymana bi cureyê SOC herwiha weke şert dixwaze ku *kyeyo*yekî ku herî hindik 30 rojan di pêvajoyeke çar mehan de ji ber nexweşî, birîndarî, an jî qezayekê, nikaribe bixebite, derhal ji kar were avêtin. Li gor xwe xwedî îmtiyaz ji ber ku di nav îdareya SOCê de dixebitî, **Bernard**ê me, li gel vê yekê bi tenê karî li rewşa bi dehan welatîyên xwe temaşe bike; yên ku sirf ji ber nexweşîyên xwe bi awayekî kêfî ji kar hatin avêtin. Ew wan rojan bi van gotinan tîne ziman: *"Pêvajoya tofanên qûmê yên demdirêj, guhên mirovan radigirtin, mirov bi nexweşîya sînozîtê diketin. Çavên wan diêşîyan û nexweşîyên pişikê jî li wan peyde dibûn. Gava dihatin xwe bidin derman kirin, ji aspirînê zêdetir ti derman jî nedidan wan. Û dema ji ber ku baş nehatibûn derman kirin, vedigerîyan, ji kar dihatin avêtin. SOCê nedixwest qurûşekê jî ji bo dermanên wan xerc bike. Digotin 'ne ji bo hûn bibin bar, ji bo kar bikin me hûn anîne vir'. Û ji bo ji mesrefên mirovan bibirin, karbidestan hemû rê û rêbaz diceribandin".*

Pêvajoya 2011ê, **Bernard** ji ber êşa çokên xwe nexweş dikeve. "Bijîşkekî" SOCê hormonên kortî kosteroîd dide wî. **Bernard** dibêje: *"Rewşa min hê xirabtir bû"*. Çermê rûyê wî dest pê dike pûç dibe û radibe: *"Ez jî rabûm çûm cem bijîşkekî din, an jî kesekî din ê xwe wisa dida nas kirin ê ku bi rêya Google agahî kom dikirin!"* Piştî çend hefteyan, **Bernard** ji kar tê derxistin. Piştî bîst rojên transît ku ji wir diçe kampa Bexdayê, dawîya dawî bileteke charter ji bo sefera **Kampala** bi dest dixe. Payîza 2011ê bû, bi qasî deh rojan berîya ku me yê hev bidîta. **Bernard** hê neçûbû dîtina dayîka xwe jî, ji tirsa ku diya wî pir bitirse, ji dîtina rewşa xirab a rûyê wî. Şûna çûna cem diya xwe, ew pêşî çûye cem bijîşkê xwe yê malbatê. Bernard vê rewşa xwe jî wiha vedibêje: *"Min ji wî re behsa reçetaya dabûn min kir. Wî gote min ku ew reçete şaşîya herî mezin bûye û ji niha û şûn ve, divê ez biketama nav hewldan û têkoşînê ji bo ku ez ji nû ve bi ser xwe ve bihatama. Wî çend derman ji min re nivîsandin. Lê min ti caran dermanên ew çend biha nedîtibûn: Berdêla wan zêdetirî 300 000 şîlîngan bû. Çi dibe bila bibe, ji bo dewamkirina tedawîya xwe divê ez pereyan peyde bikim, lê belê li ba Dreshak, ew naxwazin tiştekî wisa bibihîsin jî. Her çi SOC e, min ti xeber nema ji wan wergirt"*.

Her welatîyê bîyanî yê ji bo şirketeke eskerî ya taybet a amerîkî ya di bin peymana Pentagonê de, *kyeyo*yên ji Iraqê nexweş, an jî birîndar vegerîyaye, di prensîbê de **Defense Base Act Insurance** ji rewşa wan berpirsîyar e. Ev yek garantîyê dide wan ku şirketa sîgortayê ya karbidestê wan hemû lêçûnên wan ên tendurustî û dermanan bide. Wekî din, divê heqdestekî mehane yê astengdarîyê ji bo van mexdûran were dayîn. Parêzera amerîkî **Michelle C.** li ser mijarê vê nirxandinê dike: *"Lê belê, piranîya caran, ûgandî ji van mafên xwe sûdê wernagirin"*.

## Nexweşîya sînozîtê û nexweşîya masûlkan

Di dawîya salên 2000ê de, **Michelle C.** ku ji bo weqfeke xirîstîyanî ya alîkarîya eskerên amerîkî yên li Iraqê dixebite, keşf dike ku ûgandî li teniştê *boys* dixebitin. Bi pereyên ku ji bo rojê teng danîne alîyekî –ji ber ku muwekîlên wê bêpar in ji derfetên dayîna berdêlên tahlîlên tibî yên ji bo temamkirina dosyayên wan tên xwestin–, Michelle C. ji wir û şûn ve li cem Wezareta Kar a Amerîkayê dibe temsîlkara sî *kyeyo*yên ji Iraqê perperîşan vegerîyane. (6) Di nav wan de, gelek ûgandîyên ku ji ber hilgirtina malzemeyên zêde giran, nexweşîyên masûlkan li wan bûne bela, hene. Di hedefa pêşî ya parêzerê de çar şirketên eskerî yên taybet –Soc, Triple Canopy, Sabre û Eodt– lê herwiha şirketên wan ên sîgortayê û di serî de jî şirketa dêwane ***American International Group*** (AIG) hene. Ew sedema vê têkoşîna xwe jî wiha îzah dike: *"Lewre, di netîceyê de, şirketên sîgortayê qebûl nakin ku xwe bixin bin barê dayîna berdêlên dermanan, an jî heqdestê teqawidîyê ji bo muwekîlên min ên ku seqet vegerîyane"*.

## Şirketên sîgorteyê fitlan didin xwe

Li Ûgandayê ku ew berê jî du caran çûbûyê; Me C. ya ku kevne-*kyeyo*yekî ji Iraqê alîkarîyê didiyê, karekî hesas û nepenî dimeşîne. Berî hertiştî, divê ew here mexdûran peyde bike: *"Gelek birîndarên ûgandayî, ji ber ku ji wan nedihat li bajêr bijîn, rasterast vedigerîyan gundên xwe, bêyî ku bizanin ku derfeta wan heye serî li dadgerîya amerîkî bidin. Ez texmîn dikim ku hejmara wan bi sedan e. Û ev texmîna herî kêm e"*. Dûre, divê ew xwe ji guman, pênebawerî û şermê rizgar bikin ji bo li pêşberî bîyanîyeke *muzûngû* (spî) li xwe mikur bên. *"Gelek ji mişterîyên min piştî birîndar bûn, ji alîyê karbidestê xwe ve hatin tehdît kirin. Hetta, ji hinan re hat gotin eger ew bipeyivin, ew ê di nav tûrê* terman *de li welatê xwe bên vegerandin. Di ser de jî, gava ew çûn Iraqê tedawî bûn, berîya ku ew vegerin, dosyayên wan ên tedawîyê ji alîyê karbidestên wan ve hatin desteser kirin. Di vê rewşê de jî divê hertişt ji nû ve ji sifirê ve dest pê bike"*. Divê wekî din bi lez û bez; *kyeyoyên ji Iraqê vegerîyane, bi tenê saleke wan heye ji bo ku zendûbendên xwe badin.*

Axirî, divê parêzer bikeve nav têkoşîneke bêhampa li dijî makîneyeke qirase ya bi navgîna şirketên sîgortayê heta bigihîje Ûgandayê jî xwe bicih kiriye. AIG wekî din qet texsîr nake ku anketvanên weke yên şirketa maltayî ***Tangires International*** îstîxdam bike da ku hemû nerazîbûnan ji hev belav bike û tesîra wan bişkîne. Parêzer jî vê yekê bi van gotinan teyîd dike: *"Ev yek ji beşên herî dijwar ên karê min bû. Ev anketvan bêyî ku pozê wan bişewite û şerm bikin rêzikên sincî(exlaqî) yên pîşeyî bin pê dikin. Bo nimûne ew li gel mişterîyên min têkilîyan datînin û wan dibin cem bijîşkên xwe da ku raporên sexte çêbikin, tevî ku qet heqekî wan ê wisa tine, serî li vê prosedurê bidin. Ew wekî din hewl didin muwekîlekî min ê din jî ku ji alîyê fizîkî ve nikare kar bike, bi soza xistina kar bixapînin…sirf ji bo bibînin ka ew ê pêşnîyara wan qebûl bike an na! Ji ber ku li Ûgandayê kêm bisporên vekolînên tibî hene"*.

Li gor texmînan Wezîrê Kar ê Ûgandayê, qefleyên cihêreng ên zilam û jinan ên çûne Iraqê ji 2005ê ve wê zêdetirî 90 milyon dolar (68 milyon ewro) ji bo malbatên xwe şandibin welêt. Ev yek jî zêdetirî hatinîya ji qahwê, çavkanîya bingehîn a îxracata Ûgandayê ye. Piştî gelek caran derbaskirina zêdetirî salekê li Rojhilatê Navîn, kesên em rastî wan hatin, li gel vê yekê jî çend milyon şîlîng – kêmtirî 1 000 ewro – di pêvajoya wezîfeya xwe de kom kirine. Meaşên wan ên jixwe têra xwe hindik, li Kampalayê li ser hesabekî ***Crane Bank***ê tên bloke kirin, heta vegera wan, ji qîmeta xwe her diçe zêdetir winda dikin –zêdetirî ji sedî 40 di 2011ê de–, ji ber rêjeya bilind a hûrkirina wan û herwiha ji ber enflasyona ku weke qamçîyekê di dema nebûna wan de li Ûgandayê dide. *"Dreshak em xistin kar, dûre jî em firotin SOCê, piştî têra xwe pere avêtin berîka xwe. Û di dawîya dawî de, malik li me xira kirin. Tiştê hat serê me bi kurt dikare weke koletîya nûjen were bi nav kirin"*.

## Rapor şirketan gunehkar dike, lê...

Di rapora xwe ya di tebaxa 2011ê de, da ku Kongreya Amerîkî, Komîsyona Serbixwe a li ser Peymanên Dema Şer *(Wartime Contracting)* dest nîşan dike ku *"sûc û şaşîyên ku şirketan îmza xwe danîne bin van peymanên ji bo wergirtina xebatkaran, li derve zerarê didin îmaja Amerîkayê"*. Û rapor wiha didome: *"Eger hejmara eskerên amerîkî li Iraqê û Afganistanê dadikeve, ya yên şirketên eskerên taybet, ne ji bo salên dûrûdirêj, lê qet nebe ji bo demeke kurt, divê zêde bibe, berîya ku operasyon bi temamî bi dawî bibin"*. (7) *"Bazara şidetê"* (8) hê bi temamî ziwa nebûye û neçikîyaye. Ji bo parastina şazdeh hezar karmendên sefareta Iraqî, Wezareta Karê Derve ya Amerîkayê ji ber vê yekê ji bo 10 milyar dolaran bang li heşt şirketên eskerên taybet ên amerîkî kir. Divê artêşeke ji pênc hezar û pênc sed karmendan pêkhatî were saz kirin. Li teniştê ***Triple Canopy*** a ku berpirsiyarîya parastina dîplomatan dike, SOC wê ewlekarîya li cihên sabit pêvajoya pênc salan di berdêla 973 milyon dolaran de pêk bîne. E-maileke Xatûn **Kayong**, karbidesta şirketa *Askar*, ku êdî li bazara afgan jî xwe nîşan dide, bi me dide zanîn ku *"dibe ku* ***kyeyo*** *jî bên wezîfedar kirin"*.

Li gor yên me yên berê li Îraqê, ji Bexdayê heta Kabîlê û dibe ku sibê heta Mogadîşûyê jî, wê ji bo xwedîkirina *"hêza reş"*, her ûgandî hebin. Çima? *"Ji ber enflasyonê, mesrefên ji bo perwerdeyê yên zêde dibin, bihayên qût û xwarinê yên pêl bi pêl bilind dibin… Ne ku em ji vê yekê hez dikin, lê belê divê bi awayekî ji awayan em bijîn!"*

* Rojnamevan.

1 Ji ber sedemên ewlekarîyê, hemû nav hatine guherandin

2 Sarah Stillman, "The Invisible Army /Artêşa nedîtbar", *The New Yorker*, 6ê hezîrana 2001ê, www.newyorker.com

3 Piştî mirina Joseph Mobutu, di 1997ê de, Zaîre (Komara Demokratîk ya Kongo ya îro) dibe meydana şerekî ku wê di demeke kurt de, Ûganda jî di nav de, hilperike hemû welatên cîran. Di heman vedorê de, Kampala dikeve nav pevçûnekê li dijî mezheba ji alîyê Joseph Konî ve dihat bi rê ve birin ya bi navê serhildêrên ***Artêşa Berxwedanê ya Xwedê***. Di hejmara 108 a kanûna 2009-çile 2010 a kovara *Manière* de li nivîsa bi sernavê "Indispensable Afrique / Afrîkaya destjênabe", binêrin

4 http://angeloizama.com

5 www.norbertmao.org

6 www.injuredugandans.com

7 www.wartimecontracting.gov

8 *Bide ber* Deborah D. Avant, *The Market for Force: The Consequences of Privatizing Security / Bazara ji bo Hêzê* [hêza eskerî]*: Encamên Taybetîkirina Sektora Ewlekarîyê*, George Washington University Press, Washington, DC, 2005.

Wergera ji fransî: Baran Nebar



ISMAÎL ÇOBAN: **Meş**, boyaxa rûnî li ser tuwalê, 130 x 100 cm

# Birayên ku distrên

MONA ABOUISSA *

*Berdin bila milyaket mohra xwe li kaxizên we yên hilbijartinê bixin!"*, di hilbijartinên 2005ê de namzedê parlamentoyê weha dida bin çengê xwe û henekê xwe bi polîsan dikir. *"Û milyaketan mohra xwe lê xist."* Girseyekê, ku ji hezaran kesan pêk dihat, piştgirî da her peyveke siyasetmedarê ***Birayên Musliman***. **Al-Mohamedy Ahmed** mîkrofonê dirêjî namzedê din ê populer ê ji *Partîya Azadî û Dadê*, **Sobhî Saleh** dike. Wî gelek caran xwepêşandanên xwe bi henek û yarîyan geş dikirin, lê ne îro, *"me ji wan re got ku bi êgir nelîzin, kesê ku bi êgir bilîze bi xwe dişewite, erd di bin lingên wan de qelişî û ew niha di girtîgehê de ne."* Ev serkeftinek e, ku ev 80 sal in li bendê bûn. Jinikek li paş ji ser hişê xwe çû, wê bîstek berê bilêteke ji bo ***Umreyê*** qezenc kiribû. Kurikek israr dike ku ez navê wî li ser bilêteke pişkê binivîsim, di pişkê de mirov dikare melkesa elektrîkî, mekîneyên ava meyweyan, ûtî û gelek tiştên din ku di bin dikê de ne, qezenc bike. Lê wî kurikî qezenc nekir. Keçikek ku li alîyê dinê ye û dilerize, ji min dixwaze ku ez peyama wê bigihînim **Sobhî**, ku tê de ji wî kar dixwaze. Xelk ji **Sobhî** hez dike. Zilamek ji megafonê dest bi bangkirinê dike: *"Allahû Ekber, Elhamdulîllah ku yek ji me di parlamentoyê de ye!"* Ji piçûkan heta mezinan, ji ciwanan heta pîran girse jî dirûşmeyan lê vedigerîne.

Di naverasta wan hemûyan de; namzed û gotarên wan, girseya ku wekî jin û mêr ji hev cuda bûye, bi telefonên xwe yên destan dîmenan digirin, car caran xelk pev diçin, posterên şehîdan, di bin ronîyên floresanê de pesnê Xwedê didin -di nav vê merasîma bawerî û siyasetê de koroya ***Birayên Musliman*** heye. Namzed dest di dest de, destê xwe kil dikin, temaşevan bi wan re distirên. *"Va heyva spî hilat, ji gelîyê Weda û divê em şukr bikin ji Xwedê re, ku em vexwandin."* Ji welatparêzîya serdema piştî şoreşê kevintirîn stranên îslamî, lawên ciwan bi qasî ku deng ji wan dertê li hember akustîka xerab li kêleka lehzeyeke dîrokî distirên. Ew superstarên xwepêşandanê ne.

*"Em koroyeke qedexekirî bûn,"* Sal 1989 bû û **Mihemed Seîd** di koroya pêşîn a ***Birayên Musliman*** de solîstekî nûciwan bû. *"Wê demê cuda bû, kesî jî nedizanî ka hunera îslamî çi ye. Çi stran gotin? Çawa? Li ser çi?"* Di nav ***Birayan*** de fikra serdest ew bû ku muzîk hatiye qedexe kirin. Ew kurikekî ciwan bi dudilîyekê re rû bi rû maye, *"em xwedî qabiliyet in û em Birayên Misilman in, ka em dê çi bikin?"* Wan li ser rêçeke dirêj a aliman, ku meseleya muzîkê nîqaş kiriye, lêkolîn kirine û di encamê de muzîka *helal* dîtiye. Şêxekî, ku jê pir dihat hez kirin, **Ebbas Al-Sisi** alîkarîya wan kiriye û bestekarekî navdar **Mehmûd Xemîs** jî anîye cem wan. **Hesen El-Banaa** yê damezinerê ***Birayên Musliman*** bixwe **Mehmûd** teşwîq kiribû ku biçe dibistana muzîkê. Li seranserî *Deryaya Sor*, li Sûrîye û Urdunê, *Birayên* wan ji berê de dest bi stranbêjîya îslamî kiribû, ew koroya ciwan li ser şopa wan meşîya. Ew yek pêvajoyeke baldar a hêdî bû. *"Gav bi gav, di destpêkê de tu muzîk nebû, paşê me dahol lê zêde kirin û paşê jî bilûr û sentezor."* Weha tê bîra **Mihemed**, ew niha gerînendeyê koroya çaremîn û sazîya herî navdar e, ku piştî şoreşê hatiye damezirandin ***"Beravên Skenderîyeyê"***.

Em li kêleka *Kanala Nîlê* di nav toz û dûmanê de di konekî şahî û zemawendê de ne. Kanala Nîlê herêma Skenderîyê, ku xelk lê dijî, dike du parçe ku lê xwepêşandana ***Partîya Azadî û Dadê*** tê li dar xistin. Endamên koroyê ku dora bîst salî ne straneke 1400 salî distrên. Ev heman stran e ku cara pêşîn di dema *Hîcreta* wî ya bo *Medîneyê* de ji bo xêrhatina pêxember **Muhammed** xelkê gotibû. Weha xuya ye ku li gor yên hêdî, kêfa ciwanan bêhtir tê dema ku stranên bi lez dibêjin. Li derve, welêt dengê xwe bi kar anîye. Du partîyan piranîya di parlamentoyê de bi dest xist û ciwan dê sibê di pîrozbahîyeke vekirî de stranên xwe pêşkêş bikin. Zilamek çay di destan de tê hundir, ciwan dev ji stîrînê ber didin û dest bi henek û yarîyan dikin. Şef **Tamer Al-Seîd** bi wan de dixeyide.

Ji ber nîqaşeke bi qasî dîn bixwe kevin, heta bi hembêza şidandî ya rejîmeke paranoyak, pêkhatinên koroyên berê xwedî şer û pevçûnên xwe bûn. Koroya ku di siya huqûqa rewşa awarte ya **Mubarek** de di hîmayeya ***Birayên Musliman*** de mezin bûye, li dij siyasetê stran pêşkêş kirine. Endamên ciwan ên koroyê li malên xwe li ber dê û bavên xwe wekî tawanbar û terorîstan hatine destgîr kirin. Ew ketine ber lêpirsînê ka bi rastî tam çi dikin, ew çima dikin, kî sponsorîya wan dike û ka ew rîh berdidin yan na. Li ser rêya konsera wan de dewrîye gerîyane, herêm hatine girtin, li ser temaşevan hatiye saxî kirin, dîmenê konserên wan bi kamerayê girtine. Endamên koroyê cuda cuda bi dizî çûne konserê û amûrên wan jî bi trênê şandine cihê konserê. Bi tenê bawerîya wan bû ku dihişt ew berdewam bikin, ku wan di peyama xwe de ew jî dida. Ew hîn bûne sax bifilitin. Mihemed dibêje: *"Heger di nav dilê te de tirs hebe, wê demê divê tu nebî endamê **Birayên Musliman** . Mala Xwedê ava ku şoreş çêbû!"*

Dema ku **Sobhî Saleh**, ku niha endamê parlamentoyê ye, di 28ê çileya paşîn de hat destgîr kirin, wî çenteya xwe ya hertimî amade nekir. Wî berîya hilbijartinan di hevpeyvîneke digel **Mihemed**, li ser televîzyoneke îslamî weha got: *"Min zanîbû ku ji niha û pê ve tişt dê cuda bibûna."* Ew piştî demeke kurt hat berdan. Serokdewletê berê **Husnî Mubarek** hat destgîr kirin. Koroya binerd, hilkişîya ser dikê li wê derê jî pevçûna îdeolojîya wan di navbera lîberal û îslamîyan de dihêle. **Mihemed** dibêje hesasîyetên ***Birayên Musliman*** bi qasî yên civakê ne asteng in, *"em bi hunerê re şer nakin"*.

Endametîya ***Birayên Musliman*** hilbijartineke awayê jîyanê bû, ku xewnên hinekan kirin rastî, lê ji bo yên din tawîz bû. **Mihemed** dibişire û dibêje: *"Haya te jê heye ku di dema rejîma **Mubarek** de ev qehwexane, ku em niha lê ne, cihê kombûnên me yên nihênî bû?"* Ez li zilamê li paş wî dinihêrim, ku zîq li me dinihêre. **Mihemed** li benda matmayîneke li ser rû dimîne: *"Di 2005ê de polîsan avêt ser vê qehwexaneyê û Bira destgîr kirin, ew şeş mehan di zindanê de man. Lê belê berîya serdegirtinê ez çûm".* Min jî li ser vê îronîyê şirove kir "*Wa Xwedê ji te hez dike Mihemed"* û em dikenin. Ji bilî xebata wî ya bi koroyê re **Mihemed Seîd** wekî din piranî li jêr baskê ***Birayên Musliman*** karê medyayê jî bi rê ve dibe û li bendê ye ku pitikeke wan were dinyayê. Ew dibêje: *"Min hertim dixwest ez bibim pêşkêşvanê televîzyonê".* Mihemedê 38 salî ji emrekî piçûk ve ***Birayekî Musliman*** e –hilbijartinek ku xewn û xeyalên wî jê re bûne berdêl. Ji ber têkilîyên wî yên bi ***Birayên Musliman*** re ew ji karê xwe yê li cem televîzyona dewletî hatiye avêtin. Kanalên serbixwe ku xwedîyên wan yan lîberal, yan jî endamên rejîma **Mubarek** bûne, ji îslamîyan ditirsin. Wî zanibûye ku şansê wî li cem wan jî gelek qels bûye. **Mihemed** dixwaze ku ez temaşeyî roportaj û hevpeyvînên wî yên studyoyê, ku digel namzedên partîyan encam daye, bikim, dîyar e ku pir keda xwe daye. Ew dê hewlê bide, bikeve nav herika sereke [mainstream], çawa ku bi koroyê re jî hewlê dide.

### Di navbera muzîka baş û ya şeytanî de xeteke gelek zirav heye

Rewş ji bo xwendekarê huquqê **Îslam Talaat**ê 23 salî cuda bûye. Heger ji ***Birayên Musliman*** nebûna belbî ew nebûna stranbêjek. Dema ku ew hîna kurikekî piçûk bûye, bi dengê xwe yê zîz straneke ji bo ***pesnê Xwedê*** gotiye û wî bi vî awayî bala wan kişandiye. Paşê **Îslam** di çalakîyan de dest bi pêşkêşkirina stranên olî, yan jî yên îdeolojîk ên ***Birayên Musliman*** , kiriye. Wî bi rastî jî stranên îdeolojîk fam nekirine, lê dîsa kêfa wî hatiye ku stranan bibêje. **"Ez spasdarê wan im, wan ez bi mebestekê hînî muzîkê kirim''.** Niha, **Îslam** di koroyê de solîstekî alto ye ji ber ku xwe re planan çêdike ku piştî qezenckirina pêşbirka stranê ya ***Birayên Musliman*** klîba xwe çêke. Li derveyî dikê, dema ku konser tunebin, ew li mala xelkê dersên Quranê dide. **Îslam**î ji heşt salîya xwe û vir de ***Quran*** hefiz kiriye.

Kêfa **Îslam** jê re tê ku ew stranên li ser pêxember bibêje, çavên xwe dinuxumîne, bi heman awayî ku wî di xwepêşandanan de kiribû û bi hawayekî dirêj dengê xwe berdide, guh nade ku xelkê li dora masa me lê guhdarî bikin. *"Ev newaya xemgînîyê ye"* ji min re dibêje, *"ez ji strangotinê hez dikim û di nav gotinên wan de dijîm".* Ew dibêje carekê wî ji ***Birayên Musliman*** re stranek ji bo oxirkirina Remezanê gotiye û ew girîyane. **Îslam** di dilê xwe de kesekî romantîk e, ew heta ji bo heyvê jî distrê, lê belê stranên evînîyê nabêje û bi awayekî herî munasib bersiva peyamên *'heyranên'* xwe yên jin ên li ser facebookê dide.

Di îslamîyetê de di navbera muzîka baş û ya şeytanî de xeteke gelek zirav heye û koro li ser xetê dimeşe: Ne tu reqsa aşkere, ne tu evîn li derveyî zewac û şîyarkirina arezûyên ne caîz. Mebesteke bala, solîst **Diaa Al-Din** rave dike: *"Dema ku ez ji xelkê re stranan dibêjim, divê ez jê piştrast bim ku ev yek min li cem Xwedê bilind dike."* Herçend hevkarê wî yê koroyê **Îslam** dixwaze di warê muzîkê de ji xwe re karîyerekê çêke, **Diaa** ji alîye din de dixwaze propagandaya bawerîya xwe bike. **Diaa** îdealên ***Birayên Musliman*** ferikandîye û dema xeberdanê pir caran li şûna ***''ez''*** dibêje ***''em''***. **Diaa** ji alîyê dê û bavê xwe yên selefîst ve hatiye mezin kirin, berîya neh salan ji xwe re li cem ***Birayên Musliman*** cihek dîtiye, *"Li cem Birayan peywendîyeke olî heye, ku min ew li cem selefîyan nedît".* Kêfa **Diaa** ji wê fikrê re tê ku ji bo her kesekî nû ku tê nav rêxistinê, kesekî berpirsîyar heye, ev yek sîstematîk e. Lê belê li cem selefîyên hişk, ev yek wekî ***şêx*** û ***murîd*** hatiye cuda kirin.

Ji bilî kekê wî, malbata **Diaa** derbarê muzîkê de xwedî nihêrînên cuda ne û ew piştgirîyê nadin tercîha **Diaa**. Berê wî hewl daye ku malbata wî were li wî temaşe bike, dema ku ew distirê, lê bi ser neketiye, niha di navbera wî û dê û bavê wî de balansek heye -ew distrê, malbat li kêlekê radiweste.

**Diaa** dibêje Misirê ji ber lîberalbûnê gelek êş kişand, rejîma berê piştgirî da pop-muzîka adî û amiyane, hemû meylên îslamî yên ji bo mebesteke siyasî qedexe kirin. *"Piştî şoreşê hêvîyek heye, ku koro û bi giştî **Birayên Musliman**, bi awayekî çandî xwe nîşan bidin".* Ez li buroya perwerdehîya komputerê, ku ew lê dixebite, dinihêrim û hêvî dikim ku **Diaa** ji ber serê min ê nenixumandî bi hêrs neketibe.

### Gelo muzîk heram e, yan helal e; dudilîya bêdawî

*"Ka were ji min re bibêje akora nehemîn a domînant çi ye?"* Şeş keçik û sentezorek, ku bi zorê di odeyekê de bi cih bûbûn, li bersivê gerîyan. **Tamer Al-Saîd** bi sebir li benda wan sekinî. Ew wekî baştirîn xwendekarê pola xwe ji beşa muzîkê mezûn bûye û niha dike mastera xwe biqedîne û di ber re jî koroya fakulteya bazirganîyê bi rê ve dibe. Ev koro cara pêşîn par di pêşbirkeke digel fakulteyên din de pêk hatiye, îsal fakulteya huqûqê zora wan biriye. Wî ez bi hevkarên xwe yên muzîkjen û dev li ken ên li odeyên din ên piçûk dam nas kirin, hin ji wan matmayî man dema ku wan bihîst ku ew serkêşîya koroya *Biratîyê* dike. Jina wî jî di heman beşê de dersên muzîkê dide. Ev jîyana din a **Tamer**ê 27 salî ye dema ku ew bi Koroya Beravên Skenderîyeyê naxebite. *"Ez ji tecrûbeyên nû natirsim, xwe hema bi ser wan de çeng dikim, min bixwe xwest ku ez hîn bibim ka Bira çawa difikirin."* Ji koroyên din, ku ez bi wan re xebitîme, cudatir ev koro di navbera xelkê darêzdar û rêxistineke hişk de mêzîneke bêîstîqrar pêk tîne. Ew dibêje ew kêm caran stranên ***Birayên Musliman***, ku tomara têkoşîna wan e, pêşkêş dikin û bawer dike da ku ew bi propagandakirinê neyên tawanbar kirin. Û ew di warê exlaqî de li jêr serkêşîya ***Birayên Musliman*** de ne û bi vî awayî nuansên rîtmîk û varyasyonên peyvan bi baldarî bi kar tînin, *"heger em her tiştî bi carekê ve biavêjin ser wan, ew dê bibizdin".*

*"Dengekî xweş dîyarîyeke ji Xwedê ye û ew niha di destê min de ye ku ez wî bi pêş de bibim,"* li gor projeya şefê koroyê divê çil endamên koroyê hebin. **Mihemed** piştgirîyê dide vê fikrê. *"Xeyal bike, çil endam distrên, ev yek dê bandoreke çawa bike!"* **Tamer** ji xeberdana tiştên teknîkî hez dike. *"Ez dixwazin sê û çar parçe akoran, niha bi tenê du heb in, herweha zehmet e ku mirov dengekî baş ê bas bibîne".* Lê ji bo niha, koro li wan salonan ku **Mihemed** bi qasî ku ji destê wî tê hewlê dide ku eyar bike, bi pereyên sembolîk û konserên car caran. Îro xwepêşandanên ***Partîya Azadî û Dadê***, sibê, ew hêvî dikin ku ***Operaya Qahîreyê*** ji ber rewşa neseqegîr a welêt peymana wan a konserê betal neke.

*"Lê bi vî awayî hûn ber bi ku ve diçin?"* zilamê ku li bas-gîtara wî li piştê, li mekana ***Birayên Musliman*** bi awayekî şikbar awirek li **Ahmed** veda. Wî bersiv da: *"Ber bi temaşevanên koroyê".* Niha heman zilamî mist da milê wî, hilkişîya ser dikê. Piştî mehan, di wêneya gotarekê de **Ahmed Al-Samman** bi basa xwe û endamên koroyê di paş de derketin. Gotarê digot xwepêşandanên *Partîya Azadî û Dadê* çalakîyên bi reqs in. Hevalên wî henekê xwe bi wî kirine wekî ku ew endamê hawîrdoreke dîskoyî ya bin erdî ya *Birayan* be. *"Tiştê herî nebaş a gîtarê, lêdana koroya Birayan rû bi rû mayîna fikr û ramanên mirovan e, ew hîna jî fam nakin, wekî wê gotarê, ew qebûl nakin,"* ew dibêje, *"werin û bi çavên serê xwe me bibînin".*

**Ahmed** di komên din de li pîyano û ûd, herweha li bas-gîtarê dide. Wekî her kesê din ê di koroyê de, dudilîya kevin wî narehet dike. *"Muzîk olê temam dike, dema ku ew dike ku em baştir bibin, li hevdu muqate bin, bêhtir bibin mirov."* **Ahmed** dersên muzîkê dide zarokan, *"ez dixwazim isbat bikim, ku hînkirina zarokan a muzîkê bi temenekî piçûk, dema ku ew mezin bibin, dê wan bike mirovên çêtir".* **Ahmed** heyranê *Latin-Jazz* û **Dean Martin** e û piştgirî nade siyaseta *Birayan* û ji hevkarên xwe yê koroyê **Diaa** û **Îslam** hez nake, ew li her tiştî guhdarî dike. Lê belê koroyê bandorek li ser wî kiriye, *"Ew bi serê xwe serkeftinek e, ka **Birayên Musliman** xwe gihandin heta ku derê".*

Dibe ku koro xetayek bû, diviya bû ku **Mihemed**ê ciwan û hevalên wî dengê xwe di stranan de bilind nekirina. Dibe ku serokatîya ***Birayên Musliman*** li dij wê yekê biryar bidaya. Dibe ku ew piştî destgîrkirin û şevên bêxew ên di hucreyên polîsan de zindî nemaya. Dibe ku ew di nav siyaset, ol û hunerê de li cihekî winda bibûya. Bîst û du sal û çar kom û ew hîna jî distrên. Çawa ku **Ahmed**ê li basê dixe wê dibîne, bi ya rêya xwe ya piçûk ew dîrokê çêdikin.

* Rojnamevana rûsî-misirî ku li Qahîreyê dijî.

Wergera ji îngilîzî: Celîl Kaya

Biryara Birayên Musliman a destnîşankirina namzedekî ji bo hilbijartinên serokdewletîyê nakok e bi angajmanên wan re. Ev biryar di nav birêveberîya wan de bi pêncîûşeş dengan li dijî pêncîûdu dengan hat qebûl kirin. Vê yekê bi tenê parçebûnên di nav rêxistinê de xirabtir kirin. Rêxistin bi xwe mexdûra têkilîyên xwe yên tevlîhev ên bi eskeran û reqabeta komên selefî re ye.

### Ewlenebûna bi paşeroja şoreşên li Rojhilatê navîn

# Birayên Musliman ên misirî di davika plûralîzmê de

Alaa Al-Din Arafat *

Li Misirê, di hilbijartinên parlamentoyê yên 2011-2012ê de, koma ***Birayên Musliman*** serketineke pirşingdar bi dest xist. Wê nêzî nîvîyê dengan girt û ji 498 kursîyan 235 bi dest xistin, lê partîyên din ên cîhadperest yên sunî (selefî) ji % 30ê dengan girt û 123 parlamenter bi dest xistin. Êdî, *Birayên Musliman* ên di organên parlamentoyê de xwedî hêz in, divê dîsa jî li hemberî çar xeterên ku rêxistinê tehdîd dikin derkevin: Encamên ketina wan a qada siyasî, yekser ketina "nav kar"; alozîyên ji ber pêşketina wan a siyasî û rewşenbîrî; nakokîyên navxweyî; û zexta selefîyan. (1)

Di tevahîya dîroka xwe de –ew ji alîyê **Hassan Al-Banna** ve, di 1928ê de hatiye ava kirin–, Birayan peymanên pragmatîk bi hêz û desthilatên cihê re girêdan. Ya bi **Qiral Farûqî** re, ku di 1936ê de li textê desthilatdarîyê rûniştibû; ya bi "efserên azad" re, ku di 1952yê de **Cemal Abdul Nasir** ji desthilatê dadixin (Bira di 1954ê de dê li hemberî Nasser derkeve û duçarî serkutkirineke erjeng bû); an piştî 1970ê, ya bi serokdewlet **Enwer Sedat** re. Yê dawîn ji bo li hemberî nasirî û çepan têbikoşe ew ji xwe re kirin maşe.

Piştî 1981ê û hatina ser desthilatê ya Husnî Mubarek weke serokdewlet, têkilîyên wan ên bi serokdewlet re di navbera lihevkirin, toleransa qismî û tepeserîya bijartî de çûn û hatin. Bi vî awayî, berîya ku di hilbijartinên parlamentoyê yên çileya pêşîn a 2010ê de ji hemî mafên xwe yên nûnerayetîyê bêpar bimînin, ***Birayên Musliman*** ên ku tu cara weke hêzeke qanûnî nehatibûn nasîn, di dema hilbijartinên giştî yên 2005ê de (weke berendamên "serbixwe" hatibûn hilbijartin) karî ji % 20ê kursîyên parlamentoyê bi dest bixe. Ev lihevkirinên taktîkî yên ji alî herkesî û Rêberê mezin ê wan –di navbera 2004 û 2009ê de–, **Mihemed Mehdî Akif** ve jî dihatin zanîn, bizebit ji alîyê wî ve hatin nas kirin. Wan sernermîya rêxistinê didît, lê ew her wiha jî ji îmaja wê ya weke hêzeke mixalefetê nexweş bûn.

Gava ***Konseya Bilind ya Hêzên Leşkerî*** (KBHL) dest danî ser desthilatê, piştî ketina **Husnî Mubarek** di sibata 2011ê de jî, wê adeta lihevkirinê dom kir. Weke ***Birayên Musliman***, KBHLê jî bi dirêjîya dema şoreşê bi roleke nezelal rabû û got; ew dijmina demokrasîyê ye; ew hêzeke rabirdûyê ye. Tevî vê jî, meha hinguvîn dirêj neajot. Heta ji ber sê sedemên bingehîn xetera ku bibe meha şerî derket: Birayan projeya Destûrê ya ji alîyê **Elî El-Salmî** ve, ku wê demê cîgirê serokwezîrî bû, hate pêşkêş kirin û mafê destnedanê ji bo siberojê ji artêşê re misoger dikir û di çirîya paşîn a 2011ê de hate pêşkêş kirin, red kir; wan ji bo amadekirina destûra paşerojê dana roleke siyasî ya serekî ji generalan re nexwest; di encamê de, tevî ku KBHLê dadgehkirineke sethî dixwest ku dê berpirsiyarîya gelek endamên wê di tarîyê de bihişta; di dawîyê de wan di bin bandora kolanê de, dadgeheke rastîn ji bo serokdewletê berê **Mubarek** xwest.

Birayên Musliman dikaribûn bixwestana bidin ser riya *Partîya Adalet û Geşepêdanê* (AKP) ya tirk, ku berîya wan hêdî hêdî ber bi derve de dahf bidin, sazûmaneke ku generalan tê de roleke girîng dilîstin, qebûl kirin. Lê gelo şîyana wan a karekî wiha hebû?

Tevger di bin bandora israra xwe ya li ser *daawa*yê (banga perwerdeya muslimanan) û mesaja xwe de ma, ya ku armanca wê ya dawîn, avakirina xelîfetîya îslamî ye. Biryara wê ya ku di dîroka wê de cara yekê bû, xwest di 2011ê de partîyeke siyasî ya neteweyî, *Partîya Azadî û Edaletê* (PAE) damezrîne, ew mecbûr kir ku meydana xweş a mixalefetê bi cîh bihêle, her wiha jî dev ji hin daxwazên xwe yên gerdûnî berde û bersiva daxwazên beşek hilbijêrên xwe yên di warê kar, perwerde, nojdarî, gendelî, geştûguzarî û hwd. de bide.

### Pirsgirêka mezin: Gelo rêxistin ji bo xelkê ye, yan ji bo Xwedê ye?

Vatinîyeke zor, gava ku beşeke milîtan û sempatîzanên wê bi prensîbên xwe yên berê ve girêdayî dimînin, ev jî li gel lihevnekirinên nifşên cihê, di nav rêxistinê de nakokîyan zêde dike. Êdî teorîsyenekî weke wî xurt ku karibe dema nû şirove bike tuneye: Ji mirina danerê wê, **El-Benna** – ku ji ramanwerekî bêtir organîzatorek bû– virde, û bandora **Seyid Qutb** ê ku di 1966ê de hate bi dar da kirin, ji xeynî waizekî kal, şêx **Yûsif El-Qeredawî** (di 1926ê de bûye) pê ve kesek nemaye, ew jî ji alîyê kanala El-Cezîreyê ve hatiye navdar kirin û li kanalê hikûm dike, wî jî van çend mehên dawîn nîşan da ku ew rexnegirekî taktîkê siyasî yê ***Birayên Musliman*** û daxwaza wan a monopolîzekirina desthilatê ye.

Pirsgirêkeke din ji bo rêxistinê: Ronesansa pirdengîyê ye li Misirê, ku di himêza wê bixwe de jî şewq vedide. Hin endam girêdayî mihafezekarên kevin in, yên din bi nifşên nû ve girêdayî ne û bi awayekî giştî vekirîtir in; hinek li ser riya sofîtîyê ne, yên din selefî ne. (2) Ji ber ku rêxistin, di tevahîya dîroka xwe de, nikaribû beşdarî gotûbêjên vekirî bûbûya, hergav xwestiye li nakokîyên xwe bide mandelê.

Yek ji pirsgirêkên herî mezin ê ku rêxistinê parçe dike di warê serwerîyê de ye: Gelo ew ya xelkê yan ya Xwedê ye? Û, her bi vî awayî, wateya demokrasîyê ji bo wê çi ye? Tevî ku Birayên ciwan û baskê vekirî yê tevgerê girêdana xwe ya bi demokrasîyê û hevwelatîtîyê re piştrast dikin, nifşên kevin xwe bi ***hakimîyah***ê, serwerîya pîroz ve girê didin.

### Pirrengî yan parçebûn?

Daxwîyanîyên newekhev yên ku piştî ketina **Husnî Mubarek**î ji sefên wê tên, ne ji ber bikaranîna cotstandardîyê, lê ji ber cudatîyên wê yên navxweyî ne. Ev cihêtî dikarin ji bo hebûna wê jî xeter bin. Ev yek guherînên ***Yekîtîya Sosyalîst a Erebî*** (YSE), ku ji alîyê **Nasir** ve di 1960ê de hatibû danîn û ji çepê tundrew heta rastê tundrew hemî cereyanên siyasî digirt nav xwe, tîne bîra mirov. Bi rêlibervekirina di 1970ê ya bi îzna **Sedat**, YSE ji hev belav bû û bû gelek beş. Ev cihêbûn bi kêmanî ji panzde salan vir de di nav ***Birayan*** de hebû, lê şoreşê roja giran ew ji hev de xistin, piştî bîst salên libendemanê, binaskirina fermî ya di sibata 2011ê de, partîya ***El-Weset*** (*Navend*) ya **Ebû El-Ala Madî**, versîyona misirî ya AKPya tirkî hat ava kirin. Ev partî, piştî dema tepeserîyên mezin, daxwazên nifşên ku 1970ê de ketine nav siyasetê derdixe pêş. Ew nirxên demokrasîyê, hevwelatîtî û mafên jinan û têgeheke îslamî ya bi modernîzmê re lihev diparêze. El-Weset, ji avabûna wan a 1928ê vir de, cihêbûna yekê ya ***Birayan*** nîşan dide.

Cihêbûna duyê dema cîgirê yekê yê Rêberê Mezin **Mihemed Badie**, **Mihemed Hebîb**, di tîrmeha 2011ê de, *Partîya Ronesansê* (PR) ava kir, pêk hat. Rêxistina wî nêzîkî ya **Ebû El-Ala Madî** ye û tevlî temenê wî –ku di ser 60î re ye – ji alîyê entelektuelî ve jî ew ji heman nifşî ye. **Mihemed Hebîb**, ji bo Rêberayetîya Bilind, di 2009ê de, li hemberî **Mihemed Badie** endamtîya xwe danî û di hilbijartinên ku paşê bûn mijara minaqeşeyê de bi ser neket. Tevî ku **Mihemed Badie** û ew di heman demê de gîhaştibûn rêxistinê, ew ji alîyê fikir û meylên xwe yên siyasî ve bi tevayî ji hev cihê ne, yê yekê pêşîkêşê "îslama şaristanî" û yê din bêtir nêzîkî qutbîzmê ye (ji referansa Seyid Qutb).

Cihêbûna sisiyê gava endamê Buroya Şêwrê ya Birayên Musliman, **Ebdel Mûneim Ebûl Futûh**, bê destûra rêxistinê, xwe weke endam ji bo hilbijartinên serokayetîyê di 2012ê de nîşan da, pêk hat. Ebûl Futûh hîzîbeke serhildêr û bihêz di nav ***Birayan*** de temsîl dike, nifşekî "kevok" ê ku di nav rêxistinê de maye û dema hilbijartinê dê ji bo wî kar bike jî heye.

Heke bixwazin rê li ber cihêbûnê bigirin, ***Birayên Musliman*** divê di navbera bask û hîzîbên xwe yên cihê de bigihin lihevkirinekê; lê cîmnastîkeke wiha radeyeke bilind a hostetîya siyasî dixwaze ku birêveberên wan ên niha ji meziyeteke wiha bêpar in. Herwiha ji bo vê yekê pêşbînîyeke paşerojê jî divê ku muhafezekarên berê ji vê jî mahrûm in.

Ji alîyekî din ve, rêxistin divê bi xetera selefikirinê –her çend selefî bixwe di bin bandora *Birayan* jî– nêrîna wan a siyasî de bimînin jî–re rûbirû bibe. Rêberê mezin, weke hinên berîya xwe, heta bi qirikê di bin tesîra selefîtîyê de maye. Ji ber vê jî, gava ku berîya şoreşê hate hilbijartin, **Mihemed Badîe** dîyar kir ku ew ê li ser *daawa*yê pir israr bike. Vê bangê derfet da selefîyan ku ji salên 1970ê vir de, di bin sîwana *Birayên Musliman* de bûn, di nav rêxistinê de roleke hîn mezintir bilîzin. Di dema **Mubarek** de, bi taybetî jî dema hilbijartinên li herêmên çolter gelek keda wan di serketinên rêxistinê de hebû. Wan hêza rêxistina xwe ya xêrxwaz weke kontrola xwe ya gelek mizgevtan bi *Birayên Musliman* re par ve kir. Ev jî îdiaya ku selefî dema **Husnî Mubarek** bi siyasetê mijûl nedibûn, derew derdixîne.

### Sê berendamên serokatîyê ji heman rêxistinê

Lê belê, piştî şoreşa 2011ê, wan partîya xwe ya siyasî ya taybetî ava kir û xwe ji serdestîya Birayan xilas kir. Lê tevî wê jî hîn selefîstên dudil, bi taybetî jî hîzîba ku dema hilbijartinên serokayetîyê yên 2012ê piştgirîya şêx **Hazim Ebû Îsmaîl** kirin, mane. Ebû Îsmaîl bixwe nimûneya berpirsîyarekî ye ku piyekî wî li cem *Birayan* û yê din li nik salafîyan bû. Çûyîna partîzanên wî ji cem *Birayan,* bû sedema wendakirina ji % 20ê endamên wan û wendabûna gelek binkeyên wan ên li derdorên çolterî.

Berendamtîya Birêz **El-Awa** dê bibe sedema cihêbûneke din, ji ber ku mîlîtanên *Birayan* jî piştgirîya wî dikin. Bi vî awayî xetera derketina sê berendaman ji bo hilbijartinên serokayetîyê heye ku, bi çi awayî dibe bila bibe, dikare rayên Birayan û selefiyan jî bigrin: Birêz **Ebûl Futûh** û nifşê nû; **Hazim Ebû Îsmaîl** û nifşê wê selefî-qutbî; û El-Awayê ku her wiha jî nûnerayetîya mihafezekarên kevn dike. Ji ber vê sedemê **Mihemed Badîe** dîyar dike ku divê *Bira* piştgirîya berendamekî li ser lihevkirî bikin.

Lê guherînkarîya bingehîn xetera hatina komên selefî, ên bêtir pragmatîk bixwe ye. Mirov dibîne ku ew di nav partîya xwe ya herî bihêz, ***El-Nûr***ê de, ku sed û heft parlamenter derxistibûn, xwiya dibin. Li alîyê din rêxistinên din, ên weke ***Partîya Avakirin û Geşepêdanê***, baskê siyasî yê ***Cimeta Îslamî***, nêzîkî cîhadîzmê ne. Di nav *El-Nûrê* de, birêveberên weke Birêz **Nadir Bekir, Mihemed Nûr** û **Yûsarî Hamad** bi nifşên nû yên *birayan* re hemfikir in. Ev nêzîkayîya di navbera PAE û El-Nûrê de dê paşeroja her du partîyan jî tayîn bike. Mecbûrbûna qebûlkirina siyaseteke hîn pragmatîktir, wan dixe bin xetera xeyalşikestîkirina dengdarên xwe – ku, bi taybetî di kampanyayan de ji bo "xelîfetîya îslamî", "rizgarkirina axa Filistînê" yan jî cîbicîkirina şerîetê dengên xwe dabûn –, bêyî ku herwiha karibe bersiva hêvîyên wê yên di warê aborî û civakî de bide. Û her bi vî awayî wendakirina pêngava xwe ya ku serketina di hilbijartinên parlamentoyê de bi xwe re anîbû.



İsmaîl Çoban: **Rev**, boyaxa rûnî li ser tuwalê, 206 x 196 cm

* Birêveberê lêkolînê li Navenda Lêkolîn û Belgekirina Aborî û Hiqûqî (Cedej), Qahîre; nivîskarê *Hosni Mubarak and the Future of Democracy in Egypt / Husnî Mubarek û paşeroja demokrasîyê li Misrê,* Palgrave, 2012

1 François Burgat, "Salafistes contre Frères Musulmans / Li hemberî Birayên Misilman, Selefîst" bixwîne, *Le Monde diplomatique,* hezîrana 2010ê

2 Ji rêkxistinekê bêtir, selefîzm cereyaneke fikrî ya pir cihê ye. Ew vegera dema Mihemed pêxember û hevalên wî yên wê demê dixwaze û methê wê dide (mana *selef,* bi erebî "bapîr" e). Sofîzm tevgereke mistîk e ku li ser bingeha biratîya ji alîyê rêberên rûhanî ve hatiye ava kirin. Ji ber ku wê derdixin hemberî îslamtîyê, di çapemenîya rojava de gelekî cîh digre, lê rastîya wê bi tevayî tiştekî din û kompleks e. Herwiha, li Fasê, desthilatdarî xwe bi zorê li rêkxistina şêx Ebduselam Yasîn, El-Edl Wel-Îhsan (Edalet û Xêrxwazî), radigire û hêza herî xurt a muxalefetê ye. Ew bêtir di bin bandora tecrûbeya sofîtîyê ya danerê xwe de ye, ku herweha tecrûbeya gelek rêberên îslamîst, ên weke El-Bena û Hesen Tûrabî yê sûdanî ye

Wergera ji fransî: Yaqûb Karademir

# Ebdulla Peşêw û pirsa nasnameya neteweyî

JAN DOST



İSMAİL ÇOBAN: **Dîmenên mirovan III**, boyaxa rûnî li ser tuwalê, 120 x 100 cm

Ebdula Peşêw di vê serdema me de yek ji ronakbîrên kurd ên herî girîng e. Ew ji bilî helbestvanîya xwe ya nirxbilind, xwedan helwêsteke siyasî ya serbixwe ye jî. Dibe ku ji bo xwendevanên *Le Monde Diplomatique a kurdî*, jîyana **Peşêw** ne ewqasî tiştekî nû be, lê ez di wê bawerîyê de me ku ev bîr û bawerîyên **Peşêw** ên ku di gotara wî de hatine dê ji bo xwendevanan gelekî balkêş bin û hin pirsan zelal bikin. Gotara mamoste her çendî ku ji zû de hatibe nivîsandin û belav kirin jî, dîtin û boçûnên tê de tim aktuel in. (1)

Ew di destpêkê de weha dinivîse:

*"Swêdîyên li Fînlandiyayê ji % 6ê rûniştevanên welat pêk tînin, li girava Ålandê jî ku hejmara wan tenê 25 hezar kes in, otonomîya wan heye. Divê em vê jî bizanibin ku otonomîya wan ya rasteqîn e! Ew xwedîyê ala xwe ya taybetî ne, parlemana wan heye, destûra wan a lokal heye, heta peywendîya wan ya bazirganîyê jî bi welatên derve re heye. Zimanê wan jî ne tenê li girava wan bi xwe, belkî li seranserî Fînlandîyayê, zimanekî fermî ye. Lê ne mûmkin e tu guh li swêdîyekî bikî ku bi zimanekî din, an jî Xwedê neke bi zarokê xwe re bi zimanê fînî biaxive, yan jî zarokên xwe di xwendingeheke fînî de bide xwendin".*

Herweha Ebdula Peşêw dibêje ku ne şert e asîmîlekirin bi darê zorê be, asîmîlasyon projeyeke dûr û dirêj e:

*"Ne merc e ku helandina gelên jêrdest her bi qedexekirina ziman a bi zordarîyê be. Nexêr, di bin sîya teknolojîya ragehandin û nebûna şîyarîya neteweyî da, asîmîlekirin encameke objektîv a bi hev re jîyana dûr û dirêj a gelê serdest û bindest e. Em ne vîetnamî ne, bi tenê tank û firoke û eskerên dagîrker bibînîn û gelê serdest jî bi hezaran kîlometre ji me dûr be. Ti dîwar û çeper me û dagîrkerên welatê me ji hev naqetînin. Em ne bi tenê hev ol in, rengê postê me jî yek e û adetên me jî nêzîkî hev in û dîrokeke me ya tevîhev heye, belkî wek **Bülent Ecevit** dibêje: "Em mîna goşt û hestî têkel in". Ez bi xwe ji genetîkê fam nakim, lê vê rastîyê dizanim ku alîyê ku bi hejmara xwe pir e û bi hêztir e, hertim bi ser alîyê kêm û lawaz de serdest e".*

Peşêw pê de diçe û asîmilasyonê bêtir dide nasîn:

"*Helandin proseyeke hêdî, veşartî û domdirêj e, bi salekê û du salan encamên wê nayên dîtin. Di dîrokê de bi dehan gel ji navê hatine rakirin. Û îro jî bi dehan netewe li ber candayînê ne û hinek ji wan jî (çermesor û samî/laponî) mîna tiştekî ekzotîk tên parastin."*

Peşêw hewl dide ku nimûneyekê ji dîroka cîhanê ya nêzîk bîne û bi reqeman isbat bike ku çawa asîmîlasyon dikare hêdî û bêyî şerekî mezin pêk were. Ew weha şirove dike:

*"Yekîtîya Sovyetê, mîna amrazekî helandina kêmneteweyan baştirîn nimûne ye: Di destpêka salên 1980yê de nifûsa Qazaxistanê 15 053 000 bû. (2) Ji vê hejmarê tenê 5 300 000 kes qazaxî bûn. (3) Ger wiha be, di desthilatdarîya 60 salî ya Sovyetê de, rûsên birayên mezin karîne bibine zêdetir ji nîvê xelkê Qazaxistanê. Hejmara latîvîyan di sala 1940ê de 2.000 000 kes bû (4), lê di sala 1981ê de (37 sal piştî dagîrkirina wê) hejmara rûniştevanên vê komarê bûye 2 539 000 kes. Lê ji vê hejmarê tenê 1344,000 kes lativî bûn. (5) Ev tê wê wateyê ku di qonaxa çil salan de gelê lativî ne tenê zêde nebûne, belkî kêm jî bûne û di komara xwe de zêde nemaye ku bibin kêmnetewe! Ger perestroyka Gorbaçov nebûya, sed komarên wan jî hebûna, tiştekî wan nedima û ji holê radibûn!"*

Peşêw dide xuya kirin ku jîyana dûr û dirêj ya di bin destê neyaran de û projeya bêrehm a asîmîlasyonê ku li Kurdistanê hatiye meşandin, hiştiye ku psîkolojîya miletê kurd tevlihev bibe û her berhemeke asîmîlasyonê pê xweş û şêrîn bê:

*"Carna li bernameyên erebî dinêrim, ne bi destê min e, mesela wî polîsî tê bîra min: Dibêjin polîsek hebû, qet di jîyana xwe de izin nestandibû. Di dawîyê de di temenê xwe yê pîrîyê de izinekê distîne. Lê polîsê pîr hemû rojê bi derketina roja berê sibê re, tê, li ber derîyê cihê ku hertim lê disekinî, careke din disekine.*

*Ne bi destê min e, carina rewşa me mîna rewşa wî polîsê navbirî tê ber çav. Me ne carek ji caran e ku izin ji xizmetkarîyê standiye, lê dîsan bi piyê xwe careke din tên ber derîyê cihê polîsan. Dibe bê feyde nebe, di destpêk, an jî di dawîya bernameyan de, deng û behsê Kurdistanê bi zimanê bîyanîyan jî bên weşandin. Lê tenê deng û behs, ne tiştê hunerî.*

*Bêguman, wek prensîp, kes nikare li dijî bernameyên hunerî be ku bi zimanên gelê cîran têne pêşkêş kirin, bi wî mercî ku em jî xwedîyên bi dehan kanalên TV bûna û her kanalek jî bi şev û roj zirme-zirm jê bihata! Lê ewa ku niha rû dide û diqewime tenê û tenê xwe bi kêmzanîn û valaçûyîna parek ji wan çend demjimêrên ku kurdan heye, ji bo ku qe nebe zimanê bav û kalan ji bîr nekin.*

*Kanala tv.yekê ku bi mîlyonan kes lê dinêrin, divê gelek hişyarî pirsgirêka ziman be. Ew zimanê ku di sazîyên ragehandinê de bikar tê, pêwîst e di navbera wî û zimanê çayxaneyan de cudahîyek hebe".*

**Peşêw** di wê bawerîyê de ye ku bisporîya di warekî de ne mercê tekane ye ku kesekî bispor bibe mêvanê bernameyeke TVyê, ew dibêje ku şertê yekem zimanê wî kesî ye:

*"Bisporî û serkeftina di warekî hunerî, an jî zanistî da, ne bes in bo wê hindê ku yek ji bo niqaşeke televîzyonî bê bang kirin. Divê ew kes, qe nebe heta radeyekê agehdarê zimanê nîvstandard be ku îro ji bo nivîsandinê bi kar tê. Ez qet ne bi zimanê petî re me û ez di wê bawerîyê de me ku zimanekî petî di cîhanê de tuneye. Ji bo bikaranîn, an jî xweîfadekirina daxwaz û kar û barên rojane, ku zimanê kurdî yek ji wan zimanên herî dewlemend e. Her peyveke bîyanî jî ku hatibe nav zimanê me, me kirasê zimane xwe lê kiriye û xwedîyê wê êdî wê nas neke! Bab û kalên me qet nehatine peyveke bîyanî li gor gramer û fonetîka zimanê eslî bi kar bînin, belkî hertim bi selîqeyeke rewan û di dareke xwemalî da darijandine.*

*Nizanim, ji bo bernameyeke televîzyonî, di zankoyeke mezin û giran da, çima divê keçekê hilbijêrin ku nikare du axaftinên rêkûpêk bike? Ew jî ne di derbarê felsefe û zanistê de, belku di derbarê dostanî û hevalbendîyê de! Nedibû berîya programê guhdarîya zimanê wê bikin? Qey zimanê xwelîserê kurdî peyvek tê de nebû li cihê **"sedîq"** bi kar bê? Nedikarî bêje **heval, yar, dost, birader**... ûhd? Zimanê kurdî li cihê **"zewac"**a erebî tiştek tê de nebû? Kengî û çawa rewa ye ku di çend risteyan de, ev hemû peyv û gotinên erebî bên gotin:"...**eger sedaqet nebit heyat nabit"**,* (6), ***adat û teqalîd, îhtîfaz, rewabit, efkar, zewac, însan, zirûf, tehekum**...ûhd."* (7)

*Lê ev ne tenê rewşa kesekî/e ji rêzê ye,* Peşêw dibêje ku dîyardeya bikaranîna peyvên bîyanî di nav axaftina bi kurdî de gihiştiye radeyekê ku heta li ba nivîskarên kurd jî heye. Ew vê mînakê tîne zimên:

*"Êvara roja 29.05.2000ê Kurdistan TVya delal, bi birayekî nivîskar re çavpêketinek di derbarê xwe vekişandina Îsraîlê ji Libnanê kir. Ger kesê ku erebîyek baş nizanibe, bawer nakim ku jê fam bike: **Heq, însîhab, îhtilal muhtel, qenae, quwwat, muqaweme, hucûm, qewanînî diwelî, îstî´imar, cenûb, qezîye, muzahîm, îhtîmamatî diwelî, xîlafatî herekatî kurdî, mezîye, haletî îhtîlal, kutle, îstîfade, helêkî nîhayî, heqteqrîr el mesîr, wezi`, hîmayey** Kurdistan, **merkezî qerar**...hd. Êdî ger ev zimanê nivîskarekî be, li ser ekranê, ne ku li çayxanekê, divê rewşa xelkê normal ê civakê çawa be?*

*Ger ev rewşa nîv azadbûyî ya nîştimanî be, ku kêm, an jî zêde bi salan kurdî tê de hatiye xwendin, divê parçên din çawa bin, ku xwendingehek kurdî tê de nebûye û hê jî nîne?"*

Li ser neteweperestiya tirkan jî, **Peşêw** weha dibêje:

*"Di neteweperestîya tirkan de jî taybetmendîya dagîrkerên fransî heye. Ew taybetmendî jî sepandina ziman e. Ger ji tirkan re here serî, ne tenê bi laş, dê te bi can jî bikuje, kesayetîya te neşirîn û pir kirêt dike, yê wisa li te bike ku kînê ji jîyana xwe ya derbasbûyî bikî û ji wê yekê şermê bikî ku ji dayik û bavekî kurd hatî dinê.*

*Kemalîstan piranîya kurdan jî bi vê hindê perwerde kirine ku, zimanê kurdî zimanê mirovên nexwende, qereçî, paşketî, çete û rêgira ye. Tirkî jî zimanê şaristanîyet, zanist, rewşenbîrî û pêşketinê ye, dayika hemû zimanên cîhanê yên zindî ye. Vê rewşê wisa li kurdan kiriye ku, ji xwe şermê bikin û hêza wan nemîne ku bi zimanê xwe yê zikmakî bipeyivin. Partî û rêxistinên kurdan jî, di pratîka xwe de, ne tenê li dijî vê siyasetê nesekinîn, lê herwiha bi xwe jî bi rêya medya û edebiyata xwe, bi navê pêşkevtinxwazî û înternasyonalîzmê, zimanê tirkî anîn nav mala hemû kurdan.*

*Helbet, ez bi giştî behsa tiştê berbiçav dikim, lê çi di nav refên van partîyan de, çi jî li derveyî wan, hinek rewşenbîrên naskirî û şêremêrên mîna **Musa Anter** rabûne, û pirsgirêka zimanê kurdî ji xwe re kirine doza jîyan û mirinê. Lê mixabin, têkoşîna van kesên camêr jî, ji alîyê partîyan ve ti piştevanîya cidî nedîtiye".*

Her weha mamoste **Peşêw** fenomena xwekêmdîtinê li ba kurdan di riya alavên medyayê û her cure alavên din ên derbirînê de tîne ziman û bi tundî rexne dike:

*"Yek ji rûyên herî xuya yên medya kurdan ya bi zimanê cîranên wan, rûxweş nişandan û xweşîrînkirin e li ba wan. Carna ew rûxweşî û xweşîrînkirina han digehe radeya zimanlûsî û dibe ku bandoreke negativ jî bike li ser îmaja"wêne"yê kurd. Jixwe bav û kalên me vala negotiye: **Ne hinde tal be ku te nexwin û bavêjin, ne hinde jî şirîn be ku te qût bidin**. Wate: her tiştek sînorê xwe heye. Medya kurdî ji xwe re kiriye adet, bi minasebet û bê minasebet, behsa birayetî û hevparîya olî û dîroka hevpar û qedera hevpar dike. Wiha nîşan dide ku jîyana me bê van birayên mezin cehneme ye. Hemû roj vê hindê ji wan re dubare dike, ku nivîskarên me bi zimanê wan nivîsandiye, hunermendên me bi zimanê wan stiraye, zanayên me xizmeta çanda wan kiriye, zarokên me ji doza wan re fîdakarî kiriye. Kurt û kurmancî: Xwedayê mezin tenê em bo wê hindê afirandine ku solan ji wan re li ber nigê wan rast bikin. Ev jî bûye sedem ku cîranê me, me bi yên xwe bizanin û me nexin nav xanîyekî taybet. Tirk ti cara nikarin bêjin ermenî û cihû li Tirkiyê tunene, lê bi rûyekî peyt dibêjin ku ti "kêmneteweyek" bi navê kurd li Tirkiyê nîne. Li dewleta Sûrîyeya "pêşkevtinxwaz" çend hezar ermenî û asûrî dikarin bi zimanê xwe bixwînin, lê du mîlyon kurdên ku hevolên wan in, ji heman mafî bêpar in. Heya kurd zêdetir behsa **Selaheddînê Eyûbî** bikin, ew zêdetir wî bi yê xwe dizanin! Ji bona wê jî ez di wê bawerîyê de me, çiqas medyaya kurdan li ser xalên hevpar îsrarê dike, divê ewqas jî îsrarê li ser wan sînoran bike, ku kurd û cîranên wan ji hev cuda dikin. Ew xwecudakirin bi ti şêweyekî serkêşî û tunekirina wan nîne, berevajî wê, naskiririna taybetmendîyên wan e jî. Cudatîya bê dijminahî jîyanê rengîntir û dewlemendtir dike. Xwe kêmzanîn û kêmdîtina kurdan, xwedî dîrokek dûr û dirêj e. Bi sedan salan erebî zimanê ol, farsî zimanê edebiyat, tirkî jî zimanê desthilatdarîyê bûye. Zimanê kurdî jî, ji şerma van zimanan, ber bi çîya û gundan çûye, xwe layîqî şaristanîyê nedîtiye."*

Peşêw ji jîyana xwe ya rojane û ji jîyana kurdên penaber ên li Ewropayê mînakên gelekî balkêş li ser gîyanên têkçûyî, li ser ruhên talanbûyî dide:

*"Dema ku ez li Moskovayê xwendevan bûm, min hinek kurdên bakur jî nas kirin. Û qaşo tevde ji ber kurdîtîyê mişext bibûn. Elheq jî kurdîyeke baş dizanîn û bi me re (bi me yên çîyayî û tirkînezan re!) tenê bi kurdî diaxivîn, lê hema ku serê kurdekî din yê bakur derdiket, yekser gera ziman diguherî û **"geldim bildim"** dest pê dikir! Baş e, rast e me got li Tirkiyê zimanê kurdî qedexe bû, lê li Moskovayê ? Va ye me got, li Kurdistanê nabe zarok hînî zimanê xwe yê zikmakî bin, lê li Ewropayê?! Va ye li wir navên kurdî qedexe ne, lê li Ewropayê evqas **Deniz, Orhan, Turan, Eylem** û **Yildirim** çi ne ku weke kuvarkên biharê şîn dibin? Sala par pênc kes bi navê nivîskarên kurd, hatibûn kongra nivîskarên **Pena Cîhanî**. Çar kes ji bakurê Kurdistanê bûn. Di wan çend rojên ku em bi hev re bûn de, min nekarî tiştekî weha bikim ku ew birayên min, ku tev bi zimanê kurdî diaxivîn, di nav xwe de jî bi zimanê kurdî bipeyvin! Lê ji alîyê din jî Xwedê giravî hatibûn wira ku li ser tore û zimanê kurdî biaxivin û zimanê me biparêzin! Dema ku di roja sêyem de, kongrê li ser pirsgirêka kurdî konferanseke taybetî girêda, nûnerê **Pena Kurd** di dewsa ku bi zimanê xwe yê zikmakî biaxive, dest bi zimanê tirkî kir! Cihê sosretmayînê di vir de bû ku werger jî kurd bû!"*

1 Ev gotar (***Çend Têbînîyên Serpêyî Di Derbarê Medya û Ziman de***) di 2000ê de, di rojnameya ***Baskar*** de hatiye weşandin, paşê di hijmara 91ê ya heftenameya MEDIA (01.04.2001) de dubare hate weşandin. Di 2003yê de ji hêla **Mihsin Seyda** û **Erdelan Hesen** ve bo erebî hate wergerandin û di kovara **El Hiwar** (no: 38/39) de hate weşandin. Di 2004ê de rojnamevanê kurd **Kakşar Oremar** ew di malpera **Tirêj**ê de bi zaravayê kurmancî weşand. Min di vê nivîsa xwe de ev her sê versiyon ji xwe re kirin bingeh; ya MEDIAyê, ya **El Hiwar**ê û ya malpera **Tîrêj**ê. Piranîya vê nivîsê xwe sipartiya ya hêja Kakşar Oremar. –**Jan Dost**

2 Sovyêtiski însoklopîdîçêskî slavar. Mosko, 1985, R.522

3 Her ew jêderê berê

4 Nasîlênyê Mîra, Moskov 1989, Xişte- hejmara 3, rûpel 10

5 Sovyêtiski însoklopîdîçêskî slavar. Mosko, 1985, R.688

6 Bi erebî ye ango: Eger hevaltî nebe, jîyan nabe

7 Kurdistan TV, êvara roja 26.05.2000

www.arsivakurd.org

# ÇAND Û HUNER

## 'HAWAR'A KURDAN 80 SALÎ YE

# 'Hawar' hê jî mîna stêrkekê diçirise

PERWER YAŞ

Wekî ku zarokeke wî çêbe kêyfa wî dihat. Lê li gor wî ev zarok ne bi tenê ya wî bû, ya hemû kurdan bû. Pêwistî bi alîkarîya herkesî hebû. Her kurdek divê xwedî li vê zarokê derketa. Navê wê zarokê "Hawar" bû. Xwedîyê wê hê di hejmara pêşî de baş zanîbû, wateya wê ji ya kovarekê zêdetir e û heya ev gel hebe, dê di asoya çapemenî û wêjaya vî gelî de mîna stêrkeke geş biçirise. Lewra dema ewî ev kovara ku hejmara pêşî ji 16 rûpelan pêk dihat, girt destê xwe, pir kêyfxweş bû, mîna zarokeke wî ku nû hatiye dinyayê himbêz kiribe. Jixwe rewşenbîrên nifşê dûvre dê vê gava dîrokî wekî "Hawar hat hawara me" bi nav bikiraya. (1)




Hejmara 1ê ya 'Hawar'ê

Mêjû; 15ê gulana 1932, roja yekşemê... Cih; paytextê Suriyê Şam, Taxa Kurdan. Celadet Elî Bedirxanê 39 salî hem di jîyana xwe de, hem jî di dîroka kurdan de rûpeleke nû vekir. Navê vê rûpelê "Hawar" bû. Vê rojê, rojnamegerî û bi nivîsandina bi kurdî ku li paytextê Misirê, Qahîreyê roja 22ê Nîsana 1898ê dest pê kiribû, gihişt qonaxeke nû. Ji ber ku Celadet bi wêrekîyeke mezin di Hawarê de dest bi nivîsandina tîpên latînî kiribû. Kurd ne xwedî dewlet û dibistan bûn, wê demê bê sazî û bê dezgeh bûn jî. Bi tenê derfetek hebû li pêşîya Celadet, divê kurd bi xwendina Hawarê fêrî tîpên latînî bibûna. Belkî ji ber vê bû ku di sergotara hejmara pêşîn de ev bang dikir;

*"Hawar dengê zanînê ye. Zanîn xwe nasîn e. Xwe nasîn ji me re rêya felat û xweşîyê vedike. Her kesê ko xwe nas dike, dikare xwe bide nas kirin. Hawara me berî her tiştî heyina zimanê me dê bide nas kirin. Lewma ziman şerta heyinê ya pêşîn e. Hawar zarokekî nûza ye. Zaroka me ye; zaroka Kurdan e. Wek her zarokî bi xweyîtîya dêûbav, bira û pismaman dikare bijî. Herkes, her Kurd dikare arîkarîya Hawarê bike. Tukes mebêje ku, ez mirovekî reben û nekêrhatî me. Belê, tukes vê xeberê mebêje, herkes bi tiştekî, bi awakî dikare bê hawara Hawarê."*

### Stenbol-Munîh-Şam

Celadet Elî Bedirxan di sala 1897ê de li Stenbolê hatiye dinê. Lê belê li gor hin çavkanîyan sala ji dayîkbûyîna wî 1893 ye. Nevîyê **Mîr Bedirxan Paşa** bû ku di sala 1847ê de li herêma kurdan desthilateke xurt ava kiribû û osmanî jê çavsor bûbûn. Dema Celadet tê dinê, bavê wî **Emîn Elî Bedîrxan** ji neçarî li Stenbolê bi cîh bûbû û destûra wan tûnebû ku ji vî bajarî derkevin. Siltan Evdilhemîd malbatê sirgûnê Yemenê dike. Di sala 1908ê de dema Evdilhemîd ji text tê xistin, malbata Bedirxan careke din tê Stenbolê. Celadetê ciwan piştî dibistana xwe ya seratayî û navîn, wekî serbaz di enîya Qafqasê de tevlî şerê cîhanê yê yekem dibe. (2)

Malbata Bedirxanîyan li gel hemû zext û defan dev ji kurdîtîya xwe berneda. Komara Tirkîyê ya nû ku zimanê kurdî qedexe dike, di derbarê Emîn Elî Bedirxan û du kurên wî de hukmê îdamê derdixe. Careke dî sirgûnek li pêşîya malbatê ye. Bedirxan tevî malbata xwe berê xwe dide Qahîreyê, Celadet û lawê wî yê dî Kamiran berê xwe didin Ewropayê. Celadet di îlona 1922yê de tê Munchenê, li vir dest bi zanîngehê dike. Ew li wir têdigihêje ku **Bismark**, netewa alman li ser yekîtîya zimên ava kiriye. Li gor Celadet ziman jî ancax li ser yekitîya tîpan dikare bê saz kirin. Bi vî awayî cara yekemîn fikra "Hawar"ê di serî wî de geş dibe. (3)

Celadet, piştî qedandina zanîngehê û temamkirina doktoraya li ser hiqûqê, di sala 1925ê de pêşî diçe Qahîreyê û paşê jî berê xwe dide Şamê ku wê demê di destê fransîyan de bû. Celadet di nav xebatên siyasî yên Xoybûnê de cih digire û ji bo tevlî serhildana Araratê bibe ku ji alîyê **Îhsan Nûrî Paşa** ve hatibû dest pê kirin, berê xwe dide bakurê Kurdistanê. Lê hê di rê de nûçeya belavbûna serhildanê tê û careke dî dizivire Şamê. Celadet li vir bi dotmama xwe Rewşenê re dizewice û heya dawîya temenê xwe li Şamê dimîne. (4) Li ser jîyana Celadet ku di roja 15ê Tîrmeha 1951ê dawî lê tê, nivîskarê navdar **Mehmet Uzun**, romaneke bêhampa bi navê "*Bîra Qederê*" nivîsandiye (1995, Weşanên Avesta).

### 'Alfabeya Celadet'

Lê Celadet bi xwe bi çapkirina kovara Hawarê, ku heya sala 1943yê tevahî 57 hejmaran derdixe, qedera kurdan jî diguherîne. Êdî di jîyana kurdî ya nivîskî de "Alfabeya Celadet" heye (Hê jî gelek kes alfebaya latînî ya kurdî bi vî awayî bi nav dikin). Celadetê ku zimanên fransî, almanî, îngilîzî, yunanî, tirkî, erebî û farisî baş dizanibû, di hejmarên pêş de dide zanîn; Ew ji sala 1919ê ve li ser vê alfebaya ku di zimanê kurdî de dihat wateya şoreşekê, xebitiye.



Celadet Elî Bedirxan

Di wan salên ku Hawar derdikeve de Şam û Kurdistana Surîyeyê him ji tevgerên kurdan re û him jî çand û wêjaya kurdî re dibe baxçeyê paşîyê yê Kurdistanê. Hawar dibe hawara ronakbîrên kurd ku hê jî di wêjaya nivîskî de xwedî roleke giring e. Ev kovar ji van nivîskar û helbestvanan re dibe stargeh: Cigerxwîn, Qedrî Cemîl Paşa, Dr. Nûredîn Zaza, Osman Sebrî, Qedrîcan, Hesen Hişyar, Reşîdê Kurd, Mistefa E. Botî, Goran, Tewfîq Wehbî, Hevindê Sorî, Şakir Fetah, Lawikê Kurd û Dr. Kamiran Bedirxan.

Lê belê barê Hawarê giran e. Ji ber ku ev alfabe û ev tîp ji xwendevanên kurd re nû ne. Celadet ji bo vê jî hê di hejmara yekem de radigihîne ku alfabeya kurdî ji 31 herfan pêk tê û dest bi hînkirina vê alfabeyê û rêzimanê dike. Di kovarê de ku carna 15 rojan carekê, carna jî mehê carekê digihişt destê xwendevanan, di rûpelek her hejmarekê de cih dida ferhenga kurdî û fêrkirina tîpên latînî. Herwiha di kovarê de çend rûpelên fransî û di hejmarên destpêkê de, ji bilî rûpelên kurdî yên bi latînî, rûpelên bi tîpên erebî jî hene. Lê belê piştî hejmara 24ê Hawar xwerû dibe latînî. Di hejmarên pêşî de tîpên **K** û **Q** bi awayekî din tên bi lêv kirin, "**Kurd**" wekî "**Qurd**" hatiye nivîsîn, herweha "ku" jî wekî "ko" hatiye bi kar anîn.

Pirrengîya Hawarê bala mirov dikşînê. Kovar cih dide çîrok, gotarên edebî, agahîyên li ser dîroka Kurdistanê, nûçeyên cîhanê û carna jî tefsîra Quranê. Lê belê Hawara ku abonetîya wê ya salane 100 frenqî bû, bi zehmetî derdiket. 18ê tebaxa 1935ê kovar neçar dimîne ku navberê bide weşana xwe û ev bêdengî heya 15ê nîsana 1941ê didome. Celadet, bi hejmara 27ê, dema cara duyem dest bi weşana Hawarê dike, gazindên xwe dike ku kurd vê hawarê divê qet ji bîr nekin: *"Kuro eyb e, şerm e, fehit e. An hinî zimanê xwe bibin, an nebêjin em Kurd in. Bê ziman Kurdîtî ji we re ne tu rûmet e, ji me re rûreşîyekî giran e."*

Çawa Celadet digot "Kurdîtî beyî kurdî çênabe" êdî ziman û çanda kurdî jî bêyî ***Hawar***ê nabe. Ji ber ronesansa ku Hawarê pêk anî, heya niha jî tu sazî û dezgehên kurdî nekariye pêk bîne. Hawar, di serdemeke ku kurd di nav taristanê de bûn, bû çirayek û kurd gihandin cîhana modern. Ew zarokê ku di 15ê gulana 1932yê li Şamê li Taxa Kurdan hatiye dinê, mezin bû û îsal 80 salîya xwe pîroz dike. Wiha dixweyê ku heya kurd li ser rûyê vê cîhanê hebin û bikaribin zimanê xwe bixwînin dê ew zarok her tim bijî.

1 Hawar, Weşanên Nûdem 34, Stockholm, 1998

2 Cizira Botanlı Bedirhaniler ve Bedirhani Ailesi Dernegi'nin Tutanakları, Malmîsanij, Weşanên Apec, 1994

3 Kürt Edebiyati Antolojisi, Mehmet Uzun, Gendaş Yayınları, 2004

4 Tekzip: Kürt Basın Tarihi, Müslüm Yücel, Aram Yayınları, 1998

# Li ser Qolyeya Cécileê

SEVDA ORAK *

Wêjeya kurdî bi taybetî jî romana kurdî di van salên dawîyê de di nav geşedaneke mezin de ye. Êdî aşkere xuya dibe ku elementên weke leheng, bûyer, cih û atmosfera romana kurdî di xwe de guhertinên mezin dike. Xwe ji derûnîya bindestîyê xelas dike, romana kurdî bi coş û kelecaneke nû rêyên nû ji xwe re hildibijêre. **Mîran Janbar** bi romana xwe ya ***Qolyeya Cécile*ê** mînakeke herî baş e ji bo romana kurdî ya nû. Janbar, romana xwe ya nû ya ku bi awayê honaka zanistî nivîsandiye, di çarçoveya vegotina xwe de em dikarin bibêjin ku ji romannûsên din vediqete. Mîran Janbar bi kurdîyeke henûn, romaneke ku dê berê xwendevanên xwe bide asoyên afirînerîyê nivîsandiye û dûpat dike ku zimanê kurdî êdî di hemû çeşnên wêjeyî de zimanekî têrtijî û çalak e.




Di kakilê romana Mîran Janbar de serpêhatîya evînekê, ku ji kevirekî biçûk welidîye ku piştre ew parçeyê kevir hem dibe navê romanê, hem jî dibe Qolyeya Cécileê, heye. Kevirek ku yekem car di zarokatîya lehengê romanê, ango Remezanî de tê xuya kirin û bi salan şûn de ew kevir dîsa li wî gundî dibe parçeyê jîyana wî.

Remezan, lehengê romanê, di zarokatîya xwe de bi malbata xwe re koçî Almanyayê dike. Piştre ji bo zankoyê diçe Parîsê û li Zankoya Sorbonneê wekî arkeolog dixebite. Rojekê li ber Çemê Seineê, Cécilea ku piştre dibe evîna wî dibîne. Kevirekî ji Şikefta Pîrazê ku di zarokatîya xwe de dîbû, dike gerdenî û dîyarî Cécileê dike. Gundê Remezan, *Şikefta Pîrazê* li Emrûda bi ser Qosera Mêrdînê ve ye. Ev gerdenîya ku bi destên Remezanî bi xwe hatiye çêkirin elementeke ayidî keştîyeke galaktîk e, ya ku di binê Şikefta Pîrazê de veşartî ye, sînyalan li der û dora xwe belav dike. Piştî ku Cécile berê xwe dide Amerikayê ji bo xwendina xwe, profesor Smith û xwendekarên wî ku li A.F.R.T (Akademîya Tekno-lojîya Nîjadên Dahatûyê) yê li ser navê Shany-X (*Şeytanê Mezin, formeke enerjîyê yê galaktîk ê ku di şerên galaktîk de demeke dirêj berê li hemberî serhildêrên galaksîyên dûr têk çûye û anîne ew di hundirê Şikefta Pîrazê ya li gundê Remezan, Emrûda Qosera Mêrdînê de, di binê erdê de, tevî wê keştîya wî ya galaktîk, wekî dîl veşartine*) dixebitin, didin şopa vê sînyala ku ji gerdenîya Cécileê derdikeve. Çîrok li gundê Emrûdê bi şerê di navbera leşkerên Shany-X ku dixwazin dahatûya hemû cîhanê biguherînin û hêzên Seyda, ango Mele Ehmedê efsûndar, Remezan, Cécile û pênc gerîlayan de bi aksîyoneke mezin berdewam dike. Romannûs sahneyên balkêş pêşkêşî xwendevanan dike.

Nivîskar romana xwe bi awayekî cuda honandiye. Roman bi nûçeyên radyoyê dest pê dike û ev rengekî didê. Ji bilî van di romanê de axaftina xwebixwe balkêş e. Leheng li çend cihan jîyana xwe dinirxînin, bi taybetî jîyana xwe ya evînê. Evîn tirseke mezin a jinê ye di vê romanê de. Lehenga jin, ango Cécile, piştî çend ceribandinên xwe yên evînê, ji evîna Remezanî jî ditirse û gavên xwe paş de davêje. Jipirhezkirinê û bengîbûnê ditirse.

Di romanê de nivîskar keçên rojhilatî û ewropayî dane berhev. Zîrekîya keçên kurd bala Remezanî dikişîne. Her wiha sîstema kapîtalîst a Rojavayê û jîyana xwezayî ya Rojhilat jî tên muqayese kirin. Qolyeya Cécileê, ji nivîskar Mîran Janbar, bi herikbarîya xwe ve li benda xwendin û nirxandinên xwendevanên xwe ye.

*Qolyeya Cécileê*
Mîran Janbar
Roman, 362 rûpel
Adar 2012
Weşanxaneya Lîs, Amed

* Wergêr, xwendevan

## Çîroka çapên Hawarê

Ji hejmara 27ê heya 57ê Hawar ji alîyê **Hemreş Reşo** ve di sala 1975ê de wekî cildekî hat çap kirin. Di sala 1987ê de **Muhamed Bekir** jî hejmarên 1ê heya 9ê li Stokholmê ji nû ve çap kir. Di sala 1998ê de hemû hejmarên Hawarê wekî du cildan ji alîyê weşanên Nûdemê ve hatin çap kirin. Xwedîyê Nûdêmê Firat Ceweri di pêşgotinê de radigihîne ku **Rewşen Xanim** hin hejmarên eslî dane wî û jê daxwaza çapkirina hemû hejmaran kiriye. Herweha Ceweri dibêje hejmarên ku li cem wî tunebûne ji Mahmûd Lewendî û rehmetîyê Mehmet Uzun wergirtine.

Di hejmara yekê ya Hawarê de Qedrîcan ji bo Osman Sebrî nameyekê dinivîsînê. Di hejmara 2yê de vê carê Osman Sebrî bi helbestekê bersiva wî dide:

### *Hawar hebe gazî li dû ye*

*Ji bona birayê min Osman Sebrî*

*Şevke tarî ye, çav çavan nabine. Keşa erdê wek gizanan lingên min ên xwas dibire. Bayê reş carnan dikeve guhekî min û di yê din re derdikeve. Qet nizanim ku li ku me? Heyina xwe bi leyistina gopal li erdê dizanim. Ev çend roj û şev e bi vî awayî diçim, nayî nayê, ji welatê berf û bagerê xelas nabim. Belê îşev jî wek her şev tarî ye. Berf û bager jî awakî li min dide; Sar e, dicemidim. Tewş e, livîn di min nema, deng ji min dernayê. Tenê sê dengan min **k**ire, gazî û hawar!..*

**Qedrîcan**

**Berdêlik**

*Ji Qedrî Canê can bira re*
Jiyîn xweş e bi xurtî
Li Kurdistan bi Kurdan,
Bav û biran çi bikim?
Hemû min tê bi derdan
Hawarê xwe awa kir
Dilê kurdan pê şa kir
Zar û ziman ava kir
Jîn û xweşî bela kir

**Osman Sebrî**

**Radyoke Qefqasê**

Me çend caran ji stasyonekî Qefqasê stranên Kurmancî bihîstine. Lê heta niho me nizanî ew kîjan stasyon e, kengê û li ser kîjan pêlan diweşîne. Me gumana Rawanê kiriye. Me hêvî ji xwendevanên xwe heye ku pê dizanin, bila bi me bidin zanîn da ku em pronivîsa wê stasyonê jî di Hawarê de belav bikin.

(Hawar, Hejmar 27, 15 Nîsan 1941)

www.arsivakurd.org

# Jîyan bi kurdî xweş e!

Radyoyên kurdî dergehên cîhaneke nû li me vekirin

## "Radyoguhdarên hêja bibihên xeberên kurdî!"

Salihê Kevirbirî

Weşangerîya radyoyên kurdî di jîyana kurdan de xwedî rol û girîngîyeke berbiçav e. Di demên ku ragihandin, çapemenî û medya wekî niha bi pêş neketibû, radyo *'neynika dilê kurdan'* bû. Bi rastî jî dema sînor ji bo kurdan *'derdê bê derman'* bûn, bi tenê qutîkek hebû ku deng, awaz, xeber, kilam, govend û serpêhatî xwe li wan sînoran dixist, ew parçe dikirin û dibûn mêvanê *'dîwan û çaqîyên'* giran.

***Radyoya Erîvanê*** li Ermenistanê, ***Radyoya Tiblîsê*** li Gurcistanê û ***Radyoya Bexdayê*** li Îraqê ji bo kurdên li herêmê peywira *'find û çirayan'* hildan ser xwe û bûn *'delalên ber dilên'* hezkirîyên peyv û gotina kurdî/ kurmancî.

Nexasim di serdema Yekitîya Sovyetên Sosyalîst de, vegotina *'her netewe xwedî maf e ku bi zimanê xwe weşanê bike'*, piştî hilweşîna Sovyetê jî li welatên Ermenistan û Gurcistanê hebûna xwe parastiye. Lewre jî di serî de ***Radyoya Erîvanê*** û piştre jî ***Radyoya Kurdî ya Tiblîsê***, di radyogerîya kurdî de du hîmên bingehîn in. Helbet *Radyoyên Bexda, Urmîye, Kirmanşah û Tehranê* jî bi têra xwe xizmeta çand, huner, ziman û edebiyata kurdî kirine.

Berîya serdana **Mela Mistefa Barzanî** ya ber bi Sovyetê, weşana Radyoya Erîvanê hem kêm bûye, hem jî herêmî bûye. Li Ermenistanê bi sînor maye û pêlên xwe negihandiye çar parçeyên ku kurd lê dijîn. Lê **Barzanî** di serdana xwe ya bi payebilindên Sovyetê de hewleke mezin daye ku hem saetên weşanê zêde bibin, hem jî pêlên radyoyê sînoran derbas bikin û xwe bigihînin Diyarbekir, Cizîr, Zaxo, Ûrmîye, Mako û gelek deverên din.

**Mela Mistefa Barzanî** xebateke bi vî awayî ji bo *Radyoya Bexdayê* jî dike. Li gor peymaneke ku di navbera **Mela Mistefa Barzanî** û rêveberîya Bexdayê de hatiye çêkirin, sala 1961ê bi awayekî fermî 'Beşê Kurdî ya Radyoya Bexdayê' vedibe. Nivîskar **Muhsîn Kizilkaya** li ser heman peymanê dibêje, *'wê di radyoya kurdî de bi tu awayî li dijî biratîya kurd û ereban weşan nehatana çêkirin û giranîya weşanê wê li ser çand û hunera kurdî bûya'*.

Vê gavê li seranserî dinyayê bi dehan radyo bi zimanê kurdî weşana xwe berdewam dikin û derîyekî ronahîyê li derîyan zêde dikin. Em li jêr ji van radyoyan çendekan pêşkêşî dêhn û bala we dikin…

***

### Radyoya Erîvanê Beşê Kurdî

Kesên ku temenê wan raserî 40 salan be, gotina bi rengê ***'Radyoguhdarêd hêja Erîvan xeber dide!'*** bi sedan caran ji devê kesên bi navê **Aznîva Reşîd, Sêvaza Evdo, Gulîzera Casim, Lûsîka Hiseyn, Nûrê Polatova, Keremê Seyad, Tîtalê Kerem** û **Leyla Kerem** guhdarî kirine.

Radyo bi xebat û keftûleftên giran ên kesên wekî **Hecîyê Cindî, Emînê Evdal, Casimê Celîl** û **Xelîl Muradov** di nîveka salên 1950yê de dest bi weşana xwe kir. Bi taybetî keda **Casimê Celîl** û **Xelîl Muradov** şayanî pesindanê ye. Li gor qeydên ku me ji navenda radyoyê girtin, **Casimê Celîl** yekem berpirsîyar e di radyoyê de. Piştî wî dema berpirsîyarîya **Xelîl Muradov** e ku 20 salan berpirsîyarî kiriye. Dîsa li gor agahdarîyan, **Aznîva Reşîd** ku jina **Xelîl Muradov** û dayika nivîskar **Temûrê Xelîl** e, di navbera salên 1955-1982yê de bi tevahî 27 salan bêjerî ango spîkerîya radyoyê dike û sala 2000ê xatirê xwe ji me dixwaze.

Radyoya Erîvanê Beşê Kurdî ev demeke dirêj e di bin berpirsîyarîya **Keremê Seyad** û xebatên kur û keça wî **Tîtal** û **Leyla Kerem; Sîma Semend** û carcaran jî bi xebata **Cemîla Celîl** dimeşe. Heta salên 90ê jî, di radyoyê de saet û nîvekê weşan dihate kirin, lê ji ber sedemên aborî ev dem pêşî bûye saetek, niha daketiye nîv saetê. Ne bi tenê dema weşana kurdî, herwiha weşana zimanên din û zimanê ermenkî bi xwe jî kêm bûye. Di bin banê 'Radyoya Neteweyî ya Ermenistanê'de zimanê kurdî û tirkî jî di nav de, bi 12 zimanan weşan tê kirin.

***

### SBS Radio Beşê Kurdî

Di pêvajoya ku li Tirkiyeyê nîqaşên li ser weşana zimanê kurdî berdewam dikin, li Australyaya "li hêla din a dinyayê" radyoyek heye ku ev 27 sal in weşana bi zimanê kurdî dike: ***SBS Radyo.*** SBS, kurtegotina , *'Special Broadcasting Services'* e. Bi wateya kurdî *"Serwîsa Weşana Taybet."* SBS, Radyoya Dewletê ya Australyayê ye û kurdî û tirkî jî di nav de, bi 68 zimanan weşanê dike.

SBS Radyo, di sala 1975ê de dest bi weşanê dike. 'Beşê Kurdî', di sala 1985ê de, di nav beşên Radyo SBS a pirzimanî de cih digire. Radyoya ku polîtîkayeke serbixwe ya weşanê ji xwe re kiriye bingeh; hefteyê carek, di nav herikîna weşaneke dewlemend de, li ser kurdên Australyayê û kurdên li seranserî dinyayê belav bûne, bernameyên nûçe, civak-jîyan û muzîkê pêşkêş dike. Beşê Kurdî yê SBS Radyoyê ku bi weşanên muzîka kurdî û weşanên çandî hatiye kemilandin, bi gotûbêjên hunermend, nivîskar, şêwekar, rojnameger, siyasetmedar û ji her ast/pîşeyî pêşekên kurdan, hewl dide ku profîla xwe ya weşanê zindî bihêle.

**Şahînê Bekirê Sorekli,** berpirsê Beşê Kurdî yê SBS Radyoyê ye. Soreklîyê ku sala avakirina SBS Radyo/Kurdî, 'zend û bendan badaye' û dest bi kar kiriye, ji wê rojê heta niha ked dide radyoyê.

### Radyoya Kurdî ya Gurcistanê/Ronkaî FM, Tiblîs

Radyoya ***Ronkaî*** berdewamîya Radyoya Kurdî ya Tiblîsê ye. 29ê Îlona 2012ê, Radyoya Kurdî ya li Gurcistanê 35 salîya xwe temam dike. Sala 1978ê **Keremê Anqosî** hîmê Radyoya Kurdî datîne ku di bin banê dewletê de ye. Heta dema girtina radyoyê jî berpirsîyarîya wê dike. Sala 2004ê radyo tê girtin. Bêjera Radyoyê **Bella Stûrkî** dîyar dike ku Radyoya Ronkaî, dawîya sala 2007ê, bi alîkarîya **Otar Nadiryan**ê ku li Wezareta Karên Navxweyî di dereceyeke bilind de kar dikir, dest bi weşanê dike. Keremê Anqosî vê gavê 75 salî ye û serokatîya vê radyoyê dike.

### WDR Funkhaus Europa-Bernama Kurdî

7ê Sibata 2012ê, ***WDR Funkhaus Europa Bernama Kurdî*** 25 salîya xwe pîroz kir. Ev temendirêjtirîn bernameya kurdî ye li Ewropayê. Bernameya kurdî ya WDRyê, 7ê sibata 1987ê dest bi weşana xwe kir. Di destpêkê de bername hefteyê carek 15 deqeyan weşanê dikir, lê 1989ê dema weşanê hate dirêj kirin bû nîv saet; 2005ê jî dem bû saetek. Bername vê gavê ji 7 kesan pêk tê. **Kamil Basergan û Jomana Djoumma** moderatîya bernama kurdî dikin. Bernama kurdî li seranserê Nordrhein-Westfalen û Bremenê bi hêsanî tê guhdar kirin. Ji bilî muzîka kurdî, her hefte mijarên siyasî, çandî û çalakîyên heyî ji bo guhdaran têne ragihandin.

### Sveriges Radio-Zayele

***Sveriges Radio-Zayele*** radyoya fermî ya dewleta Swêdê ye. Beşê Kurdî yê Radyoya Swêdê-Zayele bêguman yek ji beşên herî serkeftî ye û asta wê ya xebatê jî pir bilind e. Amadekar û berhemhênerên Zayeleyê**, Zana Şîroyî, Lorîn Berzincî, Nasser Sina, Nazenîn Mehmûd, Nesrîn Kiliçarslan, Beşîr Kavak, Niştiman Îrandost** û **Sidar Yigit** in. Seroka bernamaya kurdî ya demê **Şîlan Diljen** e.

### Radyoya Dengê Mezopotamyayê

Li gor ragihandina radyoyê, ***Radyoya Dengê Mezopatamyayê*** bi armanca ku bibe dengê azadî, wekhevî, aştî û şaristanîya demokratik a gelên Mezopotamyayê dest bi weşanê kiriye. Radyo, 27ê gulana 2001ê, ji bo 6 saetan dest bi weşanê kiriye. Dengê Mezopotamyayê bi tevahîya zaravayên kurdî weşanê dike. Rojê çar caran bi zaravayên soranî û kurmancî dengûbehs têne pêşkêş kirin.

### VOA-Radyoya Dengê Amerîkayê

***Radyoya Dengê Amerîkayê*** sala 1942yê hate damezirandin. VOA ajanseke navneteweyî ya ragihandinê ye û girêdahîyê Hikûmeta Federal a Amerîkayê ye. Di hefteyekê de, Dengê Amerîkayê nêzîkî 1500 saetan nûçe û babetên din ji bo 125 milyon kesên li seranserî dinyayê belav dike.

Beşê Kurdî yê ***Dengê Amerîkayê***, piştî Şerê Kendavê, 25ê Nîsana 1992yê hate damezirandin. Beşê kurdî rojê sê saetan nûçe, pêzanîn û babetên din belav dike. Ji adara 2010ê ve, 21 karmend û 9 peyamnêr ji bo vî beşî kar dikin.

### Radyo Aştî

Herçî Radyo Aştî ya li Stokholmê ye, bi dirûşmeya ***'Dengê Bêlayan li Swêdê'*** hewla weşangerîya kurdî dide.

http://www.denge-mezopotamya.com

http://www.sbs.com.au/yourlanguage/kurdish

http://duhokradio.org/

http://www.kurdfm.com

http://radio.zakariamusic.com

http://www.funkhauseuropa.de/sendungen/bernama_kurdi

http://sverigesradio.se/sida/default.aspx?programid=2200

http://www.dengejiyan.com

www.voanews.com/kurdish

http://www.radioasti.org

# Naverok

GULAN 2012




Di kêşeya kurdî de stratejîya nû û
Vahap Coşkun
▶ R. 1

Hin nirxandin û pêşnîyarên ji bo destûra nû
Prof. Dr. Ahmet Özer
▶ R. 1

Rewşeke nû
Serge Halimi
▶ R. 2

JI ÇAPEMENÎYÊ
▶ R. 2

Di navbera serîtewandin û serhildanê de
Dominique Pinsolle
▶ R. 6

Li welatên dinyaya sêyem mentiqekî din
Alain Gresh
▶ R. 8

Vegera li "bihara erebî"
Gilbert Achca
▶ R. 8

Li Çînê "dewlemendên piçûk"di warê demokrasîyê de pir fikaran nakin
Jean-Louis Rocca
▶ R. 9

Ji Londonê heta Santîagoyê raperîna yên ku ji sinifên xwe daketin tebeqeyên jêrtir
Raphaël Kempf
▶ R. 10

Bîranîna xemgîn ya Mehabadê
Jan Piruz
▶ R. 12

Tirk, li Kurdistanê di herîyê de çikîyan
Alain Gresh
▶ R. 13

Dîplomasîya telefonên destan li ser rêya fethkirina xizanan e
Laurence Allard
▶ R. 14

Dema ronahîya stêrka El Cezîreyê vedimire
Yves Gonzalez-Quijano
▶ R. 16

Pekîn û Waşîngton ji bo hev bitirsînin gavên xwe yên lîstikê diavêjin
Shen Dingli
▶ R. 17

Eskerên mûçegir ên afrîkî ji bo şerên amerîkî
Alain Vicky
▶ R. 18

Birayên ku distrên
Mona Abouissa
▶ R. 20

Birayên Musliman ên misirî di davika plûralîzmê de
Alaa Al-Din Arafat
▶ R. 21

Ebdulla Peşêw û pirsa nasnameya neteweyî
Jan Dost
▶ R. 22

ÇAND Û HUNER
▶ R. 23



## Forma Abonetîyê

Nav:
Name

Navnîşan:
Address

Koda Postayê: Bajar:
Postcode City

Telefon:

E-Mail:

Abonetîya dîjîtal ya salane: 30 €

**Independent Kurdish Media Group GmbH (IKMG)**
**Carnotstr. 4 - D-10587 Berlin**

Berliner Volksbank - Hesab/Account/Konto: 2284 1230 10 - BLZ: 100 900 00
IBAN: DE78 1009 0000 2284 1230 10 - BIC/SWIFT: BEVODEBB